## HUNER



### "25ê Îlonê dê weke destpêka serxwebûnê bê pîroz kirin"

**HUNERMENDÊ** Kurd ê Bakûrî Sebahattin Yıldız ji bo referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê straneke bi şêwazeke folklorîk bi navê "Pîroz Be" amade kiriye. Yıldız dibêje "Di pêşerojê de 25 îlonê belkî bibe cejna Kurdan û di wê cejnê de jî em ê stranên şahiyan bistrên." **RÛPEL 08**

## ABORÎ



### Wan ji bo pêşketina turîzmê dixebite

**BAJARÊ** Wanê wek paytexta herêma Serhedê tê zanîn. Bi gol û hewayê xwe yê hênik gelekî bala geştiyaran dikişîne. Bi taybetî jî di van salên dawîn de gelek geştiyarên Îran û Rojhilatî berê xwe didin Wanê. Li Wanê him dikevin behrê û him jî danûstandinan dikin. **RÛPEL 09**

## KIRMANCKÎ



### Kurdê Kirmancî (Zazayî) zî destek danê referandumî

Derheqê Referandumê Xoserîya Kurdîstanî de yew beyanatê paştgirî zî hetê rêxistinêka kurdanê zazayan ra ame dayene. Beyanato ke hetê îdareyê komela Ziwan-Komî ra erşawîya rojnameyê ma wina yo: Referandumê xwuserîye hetê huqûqê mîyanneteweyî ra zî heqêko meşrû yo. Ganî her kes hem qerarê referandumî rê hem zî netîceyê ey rê hurmetkar bo. **RÛPEL 10**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ
Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 34
16-23 ÎLON 2017
www.basnews.com






BERÎYA REFERANDÛMA SERXWEBÛNÊ: R2

# PARLAMENTOYA KURDISTANÊ VEDIBE

**> MIJARA YEKEM; REFERANDÛMA SERXWEBÛNÊ YE**

Parlementoya Herêma Kurdistanê ku ev du sal e girtî bû, beriya encamdana referandûma serxwebûna Kurdistanê vedibe. Hat ragihandin ku di kombûna yekem a parlamentoyê de yasaya referandûma serxwebûna Kurdistanê ku dê 25ê Îlonê pêk were, dê were pesendkirin û herwiha bersiva parlementoya Îraqê jî dê were dayîn.

**> QEYRANA SIYASÎ YA LI KURDISTANÊ ÇARESER DIBE**

Vebûna Parlamentoya Kurdistanê beriya referandûma serxwebûnê, xwedî girîngiyeke mezin e ku bi vî awayî di qada navdewletî de yekrêziya hêzên Kurdî nîşan bide. Parlamentoya Kurdistanê ji 111 kursiyan pêk tê û eger Goran û Komel beşdar nebin jî parlamento wê bi 80 parlementeran kom bibe. Qeyrana siyasî ya li Kurdistanê jî ber bi çareserbûnê ve diçe.

Behmen Ghobadi:

## Referandûm ne meseleya Barzanî, meseleya hemû Kurdan e

Derhênerê Kurd Behmen Ghobadî ku bi fîlmên xwe yên li ser sînoran tê nasîn, heftiya derbasbûyî li Stenbolê bû. Em bi Ghobadî re li ser referandûma serxwebûna Kurdistanê û têgeha 'sînoran' axivîn. Ghobadî piştgiriya xwe ji bo referandûmê ragihand û her wiha diyar kir ku projeyên wî hene li ser serxwebûna Kurdistanê. Ghobadî li ser referanduma serxwebûna Kurdistanê dibêje: "Ev ne meseleya Barzanî, meseleya hemû Kurdan e û herwiha radigihîne ku divê em ewilî mala xwe ava bikin û şer û niqaşan di mala xwe de bikin."



R14



**EKREM ÖNEN** >02

Referandûm: Medya û Hefteya Yekîtîya Netewî



**HOŞENG OSÊ** >03


PKK ji ber çi şer dike?



**FIRAT CEWERÎ** >08

Te dît bê çi hat serê min Firat!

NACÎ KUTLAY: R03



## Kurd, wê nişan bidin ka çawa xwe birêve dibin

Siyasetmedar û nivîskar Naci Kutlay di derbarê referanduma serxwebûna Herêma Kurdistanê de ji Heftenameya Basê re axivî. Kutlay, diyar dike ku wê Kurd li gel DYA, Rusya û mîletên cîhanê têkiliyên dîplomatîk pêk bînin û pêwendiyên xwe xurttir bikin û herwiha dibêje; "Wê bi referandûmê derkeve holê ku Kurd çawa dikarin xwe birêve bibin."

KONFERANS R04





## Heftenameya Basê referandûmê dixe rojeva Enqereyê!

Kurd ji bo xeyala xwe ya sedsalî di 25ê Îlonê de diçin ser sindoqan. Di vê çarçoveyê de Dezgeha Medyayî ya Basê ku bi Kurdî û Tirkî weşana xwe dike li Enqereyê bi naveroka "Referandûma Serxwebûna Herêma Kurdistanê û Dahatûya Têkiliyên Tirkiye - Herêma Kurdistanê" konferansekê lidar dixe. Ji Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê wê gelek, nivîskar, siyasetmedar, rojnameger û aktîvîst beşdar bibin.

ROJEV R05



## Dibistan vebûn lê 400 hezar xwendekar li kar in!

Li Tirkiyeyê 17 milyon xwendekar ji bo serdema nû ya xwendinê di 18ê Îlonê de dest bi dibistanê dikin. Lê piraniya wan Kurd, 400 hezar karkerên cotkariyê wê piştî berhemdanê biçin dibistanê. Seroka Şaxa Eğitim-Senê ya Edeneyê Seçil Sönmez re li ser xebatkarên cotkar ên zarok û rewşa wan ji Heftenameya Basê re axivî.



**EKREM ÖNEN**

## Referandûm: Medya û Hefteya Yekîtîya Netewî


Ji bo referandûmê hefteyek maye, ev hefte, hefteya herî girîng dîrokî ye. Ev hefte dikare bibe sebeb ku rêjeya erê di referandûmê de gelek bilind an nizim bibe. Ev temamî dimîne li ser xebat û startejiya komîsyona rêveberiya referandûmê û medyaya Kurdî. Diyar e dijmin û xêrnexwazên Kurdan wê gelek girîngiyê bidin vî hefteyî û dibe ku ji Kurdan re suprîzên gelek ecêb amade kiribin, divê Kurd xwe amade bikin, bi teybetî komîteya medyayê ya rêveberiya referandûmê. Komîteya medyayê ya komîsyona referandûmê divê ew jî bi metodên propaganda û kontrpropaganda suprîzan ji dijmin û xêrnexwazên Kurdan re amade bike. Ji bo vêya ilmekî pir mezin nabê. Ji bo Kurdan tişta herî girîng ew e ku Kurd ji bo referandûmê mobilîze bibin. Ji bo vêya çend tiştên asasî hene divê bên kirin: 1- Wê gelek baş be ku Komîteya medyayê ya komîsyona referandûmê bikaribe bi medya Kurdî re li hev bike û vê heftiya dawî ya beriya referandûmê kampanyayekê di bin navê ''Hefteya yekîtîya netewî" saz bikin. Ev kampanya li ser 3 xalan bê meşandin 1- hemû medyaya Kurdî biryarê bigire ku nûçe û bernameyên behsa nakokiyên nav mala Kurd dike bê qedexe kirin, berê Kurdan ji pirsên nav mala Kurd biguherîne pirsgirêkên derve, ji ber medya Kurdî çiqaas behsa nakokiyên nav mala Kurd bike ewqas Kurdan perçe dike û ji hev dûr dixe. Bernameyên medya bila bi granî li ser du xalên dawî be. 2- Zilm û êşa dewletên dagirker ku di vî 100 salên dawî de anîye serê miletê Kurd di bernameyên xwe de eşkere bikin. Wek mînak ji Serhildana Bitlîsê, Şêx Mehmûd, Şêx Ehmed, Şêx Ebdûlselam, Şêx Seîd, Qoçgirî, Gelîyê Zîlan, Ararat, Dêrsim, Mahabad, Melle Mistefa Barzanî, Enfal, Helepçe û gelekên din. Ev wê bi Kurdan bide famkirin ev zilm û êşa ku di vê sedsala dawî de hatiye serê milletê Kurd ji ber bê dewletiyê bûye, her wiha wê kîn û nefreta milletê Kurd li hember dijmin xurt bike. 3- Şer û Qehremaniya Pêşmerge di bernameyên xwe de bidin rêdan. Dervî vê haziriya kontrpropagandayê li hember propaganda ku dijmin wê di vê hefteya dawî de bike bikin. Bi ya min ev tişt tev pir rehet dikare bibe. Medya Kurdî divê bikaribe di karekî wiha ji bo Kurdan dîrokî ye li hev bike û hefteyekî xwe ji bo referandûme mobilîze bike. Medya Kurdî divê li mînakên cihanê binêre, çawa dema ji bo welatekî pirsên netewî dikeve rojevê tev bi yek dengî helwesteke millî netewî digirin. Divê medya Kurdî jî bikaribe niha bi karekî wiha rabe, Kîjan dezgeha Medya îroj helwesteke wiha bigire û bang li medyayên din bike ku bi hevre vî karî bikin ew dezgeh we di çavê milletê Kurd de gelek mezin be. Ez nizanim komîsyona rêvebiriya referandûmê çiqas haziriya tiştekî wiha kirîye? Lê hêvîdar im wê xwe ji karekî wiha re amade kiribin. Ji ber ku ev karekî gelek girîng e û qedera milletê Kurd pê ve girêdayî ye. Ev tiştên li jor hate behs kirin heger Kurd bikin wê rêjeya erê di referandûmê de bilind bibe û nebe dikare kêmtir bibe. Ev heftiya dawî ya beriya referandûmê wê bibe heftiya şerê man û nemanê di navbera tevgera rizgariya netewî ya Kurdistanê û dijminê milletê Kurd di warê Medyayê de. Medyaya Kurdî divê bi kêmahî di vê heftiya dawî de helwesteke millî netewî bide rêdan, hemû nakokiyên xwe bidin alî û li dora derbaskirina referandûmê bi rêjeyeke erê bilind derbas bikin bicivin û milletê Kurd mobilîzeyî refrandûmê bikin. Nuha wext gelek teng bûye. Xwezî nuha komîteya medyayê ya komîsyona referandûmê çend pisporê şerê psîkolojîk di warê medya de li medya Kurdî civandibana ku bi propagandayeke rêkûpêk milletê Kurd mobilîzeyî referandûmê bikirana û bi kontrpropagandayê propaganda xêrnexwazên Kurdan pûç bikirana. Lê ev nebe jî tişta li jor hat behs kirin bibe ew jî dikare rêjeya erê di referandûmê de gelek bilind bike. Pir eşkere ye seroktiya herêma Kurdistanê, raya giştî ya Kurdî, tevgera siyasî ya Kurdî her wiha cemawerê Kurd gelek gazin ji medya Kurdî kir û nuha jî dike. Bes medyaya Kurdî hêja ye di vê heftiya dawî de suprîzeke erênî ji tevan re çêke, ew tiştên li jor hatin behs kirin pêk bînin di xetek millî, netewî kevin ku bibin cihê bawerîyê ji milletê Kurd re. An na mesafeya navbera Medya Kurdî û milletê Kurdan wê gelek mezintir bibe û ku rêjeya erê di referandûmê de ne wek Kurd dixwazin derkeve Kurd wê beriya herkesî medyaya Kurdî gunehbaran bike û millet rast difikire. Ji ber serkeftina şerekî li ser axê ne bi medyayeke serkeftî be ew serkeftin wê ne kamil be. Ez pir vekirî dikarim bêjim heger medyaya Kurdî bi hev re helwesteke netewî negire wê bibe yek ji sebeba asasî ku rêjeya erê di referandûmê de ne wek Kurd dixwazin derkeve. Ji ber wê medyaya Kurdî di vê heftiya dawî de bi îmtihaneke dîrokî re beramberî hev dibe. Ya wê helwesteke netewî bigirin û bibin Medyayeke (parçeyek) ji milletê Kurd an wê bibin medyaya bi Kurdîaxif. Nuha top li seha wan e û divê ew qerara xwe bidin di vê dema dîrokî ya ji bo milletê Kurd girîng e.

Bi xemgîniyeke mezin me bihîst ku dayîka nivîskarê rojnameya me Ekrem Önen Edlê Önen çûye ser dilovaniya xwe. Em wekî Heftenameya Basê ji malbata Edlê Önen û hezdarên rehmetiyê re sersaxiyê dixwazin.



Beriya referandûma serxwebûnê:

# Parlamentoya Kurdistanê Vedibe




■ **MURAT ÖZDEMİR**

Li Herêma Kurdistanê bi nêzîkbûna roja pêkanîna referandûma serxwebûnê ku biryar e 25ê Îlonê pêk were, geşedanên girîng û dîrokî rû didin. Parlamentoya Herêma Kurdistanê ku ji Tebaxa 2015an û vir ve girtî bû, piştî ku biryara pêkanîna referandûma serxwebûnê hat girtin, ev heyameke dirêj e di rojeva Kurdistanê de bû ku vebe û di vê çarçoveyê de hevdîtinên di navbera aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê de yên ji bo çalakkirina parlementoyê jî zêde bûbûn. Herî dawî biryar hat girtin ku 15ê Îlonê di saet 19.00an de parlamento vebe û rûniştina xwe ya yekem pêk bîne. Di vê proseyê de jibilî Goran û Komelê ku wan jî hê biryara xwe nedane wê roja 15ê Îlonê helwestên xwe zelal bikin, hemû aliyên siyasî li ser vê biryarê yekdeng in.

**Qeyrana siyasî ji nav diçe**

Di van heyamên dawîn de ku bangeşeya referandûmê dewam dike, dengvedana referandûma serxwebûnê li herêm û cîhanê zêde bûye û dîplomasiyeke xurt dimeşe, civînên di navbera Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), Yekitiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK), Tevgera Goran û Komel û aliyên siyasî yên din ên li Kurdistanê de zêde bûn. Beriya wê PDK û YNK li ser çalakkirina parlamentoyê li hev kirin, lêbelê ji bo ku konsensuseke siyasî hebe û beriya referandûma dîrokî yekrêziyek bikeve nav mala Kurd, bi Goran û Komelê re hevdîtin pêk anîn ku ew jî beşdarî parlamentoyê û proseya referandûmê bibin. Di encama van civînan de herî dawîn biryar li ser wê hat dayîn ku 15ê Îlonê saet 19.00an de parlemento piştî du salan kombûna xwe ya yekem pêk bîne. Tevgera Goran û Komel jî ku her tim vekirina parlementoyê ji bo encamdana referandûmê weke mercekê didîtin, helwesta xwe hê jî zelal nekiribûn û biryar bû ku beriya vebûna parlementoyê ew jî helwesta xwe eşkere bikin ka wê di vê qonaxa girîng û dîrokî de cih bigirin an na.

**Beriya referandûmê vebûna parlementoyê girîng e**

Vebûna Parlamentoya Kurdistanê beriya referandûma serxwebûnê, xwedî girîngiyeke mezin e ku bi vî awayî di qada navdewletî de yekrêziya hêzên Kurdî nîşan bide û herwiha wê yasaya referandûmê jî were pesendkirin. Parlamentoya Kurdistanê ji 111 kursiyan pêk tê û eger Goran û Komel beşdar nebin jî parlamento wê bi 80 parlementeran kom bibe. Di rûniştina yekem de, jibilî pesendkirina yasaya referandûmê, wê bersiva parlementoya Îraqê ya li ser redkirina referandûmê jî were dayîn.

**"Pesendkirina yasaya referandûmê wê karê yekem be"**

Şêwirmendê Serokatiya Parlementoya Kurdistanê Lewend Celal Agha li ser vebûna parlementoya Kurdistanê û rewşa dawîn ji Herftenameya Basê re axivî. Şêwirmendê Serokatiya Parlementoya Kurdistanê radigihand ku di rewşa heyî de tu hêzan dijayetiya xwe li dijî aktîfkirina parlamentoyê nîşan nedane û wiha pê de çû: "Biryar bû ku 14ê Îlonê kom bibe, lê bo rojekê hat paşxistin. Çalakbûna parlamentoyê bi rijdbûna hemû hêzan pêk tê. Hemû hêz li gel encamdana referandûmê ne. Di kombûna yekem ya parlamentoyê de mijara yekem wê derbaskirina yasaya referandûmê be û yasaya referandûmê dê were pesendkirin." Celal dibêje, 111 parlementer hene. Eger Goran û Komel beşdar nebin jî 80 parlementer wê kom bibin û axaftina xwe wiha didomîne: "Ev cara yekem nîne ku serokê parlamentoyê amade nebûye. Cîgirê serokê parlamentoyê dikare cih bigire. Ew tecrûbeya me heye ku em yekî din hilbijêrin û ew serokatiya parlamentoyê bike. Beriya niha zêdetirî 15 caran serok bo parlamentoyê hatine hilbijartin. Hilbijartina serokê parlamentoyê karekî yasa yî ye."

**"PDK û Serok Barzanî bêyî merc daxwaza vekirina parlamentoyê kirin"**

Celal di dirêjiya axatina xwe de li ser helwestên Goran û Komelê dibêje: "Referandûm proseyeke netewî û niştimanî ye. Rewşa me ne wek ya Scotland an ya Katalonyayê ye. Rewşa me rewşeke taybet e. Ev referandûm bo me du caran sê caran girîngtir e. Eger Komel û Goran jî beşdarî vê proseya niştimanî bibin, helbet wê rewş bihêztir be. Ew li gel me bin ev gelek baş e, lê eger nebin jî ev nayê wê wateyê ku ev prose naçe serî. Lê beşdarbûna wan wê destê me xurttir bike di qada navdewletî de jî. Ji bo piştevaniya derve em çiqas yekrêz bin ewqas baş e. Niha Partiya Demokrat a Kurdistanê û Serok Barzanî bêyî merc beşdarî civînan dibin û daxwaza çalakkirina parlementoyê dikin. Hemû hincetên Goran û Komelê ji nav hatin birin. Serok Barzanî û PDKê hemû şertên wan qebûlkirin ku parlemento vebe û rewşa siyasî ya Kurdistanê yekrêziyekê ava bike û herwiha bi wî awayî jî vê proseya niştimanî birêve bibin. Niha PDK û YNKê li hev kirine û li benda Komel û Goranê ne. Divê ev herdu hêz xwe ji vê proseya niştimanî nedin paş."

**"Biryarên Îraqê li Kurdistanê bicih nabin û pûç in"**

Lewend Celal dibêje, beriya niha bersiva biryara parlementoya Îraqê hatibû dayîn ku biryara referandûmê red kiribû û herwiha got jibilî pesendkirina yasaya referandûmê, wê di kombûna parlamentoyê ya pêşiyê de bersiva parlamentoya Îraqê jî bê dayîn. Celal radigihîne ku biryara li ser ji karxistina Necmedîn Kerîm ji parêzgariya Kerkûkê jî deryasayî ye û axaftina xwe wiha didomîne, "Biryarên Îraqê li Îraqê bicih nabin ku li Herêma Kurdistanê bicih bibin. Em niha serbixwe ne. Em ne girêdayî biryarên Îraqê ne û biryarên Îraqê karîgeriyê li ser Kurdistanê nakin. Biryara li ser Necmedîn kerîm jî deryasayî ye. Ji ber ku ne Îraqê, Encûmena parêzgeha Kerkûkê Necmettîn Kerîm hilbijartiye û Encûmen di van mijaran de xwedî gotin e. Ji ber wê yekê ev biryar him derveyî yasayan e û him jî siyasî ye. Herêma Kurdistanê ne pabendî van yasayan e û bicih nake."

**"Bexda dixwaze siyaseta mezhebî li ser hemû pêkhateyan ferz bike"**

Çavdêrê siyasî Bextiyar Talebanî jî ku siyaseta herêmê ji nêz ve dişopîne, li ser biryara parlamentoya Îraqê ya redkirina referandûma serxweûbê ya Herêma Kurdistanê û biryara dûrxistina Necmedîn Kerîm ji parêzgariya Kerkûkê û herwiha geşedanên dawîn ji Heftenameya Basê re axivî. Talebanî dibêje desthilata Bexdayê ku mezhebî tevdigere niha dest daniye ser hemû dam û dezgehên hikûmetê û dewleta Îraqê û bi vî awayî biryarên ku dixwastin derbas dikin. Bi vê zorîneya siyasî dixwazin mafên Kurdan û pêkhateyên din serkût bikin. Telebanî wiha pê de diçe: "Çawa ku Sunne ji qada siyasî jê birin, xwastin ku Kurdan jî bînin wê rewşê û Kurdan di qada siyasî de tune bikin. Desthilata niha ya Bexdayê dixwaze siyaseta xwe ya mezhebî li ser hemû pêkhateyan ferz bike."

**"Bi sedsalen e hişmendiya desthilatên Îraqê naguhere"**

Çavdêrê siyasî Talebanî li ser biryara hikûmeta Îraqê ya di derbarê parêzgarê Kerkûkê Necmedîn Kerîm de jî diyar dike ku desthilata Îraqê heman siyaseta xwe ya qirêj di vê mijarê de jî nîşan da û wiha dewam dike: "Mixabin di wê biryarê de hin parlamenterên Sunne, Tirkmen û yên Kurd ên kirêgirtiyên Şîe ku li gor siyaseta Şîageriyê tevdigerin û li hember maf û daxwazên gelê xwe sekinîn. Parlamentoya Îraqê daxwaz ji hikûmetê kiriye ku bi her rê rêbazan rê li referandûmê bigire. Ev jî tê maneya çekan û ev jî wê nîşan dide ku heta niha jî bi sedsalan e hişmendiya desthilata Îraqê Sunne bin an Şîe bin neguheriye. Ew biryara li ser Necmedîn Kerîm hatiye dayîn, pûç e. Ji ber ku di rewşên ku kesek piştgiriyê bide terorê ew biryar tê derxistin, lê niha Necmedîn Kerîm bi xwe di şerê li dijî terorê de ye û bi hemû hêz û hebûna xwe şerê terorê dike."

**"Hemû dam û dezgeh di destê Şieyan de ne"**

Bextiyar Talebanî di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, Kurd nikarin li Îraqê bi rêyên yasayî mafên xwe biparêzin û wiha pê de diçe: "Ji ber ku hemû dezgeh di destên Şîeyan de ne. Bi yasayan nabe. Wan dest daniye ser hemû wezaret û saziyan. Lê em pê kêfxweş in ku hemû hêzên Kurd ên li Kerkûkê gotin ku Necmedîn Kerîm di cihê xwe de dimîne. Kerîm ji aliyê Encûmena Kerkûkê ve hatiye hilbijartin û tenê ew dikarin ji peywîrê bixin. Tenê cudahiyek heye di navbera desthilata niha ya Îraqê û yên berê de. Hikûmetên beriya niha Sedam jî di nav de şerekî desthilatê bû, ne şerekî netewî bû. Lê hikûmeta niha hewlên şerekî mezhebî û etnîkî dide di navbera Kurd û Ereb û pêkhateyên din de." Talebanî li ser daxuyaniya wezîrên derve yên komkara erebî ku li dijî referandûma serxwebûnê helwest nîşan dan jî radigihîne ku ev biryar ne xwedî bandorekê ye û gotinên xwe wiha bi dawî kirin: "Ev biryar nîşana dijayetiya Kurdan e. Tirsa wan ew e ku eger Kurd cuda bikin, ew pêkhateyên din ên di nav wan de jî mîna Kiptiyan, Amazêxan daxwaza mafên xwe bikin û ji bin hikûmraniya wan derkevin."

## Piştî raperînê Parlamentoya Kurdistanê ava bû

Li Herêma Kurdistanê piştî raperîna bihara 1991an bereya Kurdistanê ku hemû hêzên siyasî cihê xwe tê de digirt, biryar dan ku hilbijartinan pêk bînin û parlamentoya xwe ava bikin. Ev jî piştî wê yekê hat ku rejîma Baas 26ê Cotmeha 1991an neçar ma ku ji hemû sazî û dezgehên Kurdistanê vekişe û ji aliyê xelkê Kurdistanê ve were derxistin.

Piştî wê yekê ji bo avakirina sîstemekê û parlamentoyekê pêngav hatin avêtin. Di vê çarçoveyê de bereya Kurdistanî biryar dan ku lijneyeke ji 15 kesên pispor û şareza pêk tê ava bikin û bi vî awayî lijneyek hat avakirin ji nav wan bereyên Kurdistanî.

Ew lijneya pispor, ji 23ê Berfanbara 1991an heta 28ê Çîleya 1991an xebatên xwe berdewam kirin û proje yasayek amade kirin. 28ê Nîsana 1992an bereya Kurdistanî ev proje pesend kir û yasayeke bi nav û hejmara; Hilbijartinên Kurdistana Îraqê bi hejmara 1 derxist.

Di 19ê Gulana 1992an yekem hilbijartin ji bo parlamentoya Kurdistanê pêk hatin ku tevahiya hêz û aliyên Kurdistanê û pêkhateyên olî û netewî beşdarî tê de kirin. Nêzî milyonek kes xwedî mafê dengdayînê bû. Li gor yasaya hilbijartinê, ji bo ew aliyên beşdarî hilbijartinê dibin bikaribin nûnerên xwe bişînin parlementoya Kurdistanê diviyabû ji sedî 7ê dengan bidest bixin.





Parlementoya Herêma Kurdistanê ku ev du sal e girtî bû, beriya encamdana referandûma serxwebûna Kurdistanê vedibe. Hat ragihandin ku di kombûna yekem a parlamentoyê de yasaya referandûma serxwebûna Kurdistanê ku dê 25ê Îlonê pêk were, dê were pesendkirin û herwiha bersiva parlementoya Îraqê jî dê were dayîn.

## Heta niha çar hilbijartin pêk hatine ji bo parlamentoyê


Ji roja damezirandina xwe heta 2017an 4 hilbijartin ji bo parlamentoyê pêk hatine. Hilbijartina yekem di 19 Gulana 1992an de pêk hat. Xula duyem 30ê Çileya 2005an hat encamdan ku ji bo diyarkirina encûmena parêzgehan jî dengdan pêk hat. Xula sêyem 25ê Tîrmeha 2009an pêk hat ku di vê hilbijartinê de xelkê li ser postê Serokatiya Herêma Kurdistanê jî deng da. Xula çarem jî 21 Îlona 2013an pêk hat ku 31 layenên siyasî beşdarî tê de kirin û ji wan 17 lîsteyan karîn nûnerên xwe bigihînin parlamentoyê.

## Naci Kutlay:

# Kurd, wê nîşan bidin ka çawa xwe birêve dibin

**CESIM ÎLHAN**

Di derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de em bi nivîskar û Siyasetmedar Naci Kutlay re axivîn. Naci Kutlay dibêje ku dê bi referandûmê derkeve holê ku Kurd çawa dikarin xwe bi rê ve bibin. Êdî cîhan jî dê Kurdan qebûl bike. Kutlay, destnîşan dike ku wê Kurd li gel DYA, Rusya û mîletên cîhanê têkiliyên dîplomatîk deynin û pêwendiyên xwe xurttir bikin.



“Referandûm betal bibe dê çi bibe? Jixwe di dilê her Kurdî de referandûma serxwebûnê heye.”

**Weke hûn jî dizanin di 25ê Îlonê de li Herêma Kurdistanê wê referandûma serxwebûnê pêk were. Ev referandûm ji bo Kurdan dê çi bîne?**

Di dîroka Kurdan de cara yekem e referandûm pêk tê. Cara yekem e di dîrokê de ji Kurdan tê pirsîn bê ‘Gelo tu çi difikirî’. Ev yek bi serê xwe jî biryareke dîrokî ye. Divê herkes rêzê li ber vê biryarê nîşan bide. Kurd ne neteweperest û dîndarên tundrew in. Divê li Rojhilata Navîn pergala Kurdan jî hebe. Dema wisa bibe wê Kurd bibin xwedî qîmet. Zilm û zordarî bi referandûm û avakirina pergaleke nû wê li Kurdistanê nebe hikûmran. Wê Kurd bi pergalên xwe yên rêvebirinê ji nû ve derkevin qada jiyanê.

**Piştî referandûmê dahatûyeke çawa li pêşber Kurdan e?**

Ji ber ku referandûm gaveke dahatû ye him wê miletên din Kurdan fêm bikin, him jî Kurd wê hev baştir fêm bikin. Dê Kurd kêmasiyên xwe sererast bikin. Ev referandûm tesîrê ne tenê Kurdên Herêma Kurdistanê lê wê hemû Kurdan bike. Piştî 25ê Îlonê derbas bû divê “Kurd pirsa gelo em ê çawa bi Ereban, Tirkan û Farisan re bijîn ji xwe bipirsin?” Di serî de DYA û Rusya, em ê ligel welatên din têkiliyên çawa deynin? Dê Kurd van tiştan ji nû ve bifikirin û binivîsin. Piştî referandûmê li Herêma Kurdistanê beriya aborî dê rûdanên çandî derkevin pêş.

**Encama referandûmê erênî be dê li raya navnetewî biryareke çawa derxîne holê li gorî we?**

Eger di referandûmê de encam erênî be wê li hemû cîhanê bê gotin ku êdî Kurd jî dikarin xwe bi xwe bi rê ve bibin. Êdî nenasîn, bêdengî û kêmdîtin çê nabe li hemberî Kurdan. Kurd, bi cîranên xwe re di hemahengiyeke xurt de, xwedî civakeke bi îtîbar dê mafê birêvebirina xwe bidest bixin. Li Lozan û Sewrê digot gelo bê ka ‘Kurd çiqasî dikarin xwe bi rê ve bibin?’ Wê demê ev maf nehat dayîn. Bi vê referandûmê jî dê Kurd îspat bikin ku xwe çawa birêve dibin. Hêzên navnetewî jî dê vê yekê bibînin. Dê bibînin ku Kurd li hember dîrokê xwedî maf in û ew ê jî vê daxwazê pesend bikin.

**Hin aliyên ku referandûmê weke sedema şer dibînin jî hene...**

Li Rojhilata Navîn ku wê Kurd bi wan re bibin cîran, hemû jî di vê rewşê de derbas bûn. Piştî Osmaniyan Komara Tirkiyeyê hat ava kirin. Piştî Persan Îran hat damezirandin. Dema mafê Kurdan li holê bû, Tirkiye, Îran, Iraq û Suriye yekdeng dibûn û mafên Kurdan asteng dikirin. Di Pakta Sadabatê de jî ev yek wisa bû. Lê cihan êdî ne ew cihana wê demê ye. Ji ber vê jî ez wê fikrê rasteqîn nabînim. Tenê dixwazin Kurdan bitirsînin. Bi salan e Kurd wiha îdare kirin. Kurd wiha asîmîle kirin. Bi taybetî jî gotinên hin aliyên Tirkiyeyê di derheqê şer de ji min re qet rasteqîn nayên. Ji ber ku ew ne dengê civaka Tirk e.

**Referandûm dê çi tesîrê li Kurdên derveyî Herêma Kurdistanê bike? Ew jî dê daxwaza statûyê bikin gelo?**

Ev referandûm gaveke girîng e. Bi vê referandûmê dê herkes biguhere. Kurdên Îranê, Kurdên Suriyeyê û yên Tirkiyeyê jî dê biguherin. Bi siyasetê wê sazî jî biguherin. Her wiha bi vê referandûmê wê çepgirên Tirkiyeyê biguherin. Misilmanên Tirkiyeyê dê biguherin. Heta referandûm wê Elewiyan jî biguherîne. Ev referandûm wê nîşanî Kurdên li welatên din bide ku gelo divê çi û çawa bixwazin.

**Em dikarin bibêjin ku referandûm têra xwe hat vegotin?**

Di proseya referandûmê de Kurdan xebatên baş kirin û bi şêweyeke demokratîk tevgeriyan. Dîplomasiya navnetewî jî baş birêve birin. Mafê jinan jî piştguh nekirin. Di xebatên xwe de mafên jinan jî dan berçavan. Misilmaniya tundrewî dernexistin pêş çavan. Bi cîranên xwe yên Tirk, Ereb û Farisan re jî hirmetkar û rêzdar bûn û ev prose baş derbas kirin.

**Li Herêma Kurdistanê di avakirina nû de divê rola jinê çawa be?**

Bi vê guherînê dema Kurdan xwe îspat kir wê jin jî bibe xwedî nêrîneke nû, pergaleke nû û fikriyateke nû. Cihan li jinên Kurd dinêre. Ew ê zaftir azad jî bibin. Jina Kurd dê bibe mînaka azadî û jiyana hevpar.

**Li Tirkiyeyê hin aliyên ku dibêjin “Birayên Kurd” referandûmê weke lîstika hêzên emperyalist dibînin...**

Nod sal e bi awayekî asîmîlasyoner, otoriter û zihniyeta Ittihat Terakki Tirkiye birêve bir. Tirk bi xwe jî ji vê yekê ne razî ne. Ew ê jî bibînin ku Kurd dibêjin ‘Erê’. Wê rûnin û ji neçarî bifikirin û fikra xwe biguherînin. Çawa daxwaza Lûksembourga ku hejmara şêniyên wê 500 hezar e tê fêm kirin û qebûl kirin, çawa daxwaza birêvebirina 40–50 milyon Kurdî ji aliyê Kurdan ve neyê qebûl kirin û fêm kirin? Tirk jî pirsyara xwe dikin. Di hin pirtûkên xwe de dibêjin “Kurd jinbavê Misilmanan e.” Kesê vê dibêjin jî misilman in. Çima miameleya kurê jinbavê li Kurdan tê kirin? Referandûm dê dawiya van xeletiyan bîne û Tirk dê rûnin û bifikirin di encamê de jî wê biryara Kurdan qebûl bikin.

**Baş e, li gor we rewşenbîrên Kurd di derbarê referandûmê de berpirsyariya xwe bicih anîn?**

Nexêr, nekirin. Ji ber ku tu tundrewiya li Tirkiyeyê dibînî. Rûdanên li Tirkiyeyê li holê ne. Ji ber vê rewşê jî rewşenbîrên Kurd ne di asta daxwazê de xebitîn. Dewletê izna vê yekê neda. Bifikirin ku serokê partiyekê di zindanê de ye. Ne diyar e wê kengî derkeve mehkemeyê. Herkesekî ku li Tirkiyeyê dijî jî dizane ku di dilê Kurdan de xwerêvebirina ji aliyê Kurdan heye. Min bi xwe jî dît, rewşenbîrên bi salan e li sirgûniyê ne ji ber tirsa dewletê li hember referandûmê ne. Halbûkî di dilê wan de xwerêvebirina Kurdan ji aliyê Kurdan heye di dilê wan de.

**Li gor we DYA û zilhêzên cîhanî referandûma serxwebûna Kurdistanê pesend kirine?**

DYA li Rojhilata Navîn dewleta herî mesûl e. Ew li gor xwe dema herî baş dizane. Hûn li hember gotina wan bertekeke rasteqîn nabînin. Li bendê disekine û daxwaza xwe bicih tîne. Li gor min DYA dibêje “Mafê Kurdan heye bibin xwedî dewlet.” Lê li benda dema herî misaît e.

**Daxûyaniyên ji aliyê PKKê ve tên dayîn pir cuda ne, ev daxûyanî têgihiştineke stratejîk e an daneyên taktîkî ne?**

Em elimîne sedeman kategorîze bikin. Cudahî di navbera fikra PDK û PKKê de bêguman heye. Lê yek dernakeve hemberî yê din. Qey divê ji serê sibê heta êvarê ji hev re li çepikan bixin? Divê hin daxûyanî neyên kategorîze kirin. Daxûyaniyên PKKê stratejîk jî dibin, taktîk jî. Lê divê neyê gotin ku “PKK li hember Kurdistana serbixwe ye” divê mirov rewşan baş binirxîne.

**Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) bi awayekî vekirî li hember referandûmê derket lê HDP piştgiriya referandûmê dike. Ev cudahî ji ber çi ye li gor we?**

Ev ne girîng in. Divê tu li daxwaza miletê Kurd binêrî. Divê ev daxûyanî nebin mijar jî. Ji xwe çend roj man ji referandûmê re, divê tu li encamê binêrî. Di nav Kurdan de çiqas alî hebin jî tev ji hev fêm dikin. Di navbera daxûyaniya HDP û DBPê de pir cudahî nîne. Baweriya me ew e ku wê Kurd referandûmê bi xweşî derbas bikin. Wê ji hev baş fêm bikin. Kurd wê li Rojhilata Navîn werin cihekî baş. Ev tişt ne zaf girîng in. Hewceyî mezinkirinê nake.

**Nêrîna “Divê referandûm paş ve bê xistin” heye, li gor we divê Kurd dev ji referandûmê berdin?**

Nexêr! Em bifikirin ku Kurdan dev ji referandûmê berdan, divê vê yekê jî baştirîn bi awayî bikarbînin. Ev tev jî girêdayî rewşê ne. Dev jê berdin dê çi bibe? Jixwe di dilê her Kurdî de referandûma serxwebûna Kurdistanê heye.

Dê Katalon jî di 1ê Cotmehê de ji bo ji Îspanyayê veqetin referandûma serxwebûnê pêk bînin, ev daxwaza wan rastî bertekên tund nehat, lê belê daxwaza Kurdan rastî bertekên tund hat...

Katalan tenê bi dewletekê re mijûl dibin. Lê Kurd bi çar dewletan re doz dikin. Li aliyekî Tirkiye, aliyekî Îran, aliyekî Iraq û li aliyê din Suriye heye. Katalan cuda tevdigerin, Kurd cuda tevdigerin. Erdnîgariya wan bi xwe jî cuda ye.

**Piştî referandûmê wê mijara sînoran bikeve rojevê?**

Mijara sînoran, mijara herî girîng a gelan e. Piştî referandûmê wê sînor jî bên axiftin. Lê divê pêşî Kurd mijara sînoran di navbera xwe de nîqaş bikin. Biryara xwe bidin.

**Bi rêya referandûmê hûn dixwazin ji Kurdan re çi bibêjin?**

Jiyan weke avê ye, di cihê xwe de nasekine. Tim û dayîm ber bi pêş ve dimeşe. Di hundirê xwe de tiştên nû dihewîne. Ji milet û mirovên nû re singa xwe vedike. Hin mirov dê werin û van zanyariyan têr nebînin, wê zanyariyên nû bên afirandin. Pisborên nû dê bigihêjînin. Di cîhanê de mamosteyê herî mezin jîn e, jiyan e. Dersa ku jiyan dide herkesî diguherîne. Kurdên ku di pergala vê jiyanê de dijîn, her çiqas xwedî hêz û qewet nebin jî û dereng jî mabin dê bi vê referandûmê rojên xweştir bibînin. Ez ji vê yekê êmîn im.


“Di proseya referandûmê de Kurdan xebatên baş kirin û bi şêweyeke demokratîk tevgeriyan. Dîplomasiya navnetewî jî baş bi rê ve birin. Mafê jinan jî piştguh nekirin.”

### “Referandûm dê demokrasiyê bîne Rojhilata Navîn” Referandûma Kurdistanê wê tenê tesîrê li Iraqê bike an wê welatên din jî têxe bin tesîra xwe?

Li Rojhilata Navîn çar qewmên sereke hene ev jî Ereb, Faris, Tirk û Kurd in. Ji van qewman sê ji wan Ereb, Faris û Tirk bûne xwedî netewdewletên xwe. Azadî, jiyaneke azade dîtine. Lê Kurd ji van tiştan tim bêpar mane. Ji ber vê yekê ev referandûm di serî de welatên cîran, bi giştî jî dê hemû Rojhilata Navîn têxe bin tesîra xwe. Heta li welatên cîran wê guhertinan pêk bîne. Referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê wê li Rojhilata Navîn bibe bingeha demokratîkbûn, rêza li hember mirovan û biçûknedîditina gelan. Ji ber vê yekê jî ez qedereke mezin didim vê referandûmê. Bêguman referandûma serxwebûna Kurdistanê li Rojhilata Navîn û welatên Asyayê dê bibe sedema guherînên mezin. Ev mijarên girîng in. Dê Kurd biryara vê guherînê bidin. Di encama vê de jî wê gel pir memnûn bibin. Wê Kurd bi amadekariyeke xurt bi cîranên xwe yên nû re dest bi serdemeke nû bikin.

Dê guherîn çawa çê bibe, ev dem wê wext bigire?

Bêguman wê ne hêsan be. Elbet ev guherîn jî dê hema rû nede. Her tişt dê bi demê re bibe. Ji bo van tiştan sebir divê, zanebûn divê. Di civaknasiyê de guherîn di rojekê de çênabin. Proseyeke van tiştan heye. Derxistin û ji holê rakirina bermayiyên Baasî ne hêsan e. Zilm û zordariya wan ku li Kurdan û cîranên xwe kirine li holê ye. Xwebirêvebirin dê gelekî xweş be lê ji bo vê dem divê.



### Naci Kutlay kî ye?

Naci Kutlay, 1931an li Agiriyê ji dayîk bû. Dibistana Seretayî û Amadeyî li heman bajarî xwend. Lîse li Erziromê qedand û li Enqereyê jî Peymangeha Tipê xilas kir. Di 1959an de ew û 48 rewşenbîrên Kurd hatin girtin. Di Partiya Karkeran a Tirkiyê (TİP) de dest bi siyasetê kir. 12 Adarê di dema rewşa awarte de 7.5 sal ceza lê hat birîn. Di salên 1970-71an de beşdarî xebatên DDKOyê bû, di nav rêveberiya wê de cih girt û 12 Îlona 1980an dîsa hat girtin. Pişt re jî derbasî Swêdê bû. Pirtûka wî ya yekem a bi navê Îttîhat û Terakkî û Kurd di vê demê de belav bû. Piştî ku vegeriya welat, xebatên xwe yên siyasî berdewam kirin û bû Cîgirê Serokê HADEPê. Di 2007an de jî li Agiriyê bû namzetê parlamenteriyê ku ji aliyê DTPê ve dihat piştgirîkirin.

**HOŞENG OSÊ**

### PKK ji ber çi şer dike?



Dema mirov ji nivîskar, siyasetmedar, rewşenbîr...û hwd yên derûdora PKKê dipirsê: “Hûn ji sala 2000î û vir de çima şer dikin? Ji ber çi ewqas xwîna keç û xortên me tê rijandin?” Dê bersiveke dogmatîk û demagojîk bidin û bêjin: “Ji bo kurd û Kurdistanê”. Lê dema mirov ji wan re dibêje: “Li ser armanca serxwebûn û azadiya Kurdistanê we xwe ava kiriye û qaşo ji bo vê armancê hûn şer dikin û xwînê dirijînin û niha behsa çîrok û bazareke din dikin û dibêjin: Dewleta netewî tiştekî nebaş e, şûndemayiye û paşverûtî ye...û hwd” Dîsa dibêjin: “Ne rast e, ev propagandeya dijmin a şerê taybet e. Em hîna Kurdistan xwazin, serxwebûnhezin...û hwd”. Lê dema mirov li belgeyên PKKê vedigere, baş dibîne bê ev milet çiqas tê xapandin û bi hest û mêjiyê wî tê lîstin.

Di sala 1982an de PKKê di kongereya xwe a 2.min de biryara despêka şerê çekdarî ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê li dijî dewleta Tirk, stend. Ji sala 1982an heta 1984an, PKKê baskê xwe yê leşkerî dibin navê: Hezên Rizgariya Kurdistan (HRK) ava kir û di 15.08.1984an de dest bi şerê çekdarî kir. PKKê di kongereya xwe a 3.mîn de sala 1986an navê baskê lekşerî guhert û kir: Artêşa Rizgariya gelê Kurdistan (ARGK). Piştî Öcalan hate girtin û revandin û zindankirin, PKKê li gorî nêrîn, ferman û perspektîvên Öcalan çû û 180ê derece hate guhertin û ARGK bû HPG: “Hêzên Parastina Gel.” Ango, baskê leşkerî yê PKKê ji “artêş” vegeriya “hêz” û li şûna “rizgariya Kurdistan”, parastina gel hate bi cih kirin!

Û ji bo em baş nas bikin bê ka PKKê ji bo çi şer dike? Û ev xwîna keç û xortên me ji bo çi? Û di bin çi armancê de tê rijandin nas bike, divê mirov vegerê belgeyên PKKê.

Di malpera fermî a hêzên parastina gel HPGê de gelek belge hene mirov dikar xwe bispêre wan. Di belgeya “Rêbaz û îdolojiya HPGê” de ev hevok hene: “Ev hêzên parastinê, ramanên serok Abdullah Öcalan ji xwe re weke bîrdoziya siyasî û şêweyê jiyanê esas digire û hemû endamên rêxistinê bi van ramanan bawer dikin û ji bo pêkanînan wan têdikoşin... her şervaneke/î vê hêzê baweriya wî bi rastiya jiyana sosyalîst heye û li dijî deshilatperstiya netewî, çînayetî û cinsî ye û girîngiyeke mezin dide rengê jinê di rêvebirin, serokatî, jiyan û şer de”. Ango ne Kurdistan! Ne rizgarî! Ne serxwebûn di vê belgê de heye!

Di belgeya “armancên HPGê” de mirov van tiştan dibîne: “Armanca HPG avakirina civakeke demokratîk, ekolojik û ji aliyê cinsî ve azad. Û HPGê hemû enerija xwe ji bo pêkanîna vê armancê terxan kiriye... HPGê çi metirsî û gefxwarin “tehdîd” li ser tu hez û dewletan nake, lê belê artêşeke gelê kurd diparêze, eger ev gel rûberûyî komkujiyan be. Pêve girêdayî: Hemleyên kuştin, çewisandin, tunekirin... ku li ser kurdan were ferz kirin, HPGê dê bersiv bide...” Dîsa di belgeya armancên HPGê de, ne rizgiriya Kurdistan! Ne serxwebûn heye!

Di belgeya danasîna HPGê de jî, ne Kurdistan, ne serxwebûn tên ziman. Di belgeya “cih û belavbûn” ya HPGê de tê gotin: “HPG li hemû perçeyên Kurdistanê bi cih bûye. Kurdistana Bakur, Başûr û Rojhilat. HPG ne tenê beşek ji kurdan diparêze, lê mafên gelê kurd li her çar perçan diparêze”. Di vê belgeyê de jî nayê zelal kirin bê ka ev maf çi ne? Baş tê zanîn ku PKK niha “Xweseriya demokratîk” dixwaze û li ser kurda berî li ser dijminan, ferz dike!

Kî bixwaze, dikare vegerê malpera HPGê û van belgeyan bibîne û bixwîne, bi taybetî dost, heval û derûdorên PKKê, da carekê tenê ji xwe û PKKê û ji “Serokê gelê kurd” birêz Öcalan pirs bikin: Ji sala 1984an heta 1999an dibin banê “Ji serxwebûn û azadiyê birûmettir tiştek nîne”, we bi deh hezaran keç û xortên kurda dan kuştin. Baş e hûn niha çima û ji ber çi berê xort û keça didin kuştin û mirinê? Ji sala 2000î û heta niha, ango ev 17 sal in, ji bo xatirê “Xweseriya we ya demokratîk” hûn xwînê dirijînin, ka hûn gihîştin kû? Gelo ev 17 salê din yên li pêşiya me ne, hûnê çiqas keç û xortê ciwan têxin binê axa sar? Û ji bo çi? Û ji ber çi? Baş e, gelo gerantî heye, sibe “Serok Apo” armanc û nêrînên xwe biguherîne û bêje: “Ne xweseriya demokratîk, lê em xweperestiya demokratîk” dixwazin! Hûnê dîsa, ji bo pêkanîna vê armanca nû, çek û xwînê bikarbînin?

Ez bawer nakim ku PKK dest ji propagandeya demagojîk berde û gotinên “Azadî û serxwebûn” ji nava stran û halanên xwe derîne û rastiyê ji xort û keçên nûhatî, yên 15-16 salî re bêje: Kurdistana serbixwe li cem me nîn e. Eger hûn amade ne ji bo “xweseriya demokratîk” bimirin, fermo meydana şerê me?

Kurdên ku li Behra Spî dijîn:

# Wê Kurdistan ji Rojhilata Navîn re bibe model

DARA PORXELEK

Ji bo referandûma serxwebûnê ya Herêma Kurdistanê (25ê Îlonê) wext hindik ma û li gel vê ji her derê cîhanê bo referandûmê piştgirî jî zêde dibin. Ji bilî mîhrîcanên serxwebûnê yên ku li Ewropa û Amerîkayê têne li darxistin piştgiriyên cuda jî tên. Bendewariyên Kurdên ku li herêma Behra Spî ya Tirkiyeyê dijîn ji referandûmê û piştî referandûmê tê çaverêkirin ku Dewleta Kurdistan a serbixwe wê bê îlan kirin, hene. Kurdên Behra Spî ji Heftenameya Basê re bendewariyên xwe parve kirin. Kurdên Behra Spî dibêjin, "Serxwebûn, wê me wek miletekî xwedan şaristanî, derxe asta miletan. "

**Referandûm mafekî rewa û demokratîk e**

Akdeniz Üniversitesi Felsefe Bölümü Din Sosyolojisi alanında yüksek lisans eğitimini sürdüren Abdullah Çelak, referandum ve ardından bağımsızlığın ilan edilmesi uluslar arası hukuk normlarına göre meşru ve demokratik bir haktır diyen Çelak sözlerini şöyle sürdürüyor:

Abdullah Çelakê ku li ser mijara Sosyolojiya Olê ya beşa Felsefeyê ku li Zanîngeha Akdenîzê lîsansa bilind dike dibêje, referandûm û piştî referandûmê îlankirina serxwebûnê li gorî normên hiqûqa navneteweyî mafekî meşrû û demokratîk e û Çelîk axaftina xwe wiha didomîne,

"Wekheviya gelan û diyarkirina pêşeroja xwe di civaka navnetewî de, ev yek bo pêkanîna aştî, azadî û ewlehiyê wek têgîneke hiqûqî ya navneteweyî derketiye holê. Mijara "Self-determinasyon" yan jî "diyarkirin/tayînkirina pêşeroja xwe." Wek ku normên navneteweyê maqûl dibînin, nîqaşên li ser referandûma ku wê li Herêma Kurdistanê bên kirin bê mane ne. Ez wek Kurd piştgirî didim biryara referandûma Herêma Kurdistanê. Hêvî dikim û bawer dikim ku wê piştî referandûmê jî wê normên demokratîk bên cî û modela demokratîk a Herêma Kurdistanê ku aniye Rojhilata Navîn dê bê berdewamkirin. Dema ku em piştî sala 2003an a Iraqê meze dikin û dibînin ku di navbera Herêma Kurdistanê û Iraqê de him ji aliyê mafên mirovan him jî ji aliyê pêşketina aborî de, ferqeke mezin heye.

Tevî ji sala 2014an pê ve hikûmeta navendî ya Iraqê para budçeya Herêma Kurdistanê nedabe jî divê pêşketina Herêma Kurdistanê û li gorî normên demokratîk avakirina bingehekê jî ev yek bên piştgirî kirin. Gava ku em li van hemû tiştan temaşe dikin êdî bû mecbûriyet ku Herêma Kurdistanê ji Iraqê veqete û qedera xwe tayîn bike." Çelak dibêje, "Ez ji vir Kurdên ku wê deng bidin re bi tenê tiştekî bibêjim; Divê li pişta Serok Barzanîyê ku kedeke mezin daye û Kurdistana xeyalkirî ji xeyalkirinê derxist û aniye vê rojê bisekinin. Ji ber ku serxwebûn, wê me wek miletekî xwedan şaristaniyê, derxe asta miletan."

**'Referandûm pêngaveke wêrekiyê û wêrekî bi têger e'**

Matematîkzan Elenî Hejara ku li Antalyayê dijî bo referandûma 25 Îlonê ya Herêma Kurdistanê hestên xwe tîne zimên û dibêje ev yek sedema kelecanê ye. Ji bo Kurdan referandûm pêngaveke wêrekî ye û wêrekî jî bi têger e. Elenî Hejar, bo pêvajoya referandûmê wiha diaxive,

"Ez wisa difikirim ku divê sîyasetmedar berjewendiyên xwe nefikirin û hewl bidin, canê yek Kurdekî jî be girîng e û divê dîsa sîyasetmedar di vê hişmendiyê de bin. Dîsa wisa difikirim ku divê bandora van a li ser çar perçeyan bo Tevgera Kurdan, divê di Rojhilata Navîn de bo qeyranên nû haydar bin. Têkoşîna jiyanê ya Kurdan bi zimanê xwe ve, kelkotkîbûna ku ji ber sedemên mehrûmiyetên aborî, civakî û çandî, hebûna dagirkeran ên di nav welêt û derveyî welêt, li Îranê Kurd tên dardakirin, li Sûriyeyê şerê li dijî DAÎŞê, li Tirkiyeyê piştî 7ê Pûşperê, pevçûnên ku dest pê kirin, qedexeyên derketina kolanan, ji kar avêtin, koçkirin, rûxandina dîrok û çandî, qirkirinên li Iraqê yên berî û piştî Saddam, pişt re li Iraqê herêma Kurdan û xweserî... tiştekî bifikar e lê belê pêngaveke wêrekî ye û wêrekî jî bi têger e."

Herî dawî Hejar wiha diaxive; "Ez wek Kurdeke ku li herêma Behra Spî dijî, tu hewla Tirkan ji bo ku me Kurdan fam bikin nabînim. Ya rast wê tu carî jî fam nekin. Ez bawer im ev yek bi rewşa Kurdên Îran, Iraq û Sûriyeyê re heman rengî ye. Ji ber vê divê mirov ji famkirinê zêdetir tiştan bike. Tevger tiştekî qenc e. Ji loma jî pêvajoya referandûmê pêngaveke bi qîmet e. Divê Kurdên li perçeyên din, xwedî li referandûmê derkevin û her wisa bo pişgiriyê xebatan bidin meşandin."



> Divê piştevaniya Serok Barzanîyê ku kedeke mezin daye û Kurdistana xeyalkirî ji xiyalkirinê derxistiye û aniye vê rojê bê kirin. Ji ber ku serxwebûn wê me wek miletekî xwedan şaristanî derxe asta miletan.

## "Em wek Kurd şahidiya vê heyama dîrokî dikin"

Azad Badîn dibêje, "Em wek Kurdên ku li Tirkiyeyê dijîn, şahidiya vê heyama dîrokî dikin. Ji ber doza pîroz a Kurdistanê pêşiyên me têkoşan û canê xwe dan. Qe nebe di perçeyekî de wextek gelek hindik ma ku doza pîroz a Kurdistanê encam bide. Em Kurdên ku li Tirkiyeyê dijîn bi giştî di vê pêvajoyê de divê piştgirî bidin xwişk û birayên xwe yên Herêma Kurdistanê" Badînî axaftina xwe wiha didomîne, "Her çiqas ez ji aliyê birdoziyê ve mîna Serok Barzanî nefikirim jî mijar bibe serxwebûna Kurdistanê bi her awayî dayîna piştgiriyê wek peywir dibînim. Ez wisa bawer dikim ku ne bi tenê Kurdên li Kurdistanê dijîn divê Kurdên ku her çar parçe û li dîasporayê dijîn jî di vê pêvajoyê de çalak bin û rola xwe binîn cî. Em pê şanaz bûn ku Hikûmeta Kurdistanê zagona bingehîn ya pir ziman û pir reng amade kir. Niha dem careke din dîsa hemû netewên li Kurdistanê dijîn bi hev re dewleteke hevpar ava bikin."



# Heftenameya Basê referandûmê dixe rojeva Enqereyê!




Kurd dê ji bo xeyala xwe ya sedsalî di 25ê Îlonê de biçin ser sindoqan. Li Herêma Kurdistanê gel di 25ê Îlonê de ji bo qedera xwe diyar bike referandûma serxwebûnê pêk tîne. Ji roja ku biryara pêkanîna referandûmê hatiye dayîn û vir ve li Herêma Kurdistanê xebatên referandûmê didomin. Herwiha têkiliyên dîplomatîk yên herêmî û navnetewî jî bi rêkûpêk birêve çûn. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, Rawijkarê Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî û endamên Hikûmeta Herêma Kurdistanê di hevdîtinên xwe de diyar kirin ku êdî gelê Herêma Kurdistanê serxwebûna xwe paş ve naxîne. Kurdistana serbixwe dê bibe temînata aştî û îstîkrara herêmê. Ji bilî Herêma Kurdistanê, Kurdên li Tirkiye, Îran, Suriye û Dîasporayê dijîn jî ji bo piştgiriya referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê çalakî pêkanîn.

Herêma Kurdistanê ber bi serxwebûnê ve diçe û yek ji girîngtirîn mijar jî têkiliyên li gel cîranan e. Di serî de Tirkiye û Îran ji ber Kurdên di bin serweriya wan de dijîn bertekên neyinî nişan dan. Bi taybetî jî Tirkiye ku têkiliyên wê li gel Herêma Kurdistanê di warê aborî û polîtîk de gelekî pêşketî ne. Li Tirkiyeyê rojname û televizyonên nêzîkî hikûmetê referandûma serxwebûnê ji bo herêmê weke 'metirsî' binav kirin. Lê belê Herêma Kurdistanê di heman demê de destnîşan kir ku têkiliyên bi Tirkiyeyê re dê xira nebin.

Di vê çarçoveyê de Dezgeha Medyayî ya Basê ku bi Tirkî û Kurdî weşana xwe dike referandûma serxwebûnê û têkiliyên Tirkiye–Herêma Kurdistanê dixe rojeva Enqereyê. Di 16ê Îlonê de bi serpereştiya Rojnameya Basê siyasetmedarên Herêma Kurdistanê û siyasetmedarên Kurd ên li Tirkiyeyê li Enqereyê bi naveroka "Referandûma Serxwebûna Herêma Kurdistanê û Dahatûya Têkiliyên Tirkiye–Herêma Kurdistanê" konferasekê li dar dixe.

Konferansa ku dê ji bilî siyasetmedarên Kurd ji derveyî welêt jî gelek rojnameger, akademîsyen, aktivîst û saziyên sivîl beşdar bibin wê bi Tirkî û Kurdî ji du beşan pêk were.

Rûniştina yekem bi moderatoriya Gerînendeya Giştî ya Rojnameya Basê pêk tê û li gor rêzê dê Serokê Weqfa Rêya Azadî Kemal Burkay, Serokê Şaredariya Mezin a Mêrdînê Ahmet Turk, Civaknas İsmail Beşikçi, Parlementerê HDPê Kadri Yıldırım û siyasetmedar Sertaç Bucak dê biaxivin.

Di rûniştina duyem ku wê bi Kurdî pêk were de moderator Berdevkê Berê yê Fraksiyona PDKê li Parlementoya Iraqê Muayyed Teyyib e. Axaftvan li gor rêzê Serokê Berê yê Parlementoya Kurdistanê û Fermandarê Hêza Pêşmerge yê Eniya Kerkûk-Germiyanê Dr. Kemal Kerkûkî, Serokê Partiya Sosyalîst Demokrat a Kurdistanê Heme Hacî Mehmûd, Siyasetmedar Azad Cundiyanî, Serokê Partiya Gel ê Tirkmen-Serokê Fraksiyona Tirkmenan li Meclîsa Kerkûkê Îrfan Kerkûkî ye.

Konferans dê di saet 13: 00an de dest pê bike û berêvarê li dora saet 18:00an de bidawî were.




Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

# Dibistan vebûn lê 400 hezar xwendekar li kar in!



■ SUDET KARAGÖZ

Li Tirkiyeyê 17 milyon xwendekar ji bo demsala nû ya xwendinê di 18ê Îlonê de dest bi dibistanê dike. Lê zaftirînê ji wan Kurd, 400 hezar karkerê cotkariyê wê piştî berhemdanê biçin dibistanê. Li gor vê yekê jî zarokên emrê wan di navbera 11–14an de ne zarokên kurik ji sedî 52, zarokên keç jî ji sedî 60, yên ku emrê wan di navbera 15–18an de ne jî bi giştî ji sedî 91; 400 hezar zîl dê mehekê dereng lê bide. Em bi Seroka Şaxa Edeneyê ya Eğitim-Senê Seçil Sönmez re li ser xebatkarên cotkar ên zarok, derfetên kar û xebatên wan, zarok çend saetan dixebitin û ji ber çi xwendina wan di nîvî de dimîne axivîn.

Bajarê ku herî zêde koçberiya demkî lê dibe jî Edene ye. Karkerên demkî yên zarok dê piştî çandina pembû vegerin dibistanên xwe. Seçil Sönmez destnîşan dike ku zarok di meha Nîsan û Gulanê de dev ji dibistanan berdidin û berê xwe didin karên cotkariyê. Seçil Sönmez dibêje: "Zarokên ku zû ji dibistanan derdikevin û dereng vedigerin motîvasyon û entegrasyona wan zehmet dibe. Zarok di karên ji qeweta xwe girantir de dixebitin. Gelek ji wan ji ber dermanên zeviyan jehrî dibin."

Seçil Sönmez, Tirkiye rêkeftinên Dezgeha Navnetewî ya Xebatê (ILO) maddeya 138 'Girêbesta Emrê Asgarî' û maddeya 182an 'Dawîlêanîna Kedkariya Zarokan a di Derfetên Xirab de Xebitandinê' îmze kiribe jî gavên tên avêtin kêm dibîne û wiha didomîne: "Tirkiye merc daniye ber 3 maddeyên (17 – 29 – 30) Rêkeftina Neteweyên Yekbûyî ya Mafên Zarokan û di bin hîmaya Wezaretê de Navenda Lêgerîna Mafên Zarokan ava kiriye û Belgeya Stratejiya Mafê Zarokan amade kiriye. Lê belê Navenda Lêgerîna Mafên Zarokan ku ji saziyên sivîl û kesên di vê mijarê de pisbor in pêk tê 26 meh in biryareke tenê jî nestandiye. Ji bo dawîlêanîna kedkariya zarokan heta niha tu gav nehatine avêtin. Bi rêgezên bêwate û belgeyên ku hatine weşandin mijara ku hemû civakê eleqeder dike çareser nabe. Ev xuya ye."

> "Tenê li Rihayê 110 hezar zarokên karker ên cotkariyê hene. Ev zarok ji kincên lixwekirinê bigirin heta cihê ku lê bimînin xwedî derfetên kêm in. Li ser vê yekê jî dema diçin xebatê li wir jî rastî êrîşan tên."

**"Zarok rojê neh saetan dixebitin"**

Seçil Sönmez diyar dike ku zarok ne li gor hêza karkirina xwe lê li gor zayenda xwe vediqetin. Zarok ji heftiyê 7 rojan û rojê 9 saetan dixebitin û axaftina wiha didomîne: "Zarokên ku di cotkariyê de dixebitin bi piranî ji heftiyê 7 rojan û rojê 9 saetan dixebitin. Li gor vê daneyê hîç cudahî di navbera zarok û mezinan de tune ye. Li Edene, Karataş û Yuregirê zarok bi 40 lîreyî tên xebitandin. Ev reqem di navbera zarokan de tu cudahî naxê. Her zarok vî pereyî distîne. Di derbarê pirsa hûn çi dikin ji pereyên xwe jî bi giştî 'Em didin bavê xwe' ye. Zarokên emrê wan di navbera 15-18 de bi giştî pereyên xwe ew werdigirin. Yên biçûktir jî carinan dayîka wan werdigire."

**"Li Rihayê 110 hezar zarokên karker ên cotkariyê"**

Sönmez destnîşan dike ku zarok ji ber sedemên hejariyê bi malbatên xwe re di meha Nîsanê derdikevin û heta meha Cotmehê di şert û mercên ne baş de dixebitin. Ji bo xwe bigihînin pêdiviyên jiyanê jî gelekî zehmetî dikişînin. Sönmez dibêje ku zarokên kedkar ên demkî di nav karên ku zarok dikin de yên herî kêmderfet in û axaftina wiha didomîne: "Beriya dibistan bên girtin zarok ji dibistanan diçin û dema dibistan vedibin jî ew di karê cotkariyê de dixebitin."

Sönmez diyar dike ku: "Tenê li Rihayê 110 hezar zarokên kedkar ên cotkariyê hene. Ev zarok ji kincên lixwekirinê bigirin heta cihê ku lê bimînin xwedî derfetên kêm in. Li ser vê yekê jî dema diçin xebatê li wir jî rastî êrîşan tên. Zarok pirsgirêkên çandî, aborî û civakî dikişînin û tesîra vê li dibistanan jî dibe. Zarok dema vedigerin dibistanê jî konsantreyî dibistanê nabin. Dema lêkolîn li ser sedemên neçûna dibistanê tên kirin yekem tişt kêm derfetên aborî û çûyîna xebatê ye. Bi taybetî jî emir çiqas mezin dibe ew çend rêjeya birina kar an jî dûrketina ji dibistanan zêde dibe. Malbat jî ji neçariyê zarokên xwe dibin van karan. Em di wê baweriyê de ne ku di serî de Wezareta Ewlekariya Civakî, Wezareta Polîtîkayên Civakî û Malbatê, Wezareta Perwerdehiyê eger ji bo van zarokan alîkariya taştê û firavin bidin, bi rêya saziyên sivîl jî navendên etûtan vekin ev pirsgirêk dê çareser bibe."

## "Dahatû ji bo min ne diyar e"

Hatina meha Gulanê ji bo Nurhuda Aydoğdu bidawîhatina çûna dibistanê ye. Koçberiya Nurhuda Aydoğdu di 5ê meha Gulanê de bi malbata wê re dest pê dike û di serî de jî li Nigde, Edene heta Gîresûnê didome. Her çiqas dibistan dest pê bike jî Nurhuda Aydoğdu hê jî li bajarê Tirkiyeyê dixebite. Ji me re çîroka 'çima naçe dibistanê' û niha jî li karkeriya cotkariyê ye wiha vedibêje: "Meha Gulanê ji bo min girtina dibistanê ye. Pir zehmet e. Niha dibistan vebûne û ez hê jî dixebitim. Em nizanim bê em ê kengî vegerin Rihayê. Ez ji hevalên xwe gelekî paş mam. Ji bo ez xwe bigihînim hevalên xwe pir dixebitim lê hin ders hene tênagihijim. Ez xwendekara pola sêyemîn ya lîseyê me. Divê ez amadekariya ezmûna zaningehê bikim lê nizanim dê çawa çê be. Dahatû ji bo min hîç ne diyar e. Hevalên min tev diçin qursan lê ez nikarim biçim dibistanê jî. Divê ez bixwînim, divê karekî min î baş çêbibe.

## "Em jiyaneke koçerî dijîn"

Merve Xanima ku tevî 9 zarok û mêrê xwe ji neçariyê berê xwe daye Edeneyê çîroka xwe ji me re vedibêje; "Dema em tên xebatê em neçar in bi hev re werin. Ez nikarim zarokan li Batmanê bi tena serê wan bihêlim. Eger rewşa me ya aborî başbûya em neçar nediman bihatana vir. Min jî dixwest zarokên min di dema xwe de biçin dibistanê weke hevalên xwe. Lê belê derfetên aborî tune ne. Zarok jî bi me re li van deran şerpeze dibin."

# Xelkê sîvîl ê Mexdûrê Pevçûnan: Bila çek rawestin!

■ CELÎL CEWHER

Li bajarên Kurdan pêvçûnên di navbera PKK û hêzên ewlehiyê de dibin sedema mirina kesên sivîl jî. PKK êrîşî kesên li herêmê rê çêdikin, dike û çol jî bi Wesaîtên Hewayî yên Çekdarî tên gulebarankirin. Hefteya borî li Şirnexî karkerên Kurd ji aliyê PKK ve hatibûn kuştin. Di 31ê Tebaxê de jî çola gundê Oğula Colemêrgê bi WHÇ'yan hatibû gulebarankirin. Di bûyerê de Mehmet Temel( 35) canê xwe ji dest da, İbrahim Sak (54), İsmail Aydın (43), Musa Tarhan (54) jî birîndar bûn. Birîndarên ku li nexweşxaneyê hatin dermankirin, pişte re hatin binçavkirin û girtin.

Walitiya Colemêrgê di daxuyaniya xwe de got, kesên birîndar ' hevkar in'. Lê belê parlamenterên Colemergê yên HDPê û parlamenterê Stenbolê yê CHPê Sezgin Tanrıkulu rave kirin ku ew kes ne 'hevkar' lê kesên sîvîl in. Wezîrê Karên Navxweyî Süleyman Soylu jî wiha axivî, "Em bi Wesayitên Hewayî yên Bêmirov gelek terorîstan dibînin. Rêbazên me hene, em ji bilî van rêbazan teqez êrîş nakin. Bi taybet jî em êrişî kesên ku em wan wek terorîst bi nav nakin an jî welatiyên ku em li cem terorîstan dibînin nakin. Em terorîst û welatiyan ji hev vediqetînin û esas li dijî terorê têdikoşin. Di vê mijarê de jî hêzên me yên ewlehiyê gelek bi baldarî tevdigerin. Hin şaşîtî û kêmasî dibe ku heb in. Em van yekan jî dinirxînin û wisa tevdîran digirin."

**" Mudexaleya Hevgirtî Tune ye!"**


Li aliyê din Baroya Amedê li herêmê hin lêkolîn kirin û diyar kir ku kesê ku canê xwe ji dest daye, sîvîl bûye. Li ser navê Baroya Amedê Serokê Baroyê Ahmet Özmen destnîşan kir ku bi malbata Mehmet Temelê ku di bûyerê de canê xwe ji dest daye re axivîne, malbatê ji van re gotiye, Temel bavê 3 zarokan e, li Colemêrgê dijî û karê tesîsatê dikir û ji bo geştê çûye wê derê.

Özmen amaje kir ku Mehmet Temelê ku piştî mudexaleya çekdarî canê xwe ji dest daye, İbrahim Sak, Musa Tarhan û İsmail Aydınê birîndar dema ku çûne ciyê bûyerê di noxteya ewlehiyê ya Depinê re derbas bûne û kontrola nasnameyên wan ji hêla hêzên ewlehî ve hatiye kirin. Özmenê ku bûyerê li gor mevzuata hiqûqa netewî û navnetewî dinirxîne wiha dibêje; "Dema nêzikahiya di navbera cihê bûyerê û şûnwarên ku mirov lê dijîn û ew hêza mirinde ku hatiye bikaranîn li ber çavan bê girtin, li gor encamên ku rû daye, di asta civakeke demokratik de ne mudaxaleyeke hevgirtî ye."

PKK jî li Uludereya Şirnexê êriş bir ser karkerên ku di çêkirina rê de dixebitîn û 3 karkeran canê xwe ji dest dan. Hatibû îddia kirin ku li gundê Mişrefa girêdayî navçeya Lîceya Amedê jî WHÇyan 3 gundî dabûn ber guleyan. Herî dawî jî PKKîyan li çola gundê Çobanpınara li ser Gevera Colemêrgê ve êrîşî karkerên ku di xetên neqîl ên enerjiyê de dixebitin kir, 2 karkeran canê xwe ji dest da û karkerekî jî birîndar bûbû. Nîqaşên ku li ser encamên êrîşên WHÇ û PKK û komîsyonên bêalîgir berdewam in lê ji aliyê din ve jî xizmên kesên sîvîl ku canê xwe ji dest dane dibêjin êdî em naxwazin li herêmê pêvçûn çêbibin.

**"Bila zarokên îro, sibe nebin qurbanên şer"**

Enver Şahinê biraziyê Hazım Şahin ku dema li Geverê di xetên neqîl ên enerjiyê de dixebitî û ji ber êrişan canê xwe ji dest dabû, di derheqê bûyerê de ji Heftanameya Basê re axivî. Enver Şahin dibêje, "Li herêmê şerekî du alî heye, gel êdî şer û pevçûnê naxwaze. Hazim jî bû qurbanê vî şerî. Her du alî jî zimanê şer bikar tînin. Her du alî jî dixwazin bila li miriyên wan xwedî bê derketin. Di pevçûna van her du aliyan de gel xisarê dibîne. Her wiha ev hê qonaxa destpêkê ye. Kî, kê dikuje ne diyar e. Hazim hat kuştin, herkes dizane sibe û du sibe 20 kes di rojekê de dibe ku bên kuştin. Tabîata şer wisa ye. Gel dixwaze ev şer bisekine. Ev mesele bi vî şerî nayê çareserkirin. Ger çareseriyeke nû dest pê bike, dibe ku hê baştir bibe. Divê her du alî jî dev ji zimanê şer berdin, feraseteke çareseriyê lazim e. Hazım û 7 kesên ku di malbata wî de canê xwe ji dest dane mexdûrên vî şerî ne. Me gelek mirin dîtin û êdî em bi ditîna mirinan westiyan. Ger şer wisa berdewam bibe, zarokên îro dê sibe bibin perçeyekî vî şerî."



## "Me cenaze di ava Zapê de şuşt..."

Biraziyê din Enver Şahin jî dibêje îdiayên di çapemeniyê de ku dibêjin PKK 3 karker kuştine ne rast in. Û di derheqê bûyerê de wiha diaxive, "Cihê ku Hazım lê dixebitandin herêma şer e. Û di heman demê de hema li kêleka qereqol e. Birina Hazım a li wir jî tiştekî biguman e. Çimkî cihê ku Hazım lê dixebitî ne ev gund e. Hazım li navendê dixebitî. Ev miteahît berê jî ji aliyê PKKê ve hatibûn hişyarkirin ku nekevin vê herêmê. Wan jî dizanîbû ku birayê Hazım (malbata şehît) li PKK canê xwe ji dest dabû û ger tiştek bibûya difikirîn ku Hazım dê mudaxele bike. Ji loma ew digel xwe birin wê derê. Bûyer wisa pêk tê. Lê belê ev cî jî cihekî bifikar e.

Hêzên Kontra jî tên hişê me, dibe ku wan jî kiribe. Berê tiştên wisa çêbûne. Ez bawer nakim ku PKK Hazım û karkerên cem wî kuştibin. Divê ev yek baş bê lêkolînkirin. Ji loma em dixwazin komîsyonên lêkolînê bên avakirin. Destûr nedan ku em cinazeyê xwe hildin. Min ji Walî û ji Midirê Emnîyetê re got 'Çil roj berê birayê Hazım canê xwe ji dest da, we muameleya terorîstan li wî kir. We destûr neda ku ji 5 kesî zêdetir beşdarî cinaze bibin. Tabût nedan, ji bo ku em cinaze bişon cih ji me re peyda nekirin û me jî cinaze di ava Zapê de şûşt. Îro jî bo heman malbatê him muameleya şehîd him jî ya terorîstan dikin' Ev trajediyek e. Min hewl da ku vê ya vebêjim."

"Her du alî jî bi zanebûnî dikin"

Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Öztürk Türkdoğan jî tîne ziman ku di pêvçûnan de herî zêde sîvîl zirarê dibînin. Türkdoğan di derheqê bûyerên ku li herêmê diqewimin de wiha diaxive, "Em her car hiqûqê tînin bîra aliyên şer. Di pêvçûnan de beriya her tiştî zirardîtina sîvîlan nayê qebûl kirin. Bombebarankirina gundiyan û li çolê cihên ku mirov lê dijîn ji aliyê firokeyan ve, kuştina sîvîlan û zirardîtina wan, şewitandina daristanan, ji aliyê PKK ve kuştina karkeran, ev hemû kiryar şaş in û derqanûnî ne. Rawekirina van tiştan nabe. Van çalakiyan her kî dike divê bên şermezar kirin. PKK karkeran bi sedema 'Hûn riyên bi ewlehî çêdikin û ceyranê dibin qereqolê' nikare bikuje. Heman şiklî hêzên dewletê jî nikare zirarê bide cihên ku mirov lê dijîn ên deverên ku operasyonê dikin. Ev yekana qedexe ne û her du alî jî vê ya dizanin û bi zanebûnî dikin."

"An aştiyeke bi rûmet an jî berdewamiya qetlîaman"

Berdevkê 'Tevgera Azadî û Mirovan' Mehmet Pala jî wiha diaxive, "Ew konsepta ku şer girantir û kûrtir dike, li pêşiya têkoşîna sîyasî, sîvîl û aştîxwaz a kêşeya Kurd digire, bi tenê kesên ku şer dikin qetil nake. Ji bilî mirina kesên ku di destê wan de çek hene, mirovên sîvîl ên bêçek jî qetil dike. Di tabîeta hemû şeran de îxlalkirina mafên mirovan heye. Yan emê vê pirsgirêkê bi aştiyeke bi rûmet çareser bikin û bi dawî lê bînin an jî emê marûzê qetlîamên sîvîl, texrîbata xwezayê bên. Di vê noxteyê de em exlaqî nabînin ku berpirsiyariya qetilkirina sîvîlan bidin ser milên aliyên ku şer dikin. Berpirsiyarî û rola me ya ku em bê deng dimînin jî di berdewamkirina vê pevçûnê de heye."

MUNZUR ÇEM

## Ber Bi Referanduma 25Ê Îlonê Ve



Ji ber tengasiyeke şexsî, min heta îro fersend nedît li ser Referanduma 25ê ilonê binivîsim. Ji ber ku min ev wek kemasiyeke muhîm dît, min xwest ku zorê bidim xwe û di derheq vê gava dîrokî de bi kurtayî çend gotinan binivîsim

Gava ku meriv li ser vê babetê difikire jî beriya her tiştî gere meriv ji ber çavan dûr nexe ku di nav hemû neteweyan de wekhevî prensîbeke insanî û demokratîk e. Ji ber vê yekê jî ev maf, di dokumentên navneteweyî de wek mafekî bingehîn cîh digire

Wek nimûne: Yekitiya Miletan, di xala yekemîn a „Deklerasyona Navnetewî ya Mafên Mirovan" ya ku di 10.12.1948 de hatiye qebulkirin de weha dibêje:

1/1. Hemû gel xwediyê mafê çarenûsiyê ne. Gor vî mafî, ew di tayînkirina statuya xwe ya polîtîk de azad in û dîsa azad in ku ji bo peşveçûna xwe ya ekonomîk, sosyal û kulturî, gavên hewce bavêjin.

Biryara ku Konseya Giştî ya Yekitiya Miletan di 16.12.1966 an de girtiye, dîsa heman prensip tê dubarekirin.

Dokumentên Dawî ya „Konferansa Ewropa ya Ewlekarî û Desthevûdudayinê" (Helsinki Final Act)* de jî li ser heman babetê weha tê gotin:

Gor mafê wekheviya nav gelan û mafê tayînkirina pêşeroja xwe, hemû gel, bê destdirêjiyên der ve, xwediyê wî mafî ne ku kingê û çawa dixwazin, statuya xwe ya hindûrî û derveyî bi xwe tayin bikin; û di warê pêşveçûyinên polîtîk, aborî, sosyal û kulturî de, gavên ku dixwazin, di avêtina wan de dîsa azad in.

Eşkere ye ku, jiyana ke îro gelê Kurd li seranserê Kurdîstanê dijî, bi daxwaz û biryara wî nîne. Kurdîstan piştî peymana Sykes-Picotê (1916), 1923yan de bi peymana Lozanê, bi destê biyaniyan hat parçekirin. Ew parçekirin sedîsed dijî daxwaz û îradeya Gelê Kurd bû. Ji ber vê yekê ji Lozan peymana dabeşkirin û dagirkirinê ye û ji tu aliyî ve ne meşru ye.

Piştî vê peymana kolonyalîst, Kurdîstana ku berê 2 parçe bû, bû 4 parçe. Di serî de jî devletên dagirker û kolonyalîst ên ku bi zorê dest danîne ser axa Kurdîstanê, tu carî mafên mirovî û demokrasî neanîn bîra xwe. Wan bi sîyaseta qirkirinê, bi siyaseta talan, vêrankirin û asîmîlasyonê, xwestin ku koletiyê bi gelê Kurd bidin qebulkirin û di dawiyê de jî hebûna wan ji holê rakin. Ew dewletên ku niha têndiçin û ber xwe didin ku referandûm paş ve bêxistin, tu carî dengê xwe dernexistin. Zilm û neheqiyên ku bi Kurdan hatin kirin, rijandina xwîna Kurdan, koçberî û nefîkirin tu carî qasî bazarganiya nav wan qiymet nedît. Ew dewlet û hêzên navnetewî yên ku zû bi zû qala parastina yekîtiya Iraqê, yan jî Tirkîyê, Îran û Suriyê dikin, ji xwe napirsin, nabêjin ku gelo welatê Kurdan çima parçe parçe ye û kê parçe kiriye?

Dîsa ber bi referandumê ve dîroka Kurdan jî careke din dubare dibe û hinek partîyên Kurdan eşkere yan jî veşartî, dijî azadiya gelê xwe derdikevin. Meriv li çapemeniya wan dinêre; tu dibêjî qey li Kurdistanê bi navê referandumê pirsek tune. Hinek ji wan di bin têsîra kîn û hisên dijminatiyê de ne û kor bûne, nabînin. Hinek jî ketine tora dijminên gelê xwe, lîstikên wan dilîzin.

Em hemû vê rastiyê dizanin û dibînin; li ser rêya serxwebûnê, asteng pir in lê gelê Kurd jî qerar daye û bi coşeke mezin ji bo 25ê îlonê xwe amade dike. Bêguman di wê berxwedan û pêşveçûnê de wek şexs, rola sereke yê Mesud Barzanî ye. Barzanî, ji sed sal zêdetir e di berxwedana azadiya gelê Kurd de xwediyê roleke giring e. Mesud Barzanî jî vê tradîsyonê dimeşîne. Hem wek şexs hem jî wek dezgeh û sazî, ên ku ji bo serketina refrandûmê dixebitin; rola wan roleke pîroz û dîrokî ye û şik tune ku wek îro, di pêşerojê de jî gelê seranserê Kurdîstanê, bi serbilindî ked û xebata wan bîne bîra xwe.

Ji aliyê din ve gere kesek jibîr neke; çarçeweya referandûmê çiqas ku bi Başûrê Kurdîstanê sînorkirî ye jî di eslê xwe de ew ji bo hemû Kurdîstanê ye. Loma hemû gelê Kurdîstanê li ser pîya ye û bi dilsozî û hêviyeke mezin piştgirî dide. Sînorên dagirkeran di vî alî de êdî nemane. Zaf muhîm e ku her Kurdîstanî, bi taybetî jî dezgeh û sazîyên Kurdan, vê pêşveçûnê baş bixwînin. Kurd di Rojhilata Navîn de xwediyê dîrokeke dûr û dirêj in. Mafê wan e ku wek hemû gelên cîhanê pêşeroja xwe bi xwe tayîn bikin û azad bin. Azadbûna gelê Kurd ji bo kesekî ne taluke ye. Aksê wê, azadnebûna Kurdan, dibe û wê bibe sebebê alozî û probleman. Şik tune ku heta Kurd azad nebin; gelên cîran jî nabin xwediyê sîstemeke rêkûpêk û demokratik. Wek filozofê mezin Karl-Marx dibêje, „Miletê ku zilmê li neteweyên din dike nikare azad bibe"

Di çareserkirina pirsa Kurd de ji derveyî mafê çarenusî tu rê tune. Ji îro şûn ve, ev maf gere hem li hindûr hem jî derveyî welêt, di rojeva Kurdan de wek xala sereke cîh bigire. Ji bo dermankirina birînên kûr yek rê heye; çarenusî û azadî!

# Di serdema klasîk de pirtûkên 'Dîroka Kurdan'

ŞÎRKÛH AMEDÎ

Ji sedsala 9. û vir ve ji aliyê Kurdan ve di derheqê dewlet, mîrîtî û eşîran de bi Erebî, Farisî, Osmanî û Kurdî mensûr pir kêm bin jî menzûm hatine nivîsandin. Di vê nivîsê de pirtûkên di derbarê pirtûkên serdema klasîk 'Dîroka Kurdan' heta sedsala 20. hatine nirxandin.

Pirtûka Alimê Kurd Ebû Henîfe ed- Dînawerî (M.895) bi Erebî 'Ensabu'l–Ekrad (Sereceya Kurdan) ku niha winda ye neyê hesibandin di vê mijarê de heta niha pirtûka ku tê zanîn ya 'Şerefnameya' Şerefxanê Bilîsî ye ku di sala 1597an de bi Farisî hatiye nivîsandin. Her wiha di sala 1257an de nûshaya ku niha tenê li Pirtûkxaneya Suleymaniyê ya li Stenbolê heye û ji aliyê Hazrecî ve bi Erebî hatiye nivîsandin 'Tarihu'l–Devletu'l–Ekrad/Dîroka Dewleta Kurd' jî di navbera yekem pirtûka li ser dîroka Kurdan e.

'Ensabu'l – Ekrad (Sereceya Kurdan)

Dîneweri di berhema xwe ya bi navê 'Ensabu'l – Ekrad (Sereceya Kurdan) de di derbarê binemala Kurdan de lêkolînan berhev dike. Hebûna berhemê ji aliyê alim û lêkolînerên ku piştî Dîneweri jiyane ve derketiye holê. Heta niha tu nushayên wê negihiştibin destê me jî bêguman di derbarê binemaliya Kurdan û zimanê Kurdan de xwedî zanyariyên girîng e. Oryantalîstê Rûs Romaskevic di lêkolîneên xwe de dibêje wî li Muzeya Asyayê ya li Saint–Petersburgê pirtûkeke bi navê 'Risatei Ensabi'l Ekrad dîtibe jî diyar nekiriye ku ev pirtûk a kê ye.

**Tarihu'l-Fariki, ed-Devletu'l-Mervaniyye:**

Ji aliyê İbnu'l-Ezrak (1117-1181?) el-Farikî di sala 1176an de bi Erebî hatiye nivîsandin. Nushayên 'Tarihu Meyyafarikin' li Londra di Muzeya Britanyayê de ye. Li gor van her du berheman dema mirov lê dinêre edîsyon ji aliyê Dr. Karim Farouk el–Khouly û lêkolîner Yusuf Baluken ve hatiye kirin. (Weşanên Nûbihar, 2014) Nushayeke din jî li Pirtûkxaneya Budlinê ye. Nushaya herî berfireh 418 rûpel e.


Îbnu'l Ezrak di berhema xwe de dîroka Merwaniyan ku di dema Dîroka Îslamiyetê de li Meyyafarqîn û der û dora wê jiyane nivîsandiye. Ji yekem dewletên ku Kurdan ava kiriye ye. Her wiha qala dewleta Şeddadî ya Kurdan, Ebbasî, Selçûkî, Artûkî û Emeviyan jî kiriye. Erzak, dema berhema xwe amade kiriye ji tecrûbeyên dîroknasê Îslamê jî sûd wergirtiye û tiştên ku wî bi xwe dîtiye an jî bihîstiye berhev kiriye. Şerefxan jî di Şerefnameyê de, di beşa 'Zirkan' de ji vê berhemê sûd wergirtiye. Beşa Merwaniyan ji vê berhemê ji aliyê M.A. Bozarslan ve ji bo Tirkî hatiye wergerand û bi navê Dîroka Merwaniyên Kurd 'Mervani Kürt leriTarihi'(Weşanên Koral – 1990) hatiye weşandin.

**Tarihu'l-Devletu'l-Ekrad:**

Pirtûka ku ji 400 rûpelî pêk tê û nusheya wê tenê li Pirtûkxaneya Suleymaniyê ya li Stenbolê ye û di Beşa Hekimoglu de (no: 695) ye, dîroka Dewleta Kurdî ya Eyûbî hatiye nivîsandin. Berhem ji aliyê M. Emin Narozi ve hat çapkirin û bi heman awayî jî ji bo Kurdî hatiye wergerandin. (Weşanên Azad, 2005, 856 rûpel)

**Metnên Şikarî**

Sernivîsa van metnan tune ye. Lê ji ber ku ji aliyê Ahmed Haydarî ( M 1506 an jî 1584) ku mahlasa Şikarî bikar dianî bi navê wî tên binavkirin. Berhema ji aliyê Şikariyê Diyarbekirî ve bi Tirkiya Kevin ya Anadolûyê hatiye nivîsandin li Pirtûkxaneya Mizgefta Yusuf Axa ya Konyayê ye. (Klas: 946.6 Sernav: 0000000562). Wisa tê texmîn kirin ku bavê Dîroknas Murat Bardakçı, Cemal Bardakçı ew berhem biriye Konyayê. Çapa di sala 1940an de ku ji aliyê midûrê Muzeya Konyayê ve hatiye çapkirin beşên di derheqê Kurdan de jê hatine derxistin. Berhem dîroka Kurdan a li Anatoliya Navîn ku di sedsalên 13–14mîn de derbas dibe ronahî dike. Berhem bi hatina Selçûkiyan dest pê dike û bidestxistina Anatoliya Navîn aliyê Osmaniyan ve bidawî dibe. Di vê 400 salî de diyar dibe ku Kurd aktoreke sereke ne li herêmê. Dîroka ku tê de Mîrîtiyên ku Kurdbûna Dulkadir, Eşref û Germiyanan tê nîqaşkirin di vê berhemê de zelal dibe. Her wiha di derbarê şerê Kurdan ê li hember Osmanî, Selçûkî û Mogolan û bidestxistina Konya û Enqereyê jî di vê berhemê de bi awayekî vekirî hatiye nivîsandin. Sedat Ulugana beşê vê pirtûkê ku di derheqê Kurdan de ne, bi giştî berhev kiriye û weşandiye. Li Anatoliyayê Artêşên Kurdistanê (Anadolu'da Kürdistan Orduları) (Do Yayınları 2013)




> Îbnu'l Ezrak di berhema xwe de dîroka Merwaniyan ku di dema Dîroka Îslamiyetê de li Meyyafarqîn û der û dora wê jiyane nivîsandiye. Ji yekem dewletên ku Kurdan ava kiriye ye. Her wiha qala dewleta Şeddadî ya Kurdan, Ebbasî, Selçûkî, Artûkî û Emeviyan jî kiriye.

**Şerefnâme:**

Berhema ku ji aliyê Şerefxan ve di sala1597an de li Bilîsê bi Farisî hatiye nivîsandin 'Şerefname' an jî 'Dîroka Kurdistanê' girîngtirîn berhema dîroka Kurdan e. Şerefxan bi armanca malbatên Arîstokrat ên Kurdistanê vebêje ev berhem nivîsiye. Berhem bi girîzgehek, çar beşên sereke û bi encamekê; bi tevahî bi 6 beşan hatiye nivîsîn. Çavkaniyên Şerefxan; 'Şehname'ya Firdewsî, 'Nuzhetu'l-Kulûb'a Hamdullah Mustevfî, 'Zubdetu't-Tevarîh' û 'Zeyl Ala Cami'it Tevarîh'a Hafîz Abrû, 'Zafernâme'ya Şerefudîn Elî el-Yezdî, 'Metlau's-Sadeyn û Mecmua'u'l-Bahreyn'a Ebdurrezzâq Semerkandî ku bi Farisî ne; Muhammed b.Ömer el-Vakidî''Futûhu'ş-Şam', 'Futûhu'l-Buldan'a Ehmed b.Yahya el-Belazurî ku bi Erebî ne û Berhema Laîfi;'Tezkiretu'ş-Şuara' ku bi Tirkî hatiye nivîsandin in.

Pirtûk li ser dîroka dewletên ku bi her awayî serbixwe bûne beşa yekem pêk tîne. 'Merwânî, Hasanveyhî, Lûra Mezin û Biçûk û Eyyûbî'; 'Erdelân, Şenbo, Bahâdînân, Azîzan ve Melikân' ku li ser navê xwe pere derxistine û xutbe xwendine: 'Melkîşi, Mirdasî, Hazzo, Nemirân, Kilîs, Şîrvân, Zirrkî, Suveydî, Suleymânî' ku di bin îdareya Osmaniyan de hebûna xwe domandine pêk tê. Di beşa duyem de jî: 'Sohrân, Bâbân, Mukrî, Biradostî, Mahmûdî, Dunbulî, Zerzâ, Istûnî, Tâsînî, Kelhor, Bâne, Terza' û yên ku li axa Safevî ne weke: 'Mansûrê Reş, Cegnî, Zengine, Pâzûkî' cih digire. Berhem ji sedsala 17mîn de ji bo gelek zimanan hatiye wergerandin û gelek pêvekirin li ser pêk hatiye.

**Mîrnameya Hekkaryan:**

Mîrnameya Hekkaryan bi terza Mesnewî û bi Farisî hatiye nivîsandin. Berhem ji 10.578 beyîtan pêk tê û du pêşgotinên ku piştî pirtûkê tevlî pirtûkê bûye pêk tên. Nivîskarê berhemê katibê begê Hekkarî Yahya El Kirame ku navê wî Temerxanê Yazicî ye. Pêşgotina yekem piştî mirina Temerxan bi heftî salî şûn de hatiye nivîsîn. Pêşgotin ji aliyê nasê Temerxan Mîrza Mihemedê Yazicî ve hatiye nivîsîn. Pêşgotin duyemîn jî ji aliyê neviyekî Temerxan ve di sala 1914an de ji aliyê Muhammed Teyyar ve hatiye nivîsîn. Di berhemê de ji Mîr Êzdîn Şêr (Îzzedîn Mucella) heta Mîr Silêman, Mîrên ku di navbera 1300–1849an de li Hekkariyê mîrîtî kirine pêk tê.

Temerxan di derbare nivîsandina pirtûkê de dibêje; "Ez 50 salî me. Weke Fîrdewsî û helbestvanê mezin min niyet kiriye ku dîroka Mîr û Padişahên xwe binivîsim. Lewre Padişahên me jî vê yekê heq dikin. Min bi vê niyetê dest bi vê pirtûkê kiriye." Pirtûk piştî girîzgahê ku ji sedema nivîsandina pirtûkê pêk tê, şerê di navbera zarokên Mîr Zeynel Beg, Zekeriya Xan Beg û Zahid Beg de derbas dibe dike mijara xwe. Ev beş ji derketina Zekeriya Beg bo text û bidestxistina kelhên Çelê û Bêtenûrê heta 1639an didome. Beşa ku ji aliyê Mîrza Mihemedê Yazicî ve hatiye nivîsandin jî ji destpêkê heta 1742an e ku hemû Mîr û Begên Hekkariyan tê de hatine nivîsîn. Berhema ku ji 694 rûpelan pêk tê ji aliyê Mazhar Dûderî ve hatiye dîtin. Xalid Sadinî jî li ser vê berhemê lêkolîneke berfireh didomîne.

**Terceme-i Tevârîh-i Şeref Hân:**

Ev pêvek ji aliyê Şemê ku di Seraya Yansûr Begê hikumranê Palû de katibî dikir li Şerefnameyê hatiye zêde kirin. Di sala 1682an de bi Tirkiya Osmanî hatiye nivîsandin. Şemî ku ev xebat bo Yansûr Beg kiriye ji destpêkê dest bi wergera berhemê kiriye û ji 1597an heta 1682an bûyerên ku rû dane lê zêde kiriye. Şemî piştî vê ji bo Mîrdasê ku hikumraniya Egilê kiriye Mistefa Beg nushayeke nû nivîsandiye. Li vir, ji Mîrdasên ku li Egilê hikumranî kirine û heta 1684an dîroka wan nivîsandiye. Dr. Adnan Oktay ev werger kiriye mijara lêkolînê. (Weşanên Nûbihar, 2016)

**Tarixu Kurdistan:**

Berhema ku ji aliyê Muhammed Efendi eş-Şehrezori (m. 1667) ve hatiye nivîsandin di sala 1701an de hatiye kopî kirin. Pirtûk ji 270 varak û 540 rûpelî pêk tê. Wisa tê texmîn kirin ku li Samerra ya Iraqê di Pirtûkxaneya Askeriyyin de ye.

Tewarîxî Cedîdî Kurdistan/Dîroka Modern a Kurdistanê:


Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî ji aliyê Mele Mehmûdê Bazidê (1797 – 1867) ve ji bo Kurdî hatiye wergerandin. Her wiha jî Mele Mehmûd pirtûka bi navê 'Tewarîxî Cedîdî Kurdistan' ku ji hezar rûpelî pêk di sala 1857–1858an de nivîsiye. Lê belê heta niha nehatiye dîtin.


Nameya di 30ê Adara 1867an de ji aliyê A. Jaba ve ji Îzmîrê bo Rusyayê hatiye şandin de, pêşgotina Tewarîxî Cedîdî Kurdistan ( Dîroka Modern a Kurdistanê) ji bo Fransî hatiye wergerandin û wisa hatiye şandin. Ev werger di sala 1997an de ji aliyê E.Î Vasiliyeva ve Kurdî hatiye amadekirin û weşandin. Di nameya Jaba ku di 13ê Hezîrana 1867an de şandiye Dornê de jî qala naveroka vê pirtûkê hatiye kirin. Pirtûka Dîroka Modern a Kurdistanê ji 11 beşan pêk tê û bûyerên ku di navbera 1785–1858an de li deverên Kurdistanê rû dane tomar kirine. A. Jaba di nameya xwe ya ku di 22ê Çileya 1881an de ji Justî re şandiye de 'Di pirtûka Mela Mehmûdê Bazidî de beşa 'Gewrê û Stranên wê' wergerandiye Fransî. Ev werger di sala 1881an de di kovara Bullettin de l' Athenee Oriental (H.3/1881 r. 145 - 158) de hatiye weşandin.

> Her çiqas Kurd ji dewletbûnê bêpar bin jî di derbarê 'Dîroka Kurdan' de him bi zimanê xwe him jî bi zimanên din ewçend berhem hatine nivîsîn. Ligel berhemên ku gihêştine rojame, yên ku tenê navê wan tên zanîn jî hene. Her wiha berhemên ku di şer û bobelatan de winda bûne jî hene.

## Hikûmeta Ezîziye ya Kurd

Berhema ku ji aliyê Celadet û Kamiran Elî Bedirxan ve di berhema bi navê 'Edirne Sukutunun İç Yüzü' de qala weşandina wê kiribin û ji aliyê Surreya Bedirxan û Kamiran Bedirxan ve belgeyên ku hatiye nivîsandin hatibin dîtin jî, heta niha xwe negihandiye berhemê. Di Şerefnameyê de bi navê Azîziye ku derbas dibe ji sedsala 19.-20.mîn de malbata ku bi navê Bedirxaniyan tê zanîn dîroka wan e. Abdurrahman Bedirxan dema yekem Rojnameya Kurdî bi navê Kurdistan derdixe ji hejmara 8.mîn û vir de bi Kurdî rêzenivîsek nivîsandiye.




**Tarihu'l-Neseb/Dîroka Mîrên Şêrwanê:**

Salih Begê Şêrwî ku di navbera 1787–1821an de li Şêrwanê hikûmranî kiriye Dîroka Mîrên Şêrwanê bi Erebî nivîsandiye. Berhem ji pêşgotinekê û ji heft beşan û ji encamekê pêk tê. Salih Beg dema berhema xwe nivîsandiye ji pirtûkên dîrokî (Şerefname, Dîroka Taberî, Cîhannuma) û tapuyan jî sûd wergirtiye. Di berhemê de hedîseyên dîrokî ku ji sala 1200î de Mîrên Şêrwanê ji Misrê hatine û heta Salih Beg hatine nivîsîn. Her wiha nîqaşên di navbera Mîrên Şêrwan, Botan, Hizan, Rojkan, Xerzan, Gurgul, Spayêrt, Mikis, Zirkan, Hezzo, Karkar û Axkîs de nivîsiye. Kerem Soylu nivîs ji Erebî bo Kurmancî wergerandiye: 'Dîroka Nijada Şêrwan (Dîroka Mîrekên Şêrwanê)', İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, 2005.

**Târîhî Ekrâd:**

Berhema ji aliyê Nazîrî ve di sala 1882an de bi Farisî hatiye nivîsandin. Berhem 75 rûpel e û di her rûpelê de jî 10 rêzik hene. Nivîsa vê berhemê ya orîjinal li bajarê Qûma Îranê ye. Naveroka berhemê xebata 'Şêx Ubeydullah Nehrî' ya serxwebûnê ye.

**Şuûn-ı Kurdistan:**

Li gor Îbnul Emin Mahmut Kemal (Di Sedsala Duyemîn de Helbestvanên Tirk) diyar dike ku Emîn Feyzî Beg bi Tirkî Şuûn-ı Kurdistan nivîsiye û di berhemê de Dîroka Kurdên Bababî hatiye nivîsandin.

**Te'rîxa Caf:**

Berhema Te'rîxa Caf ku ji aliyê Kerîm Begê Caf (1889 – 1949) ve hatiye nivîsandin ji pêşgotinek û ji 13 beşan pêk tê. Berhem bi Soranî hatiye nivîsandin. Berhem li ser nifûs û şerê Eşîra Cafê, belavbûna wan li Îran û Îraqê û şerên wan ku di dîrokê de kirine hatiye nivîsandin. Dr. Hesen Caf berhem di sala 1995an de li Bexdayê çap kiriye.

**Encam**

Her çiqas Kurd ji dewletbûnê bêpar bin jî di derbarê 'Dîroka Kurdan' de him bi zimanê xwe him jî bi zimanên din ewçend berhem nivîsandine. Ev yek hêjayî vegotinê ye. Ligel berhemên ku gihîştine rojame yên tenê navên wan tên zanîn jî hene. Her wiha berhemên di şer û bobelatan de winda bûne jî hene. Di nivîsa bê de dê ji Mihemed Emîn Zekî Beg û 'Di Dîroka Kurdan de Serdema Modern' de agahî bên dayîn.

## Di weşanên demkî de 'Dîroka Kurdan'

Rojnameya Teavun û Terakki ya Kurd ku ji aliyê Cemiyeta Teavun û Terakki ya Kurdan ve hatiye derxistin û 9 nushayên wê gihîştine roja me û di hejmara 17. Zilhicce 1326, Cum'airtesi, 27 Kânûn-ı evvel 1324, No:6s.50 î de bi awayekî vekirî tê gotin ku Şêx Evdirehmanê Axtepeyî bi zimanê Kurdî dîroka Kurdî dinivîsîne û nehatiye gotin bê ka bidawî aniye an na.

Di beyannameya kovara Jînê (Cemiyeta Hêvî ya Xwendekarên Kurd 1912) de tê gotin ku 'Divê Dîroka Kurdan bê Tomarkirin' Di hejmarên din ên Hêvî de Beyanneme hinekî din jî berfirehtir dibe û tê gotin ku 'Divê Dîroka Kurd û Kurdistanê bê avakirin'

Dîsa di kovara Rojî-Kurd de ku bi navê M.X nivîseke bi sernavê 'Ziman' hatiye nivîsandin û tê de wiha dibêje 'Kurd îro muhatacê çi ne, em ewan bêjin' di berdewamiya nivîsê de bi 10 xalan balê dikişîne ser Dîroka Kurdan. Dibêje divê Dîroka Kurdan bê nivîsandin.

## Târixî Erdelan:

Ji aliyê Mah Şeref Xanim Kurdistanî (1804-1847) ve hatiye nivîsandin. Şeref Xanimê, ji gotinên ku bavê wê û mêrê wê vegotine bi navê 'Dîroka Mîrîtiya Erdelan' nivîsiye. Di pirtûkê de ji damezirandina Erdelan heta hilweşandina Mîrîtiyê, nêzîkî hezar sal hatiye nivîsandin. Berhem di sala 1920an de ji aliyê Nasir Azadpûr ve li Sinê hatiye çap kirin. Di sala 1990î de ji aliyê E.Î Vasîleva ve ji bo Rûsî hatiye wergerandin û weşandin.

Bîbliyografya:


- Abdulcebbar Kavarak; 'Berhemek Li Ser Eşîreta Caf 'Te'rîxa Caf'ya Kerîm Begê Fettah Begê Caf', Nûpelda, S:17-18, 2014, ss:57-9.
- Bahattin Demir; 'Devlet Destekli Kürtçe Eğitim Kürd Meşrutiyet Mektebi', Toplumsal Tarih, S:200, 2010, ss:73
- Dr. Kemal Mazhar Ahmed; 'Kürtlerde Tarih Tarihte Kadın', Çev:Abdullah Babek PIŞDERİ, Pêrî Yayınları, İstanbul-1997.
- Ercan Gumuş; 'Îbnu'l Ezraq û berhema wî 'Tarîx'ul Meyyafarîqîn û Amîd', Nûbihar, H:116/2011, Cild:15, Sal:19, ss:25-31.
- http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=10&ArticleNr=5769, ET:24/08/2017.
- http://www.timeturk.com/tr/2009/12/09/ilk-islam-kaynaklarinda-kurd-alfabesi.html, ET:19/8/2017.
- http://www.zehra.com.tr/tarihu-meyyafarikin-_h111362.html, ET:19/8/2017.
- İbnü'l-Emin Mahmud Kemal İnal; 'Son Asır Türk Şâirleri', Atatürk Kültür Merkezi Başkanlığı Yayınları, Ankara-1999, Cilt:1, Haz: Müjgân Cunbur, ss:653.
- Kadri Yıldırım; 'Şerefxan û Şerefnameya wî', Zend, H:8, 2008, rr:13-30.
- Mehmet Bayrak; 'Bilinen İlk Kürt Tarihi Eseri Tarihü'l-Devletü'l-Ekrad', Kürt Tarihi, S:22, 2016, ss:46-51.
- Mesûd Serfiraz; 'Bedirxanî Kardeşlerin İlk Dönem Eserleri ve Düşünce Yapısı', Kürt Tarihi, S:27, 2016, ss:28-33.
- Murad Celalî; 'Yaşamı ve Eserleriyle Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867)', Kürt Tarihi, S:27, 2016, ss:5-11.
- Mustafa Dehqan; 'A Kurdish Chronicle From Qum', Manuscripta Orientalia, Vol:17, No:2, December 2011, ss:43-5.
- Qedim kürd əlifbası, Dîplimat, No:28(139), ss:8-9.
- Rohat Alakom; 'Bir İzmir Lavanteni Auguste Jaba', Kürt Tarihi, S:11, 2014, ss:53-4.
- Rudaw, 'Destxeta Mîrîtiya Hekariyan Hat dîtin', H/S:93, 28 Nisan-2011, ss:8
- Ruken Çalıştıran; 'Dotmîra Wêjeya Kurdî Mestûre Kurdistanî', Nûbihar, Sal:19, Cild:15, H:117/2011, ss:33-5.
- Şakir Epozdemîr; 'Pîrtûka Salih Begê Şêrwî Hêjayê Xwendinê ye', Zend, H:14, 2010, rr:107-8.
- Xalid Sadînî; 'Hakkarî Mîrleri/Beylerinin Mîrnamesi', Kürt Tarihi, S:29, 2017, ss:22-7.

# Îran kartên dawiyê li dijî dewletbûna Kurdan bi kar tîne

ESKENDER CEIFERÎ

Referandûma serxwebûna Kurdistanê ya 25'ê Îlonê nêzîk dibe û Komara Îslamî hemû hewlên xwe ji bo paşxistina wê bi kar tîne. Jerusalem Online ku ajanseke Îsraîlî ye eşkere dike ku Komara Îslamî ya Îranê ji bona dijatiya referendûma serxwebûna Kurdistanê bûdceyeke mezin mezaxtiye û bi rêya Nûrî Malikî serokê Partiya Daweya Îslamî ya Iraqê hinek ji wê bûdceyê digihîne kampanyaya Nexêr ji bo serxwebûna Kurdistanê.

Mesûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê serdana Kerkûkê kir û ragihand, biryara birêvebirina referandûmê, biryara hemû xelkê Kurdistanê ye û wê xelkê Kerkûkê biryarê li ser vî bajarî bide.

Di hember de Behram Qasimî berdevkê Wezareta Derve ya Îranê bersiv da gotinên Barzanî û got: Em li dijî dewletbûna Kurdan in û hêvî dikin ku Hewlêr û Bexda di riya danûstandinê re bigihêjin encamên erênî.

Îran naxwaze Kerkûk tevlî referandûmê bibe

Eger Komara Îslamî nikare pêşiya serxwebûna Kurdistanê jî bigire, Kurdistaneke bêyî Kerkûkê dixwaze. Lê berpirsên Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê ku berê, Îranê hêvî dikir rê li ber dewletbûnê bigirin, li gor ku Îran dixwaze nalivin. Necmedîn Kerîm parêzgarê Kerkûkê ku ji berpirsên YNK ye teqezê dike ku wê di 25'ê Îlonê de referandûma serxwebûna Kurdistanê li parêzgeha Kerkûkê jî birêve biçe.

Pişt re Behram Qasimî berdevkê Wezareta Derve yê Îranê bi daxuyaniyeke nivîskî, biryara Encûmena Waltiya Kerkûkê ya ku Kerkûk jî beşdarî referendûma serxwebûna Kurdistanê dibe, bi binpêkirina yekîtiya axa Iraqê binav kir.



Îsraîl jî ku Îran wê weke mezintirîn dijminê xwe dibîne, piştevaniya serxwebûna Kurdan dike. Benjamin Netanyahu serokwezîrê Îsraîlê ragihand: Dewleta wî piştgiryê dide damezirandina dewleta Kurdistanê.

Biryara Îsraîlê, Komara Îslamî ditirsîne

Îsraîl jî ku Îran, wê weke mezintirîn dijminê xwe dibîne, piştevaniya serxwebûna Kurdan dike. Benjamin Netanyahu serokwezîrê Îsraîlê ragihand: Dewleta wî piştgiryê dide damezirandina dewleta Kurdistanê.

Beriya niha jî Ayelet Shaked wezîra Dadê ya Îsraîlê di konferanseke taybet bi rûbirûbûna terorê de li Til Avivê dabû xuyakirin ku Îsraîl, piştevaniya damezirandina dewleta Kurdistanê dike.

John Bolton nûnerê berê yê Amrîkayê di Netewên Yekbûyî de jî dibêje, Encamdana referandûmê karekî baş e û pêwîst e DYA jî li serxwebûna Kurdistanê mikur bê.

Îran herwisa hewl dide dijberên serxwebûnê di Parlamentoya Iraqê de jî hevgirtî bike. Di civîna dawiyê ya parlamentoya Iraqê de aliyên dijber ên referandûmê, ew pirs avêtin dengdanê û nehiştin perlamanter nerînên xwe li ser vê mijarê bidin xuyakirin. Di encamê de bi piraniya dengan, referandûma serxwebûna Kurdistanê hat redkirin.

## Îran ji bo paşxistina referandûmê her karekî dike

Muhsin Rizayî sekreterê giştî yê Encumena Destnîşankirina Berjewendiyên Komara Îslamî ya Îranê jî ragihand ku ew li dijî proseya referandûma serxwebûna Kurdistanê ne û bi hêvî ne ku referandûm were paşxistin. Teqez jî kir ku ew di vê baweriyê de ne ku wê referandûma Kurdistanê karvedan û encamên xirab li navçeyê li pey xwe bîne.

Piştî ku Elî Dayînî serokê Encumena Parêzgeha Diyaleyê pêkanîna referandûmê li sînorên rêveberiya vê parêzgehê red kir, medyaya Îranî girîngiyeke taybet da mijarê lê Hoşyar Îsmaîl endamê Encumena Parêzgeha Diyaleyê ji lîsteya Hevpeymaniya Biratî û Bihevrejiyana Kurdistanî, dibêje li gor yasayê, encumenên bajarokan serbixwe ne û dikarin bixwe li ser çarenivîsa xwe deng bidin û Encumena Parêzgehê nikare li dewsa wan biryarê bide.

Tevî hewlên Îranê ji bo paşxistina dema referandûmê û poşmankirina Kurdan ji serxwebûnê, partiyên Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê piştevaniya serxwebûnê kirine û li Bakur jî Însiyatîfa Referanduma Başûrê Kurdistanê pêk hatiye.




# Bi hezaran mamosteyên Kurd ji kar têne dûrxistin

Wezareta Perwerdehiyê ya Îranê di biryarnameyekê de ku ji bo tevahiya rêveberiyên vê wezaretê li navçeyên cûda yên Îranê hatiye şandin, daxwaz kiriye êdî tenê ew kesên ku dikarin weke zimanê dayîkê bi Farisî bipeyivin eger belgeyên pêwîst ên di vî warî de hebin weke mamoste bêne wergirtin.

Tişta balkêş ev e ku heya niha jî ew biryarname li ser malpera fermî ya vê wezaretê derneketiye lê belê malperên nêzîkî Sipaya Pasdaran ku ji bo cara yekemîn biryarname belav kirin, bûne parêzvanên wê û gotar û raportan li hemberî rexnegirên biryarnameyê belav dikin.

Eger biryarname bê bicîkirin, bi deh hezaran mamosteyên li Kurdistanê ji kar têne dûrxistin. Ne tenê li Kurdistanê, Belûçistan, Azerbaycan û Luristan û herwisa di nav Erebên Îranê de jî gelek mamoste hene ku nikarin zimanê Farisî weke zimanê dayîkê baş bipeyivin.

**Binpêkirina yasayên navdewletî li Îranê didome**

Ev biryarname, gelek ji xalên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan binpê dike ku Îranê jî li ser wê îmze kiriye. Li gor xala duyemîn ya vê Danezanê, herkes bêyî ku rastî cudahiya ji ber nîjad, reng, zayend, ziman, ol, baweriya siyasî yan jî yeke din jêbûna neteweyî an jî civakî, saman û serwet, zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwergirtina ji hemû maf û azadiyan e ku di vê Danezanê de hatine ragihandin. Her wiha ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî ya navneteweyî di navbera mirovan de cudayî nayê kirin; te divê ev welat an herêm serbixwe an jî te divê ne xweser an jî te divê ne xweser an jî di bin rajêriya tahdîda serweriyekê de be.

Di biryarnameyê de gelek xalên din jî hene ku rexnegirên wan jî dengên xwe bilind dikin. Lê ya girîng ev e ku çawan mijara ziman, li cem wan xalan hatine destnîşankirin. Vê wezaretê, cigarekêş, nexweşên felec angu astengdar û kesên ku Farisî baş nizanin danîne cem hev û ragihandiye êdî kesê ku ji van tiştan dûr nebe nikare bibe mamoate.

**Dewlet girîngiyê nade asta zanîna mamosteyan**

Hin ji rexnegirên vê biryarnameyê dibêjin gelo mirov bixwe dikarin bi xwastina xwe ji nexweşiyan dûr bin? Çima Wezareta Perwerde daxwazê dike kesê ku dixwaze bibe mamoste, ji van tiştan bi dûr be?!

Seîd Pêwendî ku civaknas e, di vê derbarê de dibêje ev biryarname dikare valahiyeke mezin di nav refên wezareta Perwerde de çê bike ji ber ku êdî asta zanyariyan nabe îdeala wergirtina mamosteyên nû. Eger ev plan bê bicîkirin, dîroka Îranê rastî şaştî û binpêkariyeke mezin tê. Ne xuya ye gelo her yek ji nexweşiyên weke gurçikan, bi çi rengî dikarin bandorê bikin ser proseya xwendinê. Her wisa ji bo jinan jî hatiye teqezkirin ku nabe mûyên serûçavên wan zêde bin lê dîsa jî nayê zanîn ka gelo eger mûyên serûçavan zêde bin lê belgeyên wan ên di vî warî de pêwîst bin, çima proseya xwandinê bi hebûna mûyên zêde di serûçavên jinan de asteng dibe?!

Umêd Mêmariyan rojnamevanekî serbixwe ye û di derbarê redkirina daxwaza mamostetiya felec û kêmendaman de dibêje heke Stêfan Hawkîngz fîzîkzanê naskirî li Îranê bûya, nedikarî ji fîltera mamostetiya wezareta Perwerde derbas bibe. Bi vî rengî wê mejiyê gelek ji zanayên Îranî ji civakê bêpar bimîne û kesê ku astengdar nebe, derfeta pêşketinê dibîne.



## "Tirkiye sînorên xwe nagire û pêwendiyên xwe qut nake"

Mihemed Emînî çalakvanê mafên mirovan jî dijatiya xwe li hemberî vê biryarnameyê tîne ziman û dibêje bandora rewşa tendirustiyê û çawaniya axaftina bi Farisî qet bandorê nakin ser proseya xwendinê ji ber ku ne kes li gor xwastin û heza xwe nexweş dibe û ne jî cudahiyek di navbera fêrkariya mamosteyekî Faris û yekî ne Faris de heye. Ev biryarname, mafên welatîbûnê binpê dike û eger serokkomar û kabîneya wî rê li ber bicîkirina vê negirin, divê dadgeheke serbixwe biryarê li ser mijarê bide. Ji ber ku bi hezaran kes bêyî hebûna ti sedemeke mentiqî ji pêşketinê bêpar dibin û ji civakê jî têne dûrxistin.

Eger biryarname bê bicîkirin, bi rengekî yasayî, welatiyên ne Faris ji beşdarî di civakê de bêpar dibin û li ser vê mijarê, Elî Qazîzade rojnamevanê nêzîkî dewletê ku bixwe Kurd e jî, dide xuyakirin eger pêşiya biryarnameyê neyê girtin, Rûhanî û reformxwaz, hemû alîgirên xwe ji dest didin.

Hesen Rûhanî berî ku ji bo cara duyem bibe serokkomar, gelaleyek ji bo parastina mafên welatiyan belav kir ku heya niha jî ti yek ji xalên wê nehatine bicîkirin. Piştî derketina vê biryarnameya Wezareta Perwerde, daxwaz ji Şehînduxt Molawêrdî alîkara serokkomar di warê mafên welatiyan de hatiye kirin ku ji bo rêgirtin ji bicîkirina vê biryarnameyê tev bigerin. Dehan welatiyan ji wê re di Twitterê de nivîsîne da ku hewla xwe bide. Wê di bersiva wan de ragihandiye ku ew rast dibêjin û wê kabîneya wan, mijarê bişopîne û encaman ragihîne.

Çend rojan beriya niha Mihemed Bethayî di kabîneya 12mîn ya dewleta Îranê de bû wezîrê Perwerde û demlidest ev biryarname derxist.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Elî Araste çalakvanê Kurd, ji aliyê dadgeha Îranê ve li parêzgeha Ormiyê bi salek û nîv girtîgehê hate cezakirin. Tometa wî alîkariya endamên partiyeke Kurdî bûye. Ew xwendekarê Kurd, pênc mehan beriya niha ji aliyê hêzên Îstixbarata Îranê ve hate girtin. Elî Araste xelkê gundê Xurşt yê Şinoyê ye û jê re hatiye ragihandin ku êdî nikare berdewamiyê bide xwendina xwe. Ew piştî sê mehan lêpirsînê, ji girtîgeha Îstixbaratê ji bo girtîgeha Ormiyê hatibû veguhestin.

Hêzên Sipaya Pasdaran li bajarê Gîlanxerb ê Kirmaşanê çalakvanekî Kurd bi navê Resûl Seyadî Meniş binçav kirin. Tometa wî, organîzekirina wan xwepêşandanan bûye ku ji bo piştevaniya kolberan hatine encamdan. Resûl, xelkê gundê Seyadan e û malbata wî serî li saziyên ewlehî û dadê yên vê parêzgehê dane lê ji wan re nehatiye ragihandin ku ew li ku derê tê ragirtin. Wî di dema girtinê de dabû xuyakirin ku ti pêwendiya wî bi van xwepêşandanan re tine ye.

Ev zêdetirî mehekê ye ku pênc welatiyên bajarê Sine di bin lêpirsînê de ne. Sîrwan Rustemî kurê Elîmihemed, Wekîl Rustemî kurê Mihemedmîrza, Xudarehm Elîpûr kurê Mihemed, Hatem Elîpûr kurê Mihemed û Şueyb Mihemedî kurê Ceifer, mehekê beriya niha li gundê Mîraw ê navçeya Jaweroyê ji aliyê hêzên ewlehî yên bajarê Sine ve hatin girtin. Tometa wan endametî di partiyeke Kurdî de bûye. Heya niha nehatiye zanîn ka gelo ew li ku derê têne ragirtin.

Pênc welatiyên bajarê Mehabadê ji aliyê hêzên ewlehî yên Îranê ve bi tometa hewldan ji bo xapandina raya giştî di riya li darxistina meşên girseyî de hatin girtin. Yek ji wan pênc kesan, Kubra Xalindî çalakvana jin e ku li meydana Çarçira hatiye girtin. Herwisa hêzên Îstixbarata Îranê piştî girtina van pênc kesan, çûne malên wan û dest danîne ser hin kelûpelên wan. Ji malbatên van pênc çalakvanên Mehabadî re hatiye ragihandin ku nabe ti zanyariyekê di derbarê rewşa wan de bidin medyayê.

Li bajarê Bane, hin xwepêşandan hatin li darxistin ku armanc ji wan piştevaniya kolberan û şermezarkirina kuştina wan ji aliyê hêzên sersînor ve bû. Di encamê de pevçûn di navbera xwepêşanderan û hêzên ewlehî de çê bû û herî kêm 25 kes hatin girtin. Tometa wan, organîzekirina xwepêşandanan bû. Piştî çend rojan, hin ji van kesan bi danîna kefaletê heya destnîşankirina dema dadgehê hatin berdan. Herî kêm çar kes bi navên Hejîr Ibn Ebasî, Rizgar Rifaî, Eyûb Mewlûdî û Kurdo Husênpûr heya niha jî di bin lêpirsînê de ne.

Li bajarê Îlamê welatiyekî Kurd bi tometa kuştina kesekî hate darvekirin. Navê wî Eqîl Nasirî bû ku nêzîkî pênc salan beriya niha di pevçûnekê de hate girtin ku tê de kesekî bi navê Elî jiyana xwe ji dest da. Herwisa Xelîl Nasirî bi tometa alîkariya birayê xwe di kuştina wî kesî de bi hebsa hertimî hate cezakirin. Ew niha di girtîgeha Îlamê de ye.

Du heftiyan beriya niha sê welatiyên bajarê Kamyaranê bi navên Hîwa Nedîmî kurê Mihemedkerîm, Kiyûmers Nedîmî kurê Marif û Iqbal Qubadî kurê Ehmed ji aliyê hêzên ewlehî ve bi tometa endametî di partiyeke Kurdî de hatin girtin. Ev sê kes di dema girtinê de rastî lêdanê hatine û girtina wan, bêyî hebûna derfeta yasayî ji aliyê dadgehê ve bûye.

Welatiyek li girtîgeha Parsîlon a Xuremabadê hate darvekirin. Navê wî Mihemed Mîrzayî ye ku bi tometa kuştinê, ji aliyê dadgeha Îranê ve bi darvekirinê hatibû cezakirin.



Li bajarê Bane, hin xwepêşandan hatin li darxistin ku armanc ji wan piştevaniya kolberan û şermezarkirina kuştina wan ji aliyê hêzên sersînor ve bû. Di encamê de pevçûn di navbera xwepêşanderan û hêzên ewlehî de çêbûn û herî kêm 25 kes hatin girtin.

Welatiyekî Kurd li bajarê Islamabadxerb li parêzgeha Kirmaşanê bi tometa kuştinê hate darvekirin. Ew welatiyê Kurd, tometbar bû ku çar mehan beriya niha keçek û dayîka wê kuştiye. Piştî heyamekê ew welatiyê 27 salî hate girtin û di bin navê tolhildanê de ji aliyê dadgehê ve bi darvekirinê hatibû cezakirin.

Ebûbekr Selîmî girtiyê Kurd, ev deh sal in ku di girtîgeha Ormiyê de libenda darvekirinê ye. Ebûbekr ku bixwe xelkê navçeya Rebetê ya Serdeştê ye, bi kuştina kesekî tometbar bûye. Malbata kesê ku hatiye kuştin, ragihandiye ku eger pereyê xwîna kurê wan bide, ewê îznê bidin were berdan. Lê malbata Ebûbekr Selîmî ragihandiye ku 500 milyon Tumen pere ji wan tê xwastin û ew nikarin vî pereyî amade bikin. Tê gotin eger di dema çend mehan de ev pere neyê dayîn, dadgeha Îranê wê Ebûbekr îdam bike.

Welatiyekî Kurd li Zahidanê bi tometên siyasî bi darvekirinê hate cezakirin. Ebûbekr Rustemî kurê Mihenedteqî xelkê bajarê Kirmaşanê di bin navê şerê li dijî Xwedê de bi darvekirinê hatiye mehkûmkirin. Ev du sal in ku Ebûbekr li ser sînorê Pakistanê ji aliyê hin çekdarên girûpeke Pakistanî ya nêzîkî Sipaya Pasdaran ve hatiye girtin. Wê demê sê mehan ji aliyê Sipaya Pasdaran û Îstixbarata Îranê ve rastî îşkence û lêpirsînê hatibû. Ebûbekr Rustemî 23 salî ye. Wî xwastibû ji Pakistanê derbasî welatekî din bibe û here Ewropa lê Komara Îslamî dibêje wî li dijî Sipaya Pasdaran şer kiriye.

Efşîn Husênpenahî piştî sê mehan girtin û lêpirsînê, bi tometa endametî di partiyeke Kurdî de hate dadgehîkirin. Wî welatiyê Kurd li dadgehê ragihandiye ku hêzên Îstixbarata Îranê û Sipaya Pasdaran, tenê ji ber ku birayê wî pêşmergeyê partiyeke Kurdî bûye, wî tometbar dikin. Herwisa ev sê meh in ku birayê wî bi navê Ramîn Husênpenahî li Sine hatiye girtin û nayê zanîn ku ew li ku derê tê ragirtin. Ramîn, pêşmergeyê partiyeke Kurdî bû ku bi tîmeke pêşmergeyan re çûbûne Sine. Hin ji wan hatin şehîdkirin û ew jî hate girtin.

Derhêner Mihemed Porgebol:

# Şanoya Kurdî di lêgerîna sazîbûnê de ye




BILAL ADLIĞ

> "Ji bo ku em nasnameyeke azad bixin nav şanoya Kurdî ev 16 sal e em bêyî sazî xebatan dikin. Şanoya Kurdî di van salên dawî de gelekî pêş ketiye. Şanoya Kurdî bi avakirina nasnameyeke netewî re ji şanoya Faris û Tirkan jî feyz digire. Ev yek jî şanoya Kurdî rengîntir dike."

Şanoya Araf yek ji kevintirîn şanoya Bakur e. Di sala 2001an de li jêrzemîna maleke navçeya Ziyaretê ya Sêrtê bêyî destûr hat avakirin. Çend salan bêyî destûr xebata xwe didomîne û di sala 2004an de piştî çendîn xwendekar û şagirtên şanoyê digihijîne berê xwe dide navenda Sêrtê û li Navenda Botan a Çandî xebatên xwe dike. Li vir jî 5 salan xebatên xwe didomîne û gelek şagirt û lîstikvanên şanoyê digihîne. Şanoya Arafê di sala 2009an de berê xwe dide Batmanê û mayînde li vir dest bi xebatên xwe dike. Li Batmanê ji sala 2009an ve xebatên xwe didomîne. Araf perwerdehiya şano, reqs, drama û lîstikvaniyê dide. Ji zêdetirî 250 xwendekar gihandiye îro. Şanoya Arafê ji Azîz Nesîn bigirin ta Sheakspeaker, Gogol gelek çîrok û roman kirine şano û lîstiye. Şanoya Arafê niha jî pirtûka nivîskarê gewre yê ku li cîhanê nav daye, Lênûsa Bîranînên Dînekî ya Gogol bi Kurdî amade kiriye û ji 50 carî zaftir lîstiye. Derhênerê lîstikê Mihemed Porgebol, Derhênerê Hunerê Murat Korkmaz û lîstikvan jî Tuncay Özel e. Şanoya Arafê ji bo lîstikê derketiye gerra Tirkiyeyê û bajarên Kurdan. Em bi derhênerê lîstika Lênûsa Bîranînên Dînekî Mihemed Porgebol re li ser Şanoya Arafê, xebat û gerra wan axivîn.

**"Em ji 50 şanoyan zêdetir lîstine"**

Derhêner Mihemed Porgebol dibêje, 'Em bi armanca avakirina nasnameyeke netewî ya şanoya Kurdî tevdigerin û xebatên xwe dikin' û wiha didomîne: "Herî dawî jî me lîstîka Gogol a bi navê Lênûsa Bîranînên Dînekî bi Kurdî şîrove kir. Heta niha ji 50î carî zaftir hatiye lîstin. Me ji Batmanê dest bi vê gerrê kir. Piştî Batmanê em derbasî Diyarbekirê bûn û em di 13 û 14ê vê mehê li Stenbolê bûn. Lîstikvanê vê lîstikê Tuncay Özel e. Em ne tenê koma şanoyê ne. Her wiha em reqsa modern jî dikin. Cara yekem hunermendê gewre yê Japon lîst. Derhênerê Giştî yê Hunerê Murat Korkmaz niha reqsa Takayoshi Sakabe ya bi navê Butoh dilîze. Di vê gerra me de ew reqs jî dê derkeve pêşberî bîneran."

**"Kurd ji ber ku zehmetiya aborî dikişînin çanda şanoyê rûneniştiye"**

Kurdên li bajarên Tirkiyeyê dijîn ji ber feqîrî û neçariyê berê xwe dane wan welatan. Ji ber vê yekê jî bi taybetî ji bo debara xwe bikin dixebitin. Pir şans nabînin ku bi karên hunerî re elaqeder bibin. Lê belê bi giştî em ji daxwaza gel ya ji bo temaşekirina lîstikên me razî ne. Ev daxwaz têra pêşketin û domandina hunera gelekî neke jî em ji bînerên xwe qayil in. Elbet ev daxwaz ne ya gelekî ku ji aliyê dagirkeran ve hatiye asîmîlekirin, kuştin û qetilkirin e, lê belê dîsa jî li gel hemû ne xweşiyan nêrîneke baş heye, li hember xebatên çand û hunerê. Li bajarên Tirkiyeyê bînerên Tirk jî bala xwe didin ser xebatên me û tên temaşe dikin.

**"Şanoya Arafê kevneşopiyek e ku heta Cannesê çûye"**

Mihemed Porgebol çîroka xebatên nû û yên bidawî hatine ji me re wiha vedibêje: "Şanoya Arafê ji Kurdistanê heta Festîvala Fîlman a Cannesê çû. Niha em nivîsên Kafka cara yekem bi Kurdî amade dikin. Berhema Sadiq Hidayet a Kundê Kor amade ye. Sala pêşiya me em ê bilîzin. Xebata me ya ku tenê bi derfetên xwe yên bê navber ji sala 2001an heta îro ya Şanoya Arafê kir ku kevneşopiyek ava bibe. Bi rastî jî Şanoya Arafê êdî di nav şanogeriya Kurdî de bûye îdolek. Mînak lîstika me ya dawî Lênûsa Bîranînên Dînekî ji 50 carî zaftir hat lîstin li pêşberî bîneran. Niha jî em derketin gerrekê ku lîstik li Stenbol, Enqere, Diyarbekir û Eskişehirê tê lîstin."

**"Em dixwazin jiyana kesên ku di dîroka Kurdan de xwedî cih in bilîzin"**

Mihemed di derbarê proje û şanoya Kurdî de wiha diaxive: "Em dixwazin jiyan û doza pakrewanên Kurdistanê bilîzin. Derwêşê Evdî, Dayîka Niştîman ku di avakirina Komara Kurdistanê de xwedî roleke mezin bû amade ne. Lê belê ji bo em van projeyan bînin ser dike, lîstikvan û budçeyeke mezin divê. Lê mixabin ev derfet niha tune ne. Nabe em heqê şanoya Kurdî jî bixwin. Şanoyên Bajêr ên Diyarbekir û Batmanê karên gelek baş kirin. Lîstikên li seranserê cîhanê navdar lîstin. Shakespeare lîstin. Di vê mijarê de şanoya Kurdî têra xwe dewlemend e."

**"Şanoya Kurdî di van salên dawî de bû xwedî nasname"**

"Ji bo nasnameyeke azad li şanoya Kurdî ava bibe ev 10 sal e şanoya Kurdî xebatên baş dike. Şanoya Kurdî di van salên dawî de gelekî pêş ketiye. Şanoya Kurdî bi avakirina nasnameyeke netewî re ji şanoya Faris û Tirkan jî û ji ya cîhanê weke Almanya, Hollanda û Norweçê jî feyz digire. Ev yek jî şanoya Kurdî rengîntir dike. Me çend caran serî li festîval û mihrîcanên Herêma Kurdistanê jî xist lê ji ber brûkrasiya hê rûneniştî bi giştî jî ev serlêdanên me bê bersiv man. Em şanoya Kurdî ne û elbet armanca me ew e ku em li seranserê Kurdistanê lîstikên xwe bibin pêşberî bîneran. Ev tişt daxwaza hemû şanogeran e ku şanoya xwe bi zimanê xwe bibin pêşberî bînerên cîhanê. Em jî bi vê armancê ne. Eger derfet çê bibe em ê li Ewropa jî lîstikên xwe bilîzin."

---

Hunermendê Bakûrî Sebahattin Yıldız:

# 25ê Îlonê dê weke destpêka serxwebûnê bê pîroz kirin

JÎN MAZÎ



Sebahattin Yıldız an jî Sebahattin Xoce. Hunermendê Kurd, deng û awazê xwe ji bayê serhedê girtiye. Demeke dirêj e li Diyarbekirê dijî. Him mamostetiyê dike him jî hunermend e. Ji Mihemed Şêxo bigirin heta Tehsîn Taha stranên wan bi şêwazeke cûda distrê. Heta niha 4 albûmên wî derketine. Sebahattin Yıldız yek ji wan hunermandan e ku piştgiriya referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê dike. Piştgiriya xwe jî bi hunera xwe pêşkeş dike. Hunermendê Kurd ê Bakûrî Sebahattin Yıldız ji bo referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê straneke bi şêwazeke folklorîk bi navê "Pîroz Be" amade kiriye. Yıldız dibêje "Di pêşerojê de 25 îlonê belkî bibe cejna Kurdan û di wê cejnê de jî em ê stranên şahiyan bistrên." Sebahattin Yıldız di derbarê referandûma serxwebûnê û fikrên xwe yên li ser vê mijarê ji Heftenameya Basê re vegotin.

**"Serxwebûn weke şîrê dê helal e û mafê Kurdan e"**

Hunermend Sebahattin Yıldız ramanên xwe yên di derbarê referandûma serxwebûnê de wiha tîne ziman: "Biryara referandûma serxwebûna Kurdistanê biryareke di cî de ye. Di dinyayê de milletên ku nifûsa wan di bin milyonekê re gelek dewlet hene. Hinek dewlet hene 50 an 100 hezar in. Lê Kurd li ser axa xwe kêmtirîn 40 milyon kes in. Li Kurdistanê tenê Kurd najîn, Asûrî, Keldanî kêmnetewên din jî hene. Em bi tevahî difikirin, Axeke Kurdistanê yê berfireh heye. Ne di destê wan de ye, di şerê yekemîn yê cîhanê de kirine çar perçe, bêyî îradeya wan mafê wan hatiye binpêkirin, heta niha jî wiha domiyaye. Sedsala 21emîn firsendeke mezin da Kurdan. Kurd divê vê fersendê ji dest xwe nerevînin û bicîh bînin. Rêbaza Serok Mesûd Barzanî ji bo serxwebûnê ye, her kî di vê rêbazê de biçe ez jê re rêzdar im. Serxwebûn weke şîrê dê helal û mafê Kurdan e, em dixwazin Kurd jî di nav netew û dewletên cîhanê de cîhê xwe bigirin. Ji ber wê ev biryara referandûmê biryareke girîng e."

**"Dibe ku di pêşerojê de 25 îlonê weke destpêka serxwebûnê bê pîrozkirin"**

Hunermed Yıldız li ser strana ku ji bo referandûmê amade kiriye wiha diaxive: "Wek hûn jî dizanin newroz bo Kurdan rojeke pîroz e. Li her çar perçeyan jî tê pîroz kirin, li ser newrozê gelek stran hene ji ber ku cejna me ye. Ez fikirîm 25 îlonê belkî tenê navê wê referandûm be lê bi fikra min ez dibêjim ev roj wê rêya serxwebûnê ji bo me veke. Dibe ku di pêşerojê de 25 îlonê weke destpêka serxwebûnê, weke cejnekê bê pîroz kirin. Dema dewleta me serbixwe bû emê bibêjin bila 25 îlonê bibe cejneke netewî ya Kurdan ji ber wê min got ji bo 25 îlonê ez stranekê amade bikim. Wê rojê wê gel şahiyê bike, kêfê bike, govendê bigerîne. Min jî straneke wiha amade kir û min pêşkeşî gel kir. Hêvî dikim ku bê ecibandin, straneke şêwaza wê folklorik e û gotin aîdî min in."

**"Ev cejn ne tenê ya Başûr e, cejna her çar perçeyên Kurdistanê ye"**

Yıldız dibêje heger derfeta min hebe ezê biçim li Başûr strana xwe bibêjim: "Ez pir dixwazim di referandûma serxwebûnê de biçim Başûr, ez niha mamostetiya dibistaneke taybet dikim ger ku ez derfetê bibînim û destûrê bixwazim ez jî dixwazim wê rojê li wir bim, heger derfet hebe ez dixwazim strana xwe jî li wir bistrêm. Kurdistan yek perçe bû ne bi îrada wan bi îrada dewletên cîhanê bi îrada dewletên din kirin çar perçe ji ber ku ev sînorên ku hatine xêzkirin ne sînorên xwezayî ne. Ji ber wê serxwebûna Başûr wê bandoreke gelekî mezin li ser her sê perçeyên din bike. Ev strana ku min amade kiriye ne tenê ji bo gelê başûr min gotiye ji bo hemu gelê Kurdistanê ye. Ev cejn ne tenê ya Başûr e, cejna her çar perçeyên Kurdistanê ye û cejna hemû Kurdên ku li derveyî Kurdistanê dijîn e. Di destpêkê ev serxwebûn ya başûr e lê ev destpêk û destkeftî yê me hemû Kurdan e. Heta niha min nebîhistiye li Bakûrê Kurdistanê ji bo referandûma serxwebûnê stran hatine amade kirin. 11 îlonê min strana ku bo referandûma serxwebûnê amade kiriye li Youtube bar kir, berî min kesî lê bar kiribe nizanim.

**"Dewletbûn dê muzîk, wêje û çanda Kurdî pêş ve bibe"**

Sebahattin Yıldız bandora hunerê li ser mijarên siyasî û civakî wiha dinirxîne: "Bandora hunerê li ser mijarên siyasî û civakî girîng e. Di salên '70î de Şivan Perwer bi stranên xwe Kurd şiyar kirin, kesekî ku nizanîbû Kurd û Kurdayetî çi ye bi van stranan şiyar bû. Dema gel stranên vî awayî guhdar dike yê ku kelecana wan tunebe jî li ber van stranan wê bifikirin wê bibêjin 'rast e ev cejna me ye, rojeke pîroz e.' Bandora hunerê gelekî zêde ye, ne tenê muzîk; cûreyên din ê hunerê jî, weke wêje, helbest, wênesazî. Huner û zimanê Kurdî bi sedsalan e ku, ez Bakûr mînak didim, qedexe bû, hingî Komara Tirkiye ava bû ziman, çand û muzîka Kurdî hemû qedexe bû. Bi qedexekirinê jî dîsa Kurdan zimanê xwe çanda xwe û muzîka xwe parast. Lê gelek tişt ji çanda me û muzîka me dizîn, gotinên Tirkî lê kirin, gotin stranên vir an wir e lê bi Tirkî ye. Di nav bêderfetbûnê de hunermendê Kurd dîsa gelek tişt anîn holê, lê dema dewlet hebe dê saziyên hunerê hebin ji aliyê dewletê dê bên fînansekirin. Ji ber ku divê bi her awayî xwedî li huner, çand, ziman û muzîkê derkevin. Dewletbûn dê muzîk, wêje, çanda Kurdî pêş ve bibe. Her wiha di nav dewletên cîhanê de wê bê naskirin.

**"Hunermendên Kurd di pêvajoya referandûmê de sist bûn"**

Hunermend Yıldız gazindan ji hunermendên Kurd dike ku di pêvajoya referandûmê de dengekî xurt dernexistine û wiha berdewam dike: "Em niha hunera xwe, xebata xwe bi xwe dikin û tenê gelê Kurd guhdar dike. Ji ber ku temsiliyeta me di nav dewletên cîhanê de tune em nikarin têkevin pêşbirkên muzîkê, an nikarin tevlî bernameyan bibin. Lê dema dewlet hebe dê bi awayekî fermî rê li ber me vebe. Ji ber ku demeke dirêj e ez di nav muzîka Kurdî de me, muzîka Kurdî gelekî dewlemend e, ez di wê baweriyê de me ku hîn gelek muzîkên Kurdî derneketine holê. Gelek muzîkên Kurdî yên resen hene. Daxwaza min ji hunermendê Kurd ev e ku bila ji bo referandûma serxwebûnê destê xwe têxin bin kevir. Dema ez bala xwe didim hunermendê Kurd di vê pêvajoyê de gelekî sist in, min wiha dît. Ji çi vedikişin nizanim. Min dixwest kelecaneke mezin di hemû hunermendên Kurd re hebe. Ji bo vê referandûmê konser çêbikirana. Tiştên ku ez dikim hemûyan bi derfetên xwe pêk tînim. Lê dema saziyek hebe û hunermend werin cem hevûdu dê tiştên baştir derkevin."

---



FIRAT CEWERÎ

## Te dît bê çi hat serê min Firat!

Mehmed Uzun ketibû xefka nexweşiyeke xedar. Gava ew li Tirkiyeyê bû nexweşiyê lê giran kiribû, li başûrê Kurdistanê nexweşiya wî girantir bûbû. Piştî demekê nema ji ber nexweşiya xwe debar kir û ket nexweşxanê. Lê bi kêf bû, xelata wî ya zêr ya ku ji destê wezîrê kulturê yê Kurdistanê girtibû li ser sîngê bû. Ew ji bo xebatên xwe ji aliyê hikûmeta xwe ve hatibû xelatkirin. Ev hiseke xweş e. Mirov ji aliyê gel û miletên din ve çiqasî were pesinandin û xelatkirin jî, dîsa bi qasî xelatkirina milet û welatê mirov, mirov kêfxweş nake. Mehmed Uzun bi wê kêfxweşiyê bi kezebreşiyekê ketibû û xwe spartibû bextê doktorên Tirkiyeyê. Kêfa wî li cih bû, lê bêhal bû. Digel wê jî nedixwest li xwe bide der. Gava min ji Swêdê telefonî wî dikir, dengê wî melûl bûbû, ne wek ê Mehmed Uzun bû. Dost û hevalên wî bi dengê wî ê di telefonê de dizanin. Dengekî geş bû, bilind derdiket, bi coş bû; tavilê hêviyekê dida mirov. Nexweşiya kambax coşiya dengê wî temirandibû, lê wî bi xwe cehd dida ku geş bimîne. Ji bo geşmayîna xwe ya berdewam di destpêka bihara wê salê de vegeriya Swêdê. Me bawer nedikir nexweşiya wî cidî ye, wî jî nizanîbû nexweşiya wî bi wê cidîyetê bû. Gava li Stockholmê dîsa mecbûrî razandina li nexweşxanê bû, tirsek niqutî dilê min, lê piştî bi çend rojan ew tirs nema; ew emeliyat bûbû û doktoran ew ava li dor pişikê civiyabû kişandibûn. Şika tuberkulosê (weremê) kiribûn û tibabek derman dabûnê. Werema ku demekê nexweşiyeke bêderman bû, niha bûye nexweşiyeke ji rêzê. Ew tirsekê têxe dilê mirov jî, mirov dizane ew nikare serdestiyeke herheyî li mirov bike; qet nebe li Swêdê nikare. Me bi vê dizanîbû, lê me nizanîbû dijminekî xedar di hundirê wî de li hemberî hucreyên wî kozik vedane. Giraniya ku vê dawiyê li ser mabû, giraniya heban bû. Me wilo dizanîbû, baweriya wî jî ew bû. Wî ê demekê hebên giran bixwara û zora nexweşiya xwe bibira. Moralê wî li cih bû. Gava piştî emeliyata wî em bi malbatî li hev civiyan jî, ew bi kêf bû, taqeta peyvê hatibûyê û xweş dikir. Behsa aktîvîteyên wê biharê kir, ji konferansa li ser romanê ya ku wê li Hewlêrê li dar biketa peyv vekir û li ser rêwîtiya xwe ya Cizîrê rawestiya. Heke ew hingî neketa nav nivînan ew ê têketa nav xelkê. Wê keç û xortên welêt ji bo îmzeyekê kitêb dirêjî wî bikirana. Lê gava cara dudan wî bi giranî berê xwe da nexweşxanê û doktoran ew li nexweşxaneya Karolinskayê beşa Thoraxê razandin, şika nexweşiyeke giran li ba min peyda bû. Lê min dîsa nizanîbû. Me nizanîbû. Doktoran jî nizanîbûn. Gava piştî bi rojan û analîzên kûr, doktor li şopên kanserê rast hatin, digel xanima wî Zozanê, li ber textê wî rawestiyan û ew bi xebera reş hesandin. Gava gotina "kanser" ji devê doktoran derket, çokên Zozanê sist bûn û herikî erdê, lê Mehmed Uzun xurt bû, di ber dilê Zozanê da, jê re got:

– Zozan, xem nake, gelek hevalên min bi vê nexweşiyê ketine, ez ê zora wê bibim!

Piştî wê bi rojekê ez li nexweşxanê çûm seredana wî. Du behlîf li ber pala wî bûn û li ser piştê li ser textê xwe dirêjkirî bû. Gava çav li min ket, bişirî, ez jî pê re keniyam û ji bo hewa nexweşiyê jê bi dûr bixim, min bi henekî got:

–De bes e lo, rabe ser xwe, ev çi nexweşiya pîsik e te xwe ji ber avêtiye erdê? Cihê te ne nav nivînan e, lê meydan û hêwanên konferansan e.

Dîsa bişirî, serê xwe ber bi jêr ve hejand û bi bawerî,

–Ez ê rabim Firat, got, ez ê ji vê nexweşiyê xelas bibim.

Dûre ez dam ber pirsan. Li halê min pirsî, rewşa Kurdistanê meraq kir. Te digot qey yê nexweş ne ew, lê ez im. Rojekê piştî wê, gava ez çûm cem, êdî min nûçeya kansera wî bihîstibû. Ez û xezûrê wî Celal Uzun bi hev re bûn. Moralê wî dîsa li cih bû, lê yê min xerab bû. Girî ketibû qirika min, min bi zorê xwe girt, lê wî got: "Ez ê zora vê nexweşiyê bibim!"

Wî bawer dikir dermanê wî li dûrtir peyda dibe, bi wê nexweşiyê lêxist û çû Amerîkayê. Xanima wî Zozanê her li cem bû, hevalê wî yê zarotiyê Keya Îzol ji teniştê nediqetiya, birayê wî Mistefa li ber serê wî bû. Ji bo birêkirina Amerîkayê ez jî li balafirgehê bûm, Mehmed Uzunê wek çiyayekî bûbû mistek, nikarîbû li ser xwe rawestiya, di erebokê de bû. Ez li cem bûm, destê xwe dirêjî min kir, bi destê min girt û bi dengekî ne wek dengê Mehmed Uzun got:

–Te dît bê çi hat serê min Firat, ma min ev heq kiribû?

Na, Mehmed Uzun ev heq nekiribû. Ev mirina bêwext neheqiyeke mezin bû.

# Wan ji bo pêşketina turîzmê dixebite

DARA BANDINI



> Niha di bin deshilatdariya Odeya Bazirganiyê de qursên me yên Farisî û Kurdî hatine vekirin. Di navendên danûstandinê de kesên bi Farisî û Kurdî dizanin tên xebitandin. Ev yek jî pira di navbera geştiyar û bajêr de hêsantir dike.

Bajarê Wanê wek paytexta herêma Serhedê tê zanîn. Bi gol û hewayê xwe yê hênik gelekî bala geştiyaran dikişîne. Bilindahiya bajêr ji behrê 1700 metro ye. Ji ber vê yekê jî hewayê wê tim hênik û tenik e. Mirov havînan ji germê zivistanan jî ji sermaya wê aciz nabe. Bi vê taybetmendiya xwe jî bala geştiyarên Rojhilat, Îran û Herêma Kurdistanê dikişîne. Bi taybetî jî di van salên dawî de gelek geştiyarên Îran û Rojhilatî berê xwe didin Wanê. Li Wanê him dikevin behrê û him jî danûstandinan dikin. Di derbarê geştiyar, turîzm û karûberên ji bo kişandina geştiyaran bo Wanê em bi Serokê Komîsyona Odeya Karsazan ê Wanê Necdet Takva re axivîn.

**Wan bi geştiyaran rengîn dibe**

Serokê Komîsyona Birêvebirina Odeya Karsazên Wanê Necdet Takva qala xebat û kişandina geştiyaran bo Wanê dike û wiha pê de diçe: "Piştî zelzeleyên Wanê di sala 2015an de li bajêr qrîzeke darayî derket. Em weke odeya karsazan ji bo derketina ji vê rewşa awarte me dest bi çendîn projeyan kir. Yek ji wan projeyan jî kişandina geştiyaran bo hatina Wanê bû. Bi taybetî jî Îran ku tenê 80 km ji bajêrê me dûr e. Me polîtîkayên xwe yên aborî di derbarê geştiyaran de revîze kirin. Bi guhertina van polîtîkayan re me di sala 2015an de dest bi 'Festîvala rojên danûstandinê ya Wanê' li dar xist û ev sê sal e em didomînin. Bi vê yekê dema geştiyar tên him dikevin behrê û li otel û cihên kêfê, kêfa xwe dikin him jî di festîvalê de danûstandinan dikin. Ev yek jî dibe sedem ku bazara Wanê zindî bibe. Festîval di 15ê Adarê de dest pê dike heta 5ê Gulanê didome. Di vê demê de betlaneya Newrozê li Îran û Herêma Kurdistanê heye. Geştiyar wê demê tên wanê û betlaneya xwe li Wanê derbas dikin. Ji sala 2015an vir ve jî Îranî her diçe bi daxwazeke zêdetir tên bajarê me."

**"Di van 7 mehên dawî de em gêhiştin reqorê"**

Necdet Takva di derbarê hêjmara geştiyaran de wiha diaxive: "Dema em li daneyên sala 2017an dinêrin ev 7 mehên derbasbûyî ji bo dîroka geştiyariya Wanê dîrokî ye. Îsal ji Kapikoyê 266 hezar geştiyar hatine bajêr. Ev hatin reqora hemû deman e. Lê mixabin li Kapikoyê deriyê sînorî nîne. Li wir bi şev û roj, rojê 4–5 saet xebatên mobîl tên kirin. Ew jî bi konteyniran tê kirin. Lê em bi Wezareta Gumrikê û Yekîtiya Odeyan û Borsayan re di hemahengiyê de dixebitin û me encam stand ku li Kapikoyê deriyekî sînorî yê herî modern bê avakirin. Wisa difikirim ku dê heta çar pênc mehan ev proje dê xilas dibe. Piştî ku derî vebû dê hatûçû zêdetir bibe."

**"Aboriya bajêr zindî bû"**

Takva diyar dike ku di demên festîvala danûstandinê de aboriya bajêr li gor demên normal ji sedî 40 zêde dibe, ji sedî 36 jî di kartê bakeyan de zêdebûn derdikeve holê û wiha didomîne: "Elbet ev tişta ku ez dibêjim bi polîtîkayên di rê de yên odeya bazirganiyê derket holê. Em her tim li gel esnaf û firoşkarên xwe ne û ji wan re dibêjin bila li hember geştiyaran bi rêz û xwedî ucdan bin. Di derbarê projeyên dahatûyê de jî ne tenê Îranî û bazara Îranê, her wiha Herêma Kurdistanê jî di bin hedefa me de ye û em bingeha hatin û mayîna wan li bajêr amade dikin. Da ku werin bajêr û betlaneya xwe li Wanê bikin. Li gor Herêma Kurdistanê heweyê Wanê pir hênik e. Li aliyê din jî em li welatên cîran jî xebatan dikin, weke Nahçivan, Georgia, Ermenistan û Azerbaycanê."

**"Em dixwazin têkiliyên xwe li gel Herêma Kurdistanê baştir bikin"**

Takva di derbarê projeyên xwe de wiha diaxive: "Em danasîn û xebatên xwe bi taybetî li Zaxo, Hewlêr, Dihok û Silêmanî dikin. Herêma Kurdistanê ji bo Wanê bazareke gelekî girîng e. Em ê bikin ku hemwelatiyên Herêma Kurdistanê di betlane û geşta xwe de berê xwe bidin Wanê û li bajarê me yê rengîn û hênik bimînin. Wan bajarekî zozanî ye. Herêma Kurdistanê havînan pir germ e, em bangî hemwelatiyan dikin bila werin Wanê û ji ber germa herêmê xwe bispêrin hewayê zozanî. Her wiha em salê çend caran diçin Xoy, Makû, Tebriz, Tehran û Urmiyê û reklamên xwe jî li bîlboardên van bajaran dixînin. Armanca me ew e ku em dewlemendiya çandî li bajarê xwe ava bikin. Niha di bin deshilatdariya Odeya Bazirganiyê de qursên me yên Farisî û Kurdî hatine vekirin. Di navendên danûstandinê de kesên bi Farisî û Kurdî dizanin tên xebitandin. Ev yek jî pira di navbera geştiyar û bajêr de hêsantir dike."

**"Em ê Gola Wanê paqij bikin"**

Yek ji girîngtirîn sedema hatina geştiyaran bo Wanê, Gola Wanê ye. Serokê Komîsyona Odeya Bazirgan û Tîcaretê Necdet Takva di derbarê Gola Wanê û projeyên li ser golê de wiha diaxive: "Bi taybetî jî di beşên ku ekolojîk û der û beran de em xwedî dezavantaj in xebatên taybet tên kirin. Yek ji girîngtirîn mijar jî paqijkirin û dîzaynkirina bendên Gola Wanê ye. Niha em xebata rawestandina kirêtkirina golê ji aliyê fabrîka û kargehan dikin. Wisa difikirim ku di demeke kin de ev pirsgirêk jî dê çareser bibe. Bi vê yekê jî dê Gola Wanê ji bo geştiyaran zaftir balê bikişîne. Em weke Odeya Bazirganan bajarê xwe bi ronahiyê rengîn dikin. Cih û warên kêf û seyranê dikin weke normên cîhanî. Bi taybetî jî ji bo ku geştiyar xwe rehet hîs bikin sektora taybet berpirsyariya xwe bicih tîne. Divê vebêrhêner zaftir xebatan bikin û ji bo geştiyar zaftir bên bajarê me xebatên xwe bidomînin.



## "Veberhêneran li Wanê winda nekiriye!"

Serokê Komîsyona Birêvebirina Bazirgan û Tîcaretê yê Wanê Necdet Takva dibêje: "Hemû geşedanên aborî û çandî taleba xwe derdixînin holê." Takva axaftina xwe wiha didomîne: "Niha ji bo cihê mayînê kêmasiyên bajêr hene. Ez bangî veberhêneran dikim bila werin Wanê û kargehan li vir vekin. Niha hejmara nivînên razanê 7 hezar in. Pêdiviya me bi 15 hezar nivînan heye. Ez wisa bawer dikim ku dê karmend jî veberhênerên di vê derbarê de arzê milet bikin. Ji bo veberhêneriyê Wan cihekî taybet e. Heta niha karsazan li Wanê zirar nekiriye. Wan di nav bajarên Tirkiyeyê de di rêza 12mîn de ye ku herî ewle ye. Bi taybetî jî karsazên Herêma Kurdistanê eger bixwazin li Wanê kar bikin em ê ji bo wan hemû derfetên xwe amade bikin."

# Bi keda Kurdan, dendikên zebeşan dibin çerez

RONYA ROJ



> Ji dendikên zebeşan piştî kedeke mezin çerez tên çêkirin. Celal Doğan ê ku vî karî dike dibêje, "Em dendikên zebeşan dişînin gelek cih û deveran û her ku diçe ev cure çerez bêhtir elaqeyê dibînin."

Zebeş, wek fekiyeke xweş û rengîn hema di sifre û malên herkesî de ciyê xwe digire. Lê belê we qet ji dendikên zebeşan çerez xwariye? Ji dendikên zebeşan bajarên wek Mêrdîn, Amed, Batman û hwd. çerez tên çêkirin. Bi salan dayikên Kurd an di cejnê de an jî di rojên din de li malên xwe ji dendikên zebeşan ji zarokên xwe re çerez çêdikirin lê belê êdî bazirganiya dendikên zebeşan jî tê kirin. Celal Doğanê Kurdê Kerborana Mêrdînê yek ji van kesan e ku ji dendikên zebeşan çerez çê dike û dibêje her ku diçe dendikên zebeşan elaqeyê dibînin û vî karî bi piranî Kurd dikin. Celal Doğan ji Heftenameya Basê re behsa çêkirin û bazirganiya dendikên zebeşan kir.

**Bo dendikan, 'zebeşên taybet' tên çandin**

Celal Doğan destnîşan dike ku ev 3 sal in ji dendikên zebeşan çerezan çê dike û ji bo vî karî kargehek li gundê Kerborana Mêrdînê vekiriye. Gelo dendikên zebaşan çawa digihêjin? Doğan di derheqê çandin û rakirina dendikên zebeşan de wiha diaxive, "Ji Qoserê bigire, Dîyarbekir, Hîlvan, Riha û heta bajarê Hetayê zebeş çê dibin. Niha du cure zebeş tên çandin. Ya yekem bo xwarinê tê avêtin û paşê tê rakirin pişt re zebeşên bo dendikan tê çandin. Ev jî di nava du mehan de mezin dibe û digihêje. Jixwe ne zebeşên mezin in û bi qasî kîlo an jî du kîloyan e. Navê van jî zebeşên dendikan e. Piştî ku ev zebeşên dendikan çê dibin bi riya makîneyê yanî mîna makineya dirûnê ya gihê, dendik tên berhevkirin. Makine dikeve nav zeviyên zebeşan û karker jî li her du aliyên makîneyê disekinin û zebeşan diavêjin nav makîneyê, makîne jî zebeş û dendikan ji hev vediqetîne. Berê bi destê mirovan dendik bi awayê zehmet dihat berhevkirin, ji loma jî ne pêkan bûye ku dendik paqij bihatana berhevkirin. Li gorî berê di pişesaziyê (sanayî) de pêşveçûn heye. Bê makine, dendik bi hêsanî ji zebeşan nayên berhevkirin, ev usûl xebateke gelek zor û zehmet e."

**Piştî çend qonaxan dendik dibin çerez**

Doğan diyar dike ku bi saya makîneyan kontrola dendikan dikin. Beriya ku bikelînin û biqelînin dendik pêşî di makineyê re derbas dibin. Heta ku dendik ji vê mekineyê derbas nebe, nikarin van bişînin. Pênc perçeyên vê makineyê hene. Yek cihê yên saxlem e, yek ji bo axê, ya sisiyan bo pûçbûnê, yê çaran bo zeyifbûnê, ya pêncan jî bo hûr û girbûnê ye.

Esnafê Kurd Doğan tîne zimên ku dendik piştî çend qonaxan amade dibin û wiha behsa wan qonaxan dike, "Piştî ku dendik ji makîneyê derbas bûn, paşê em dendikan li ser agirê êzingan di nav xuşxanayên xwe yên mezin de dikelînin. Dendikan bi xweliya êzingan û bi avê dikelinin. Armanca ew e ku bila qalikê dendikan hişk û rind bibe. Karbonat jî tê bikaranîn lê xweliya daran hê tiştekî tabî ye. Ji loma em xweliya daran bi xususî bikartînin. Ji xwe ev usûl, usûleke kevn e. Dayikên me berê di cejnê de, bi vê usûlê, dendikên zebeşan wek çerez çê dikirin lê ev usûl hinek pêş ve çû. Piştî kelandinê qirêja dendikan bivênevê bi vê xweliyê paqij dibe. Paşê em heta pênc an jî şeş avan dendikan dişon û heta ku ava wan paqij bibe. Pişt re dendikan ji bo ku ava wan darive ji bejingê re derbas dikin. Pişt re satileke (satila qelandinê) me heye, li ser agirê daran, dendikan digel xwêyê dixine nav vê satilê û heta ku dendikên zebeşan ava xwe berdidin û tê qelandin, li ser agir dimine. Xwê û dendik bi hev re tên qelandin. Bo tehmê vê yekê dikin. Bêhna wê jî zehf xweş dibe. Pişt re ku dendik hatin sorkirin, saetek an jî nîv saetê li ser bêjingên krom ên ku zengê nagirin disekinînin da ku dendik sar bibin. Di zivistanê de germ û sar bo me ferq nake lê li havînê hewayê hênik an jî sî ji me re lazim e. Piştî ku germbûna dendikan jî çû, êdî dendik tên ambalajkirin. Em dendikan, li gorî sîparîşan difiroşin. Bi giştî standardên me 25 an jî 10 kîlo ye. 25 kîlo dendik 150 lîre û 10 kîloyê jî 60 lîre ye."

## Dendikan dişînin gelek cî û deveran

Doğan dibêje karsaz an jî bazirganên ku vî karî dikin, bi piranî dendikan dikirin. Ev bi xwe ji xeynî dendikên xwemalî her wisa ji welatên wek Sûriye, Misir, Ukrayna û Îranê dendikên xam jî dikire. Doğanê ku diyar dike tehma dendikên zebaşên xwemalî gelek rind in wiha pê de diçe, "Bazirganên vî karî hene. Em diçin cihê dexlan, tucar ji me re dendikan berhev dikin em jî ji wan dikirin. Li gorî pûçbûn û tijebûna wan em ji tucaran kîloya dendikan bi 3 an jî 6 lîreyan dikirin. Wekî din, pêwistiya her karsazê dendikên zebeşan diguhere û heta 5, 10, 50 ton dendikên zebeşan dikirin. Ji hinek malan re 500 kîlo, hinek malên din re jî 5 ton dendik tên. Li gor rewşa aborî ya karsazên ku ji dendikên zebeşan dendikan çêdikin, kirîna dendikan diguhere. Kirîna dendikên zebeşan ji cotkaran re zehmet e çimkî mexsûlên wan hindik in û em nikarin li hêviya wan bisekinin…" Doğan dibêje dendikan dişînin gelek cihan lê belê bi taybetî Batman, Nisêbîn, Cizîr, Kerboran, Mîdyat, Antalya, Stenbol, Mersîn, wî bi xwe neşandiye lê dibêje sîparîşa dendikan heta Swêdê jî diçe… Sîparîşên ku tên xwestin bi piranî, Kurd dixwazin. Doğan destnîşan dike ku bo vî karî sermayeyek divê û ger şert û merc li hev were meriv dikare debara xwe ji vî karî bike.

# Simaqa Tirş a Kurdistanê tê îxraçkirin



FERHAN ÇOMANÎ

Li hin deverên Kurdistana Başûr dehlên simaqan hene û cotkar van dehlan, bo debara xwe digihînin. Li gorî agahiyên cotkaran îsal li bazaran li gor du sal berê zêdetir simaq tê firotin. Newzad Resulê ku li gundê Çinarneya girêdayê bajaroka Bingirda navçeya Dukanê xwedî dehl e. Newzad Resul, "Îsal li gorî salên berê rewşa bazaran hê baştir e û meriv kîlo bi kîlo simaqê dikirin. Berhemên cotkaran mîna salên berê di destê wan de namîne. Divê me hinekî di dest xwe de bida sekinandin lê ji ber ku talebeke zêde heye ji ber vê em hasatê zû dikin. Li bazaran geşbûnek heye lê belê ji ber ku derman tên bikaranîn ji %20 kêmbûnek heye. Li herêmê gel di cotkariya simaqê de derman bikartînin.

Li Herêma Kurdistanê bo hilberîna simaqê daneyên fermî tune. Hilberîner, simaqê dişînin herêmên cuda. Lê belê îsal tê çaverêkirin ku li Akrêyê 1500 ton, li Bingirda ku dehlên simaqê zêde hene jî 100 ton simaq bê hilberandin. Ako Enverê ku simaqên cotkaran ji wan dikire û difiroşe wiha diaxive, "Rewşa bazara simaqan îsal baş e. Qimeta simaqê li gor reng û tirşbûna wê digihure. Kîloya simaqê di navbera 1600-2500 dînarî de ye.

Simaqa ku em ji cotkaran dikirin hinekî ji wê difroşin gel û dikanan, yên din jî difiroşin derveyî Kurdistanê. Bi taybet jî bazirganên Îranê dixwazin, em bo wan berhev dikin. Ligel simaqê kaya wê jî tê firotin û kîloya wê jî 1000 dînar e. Kesên ku heywanan xwedî dikin kaya simaqê dikirin. Beytar bo dermankirina nexweşiyên ajalan kaya simaqê pêşniyaz dikin.

Resul Tofêkê cotkar ê xweyî dehla simaqê jî van agahiyan dide,"Darê simaqê him bi tebî him jî wek şitil tê çandin û piştî du salan berhem dide. Piştî ku berhem da zû bi zû ev dar hişk nabe. Çimkî dareke zexm e û ger baş lê binêrin berhemên baş dide. Hin darên simaqê hene ji van 12 kîlo berhem tê bi dest xistin. Simaq ji daran tê berhevkirin li cihekî tê hasatkirin û tovê wê jî tê vebijartin. Yek ji taybetmendiyeke vê berhemê baş heye ku xira nabe û wek berhemên din bikaranîna roja dawî tune ye."





**NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ**

## Dûhok -II-

Mi çiqas ke waştêne mintiqaya Kurdîstanî bivînî hende, belkî hende ra zî vêşer mi waştêne ke Laleş (cayê zîyara êzidîyan) bivînî. Xora kam ke şîyêne ê cayan, muheqeq şîyêne dîyarê Laleşî zî. Ez vana binê zîhnê her kesî de yew hîsê mensûbîyetê ê cayan estbî. Her kesî uca de, xo ra parçeyêk dîyêne. Belkî waştêne ke rastê rêça eslê xo bibo.

Roja maya verêne de, seba ke şîmê Laleş ma mînîbuse kîra kerde û cemê şanî kewtîme ra raye. Mabênê Dûhok û yê Laleşî zaf çin bî, coka ma rew şîyîme. Merdimode zimbêlin (zimbêlê xo eynî sey yê dêrsimijan bîy) verê ma de vejîya. Merdimek henî rîhuyaye, henî naskerde bî û zimbêlê xo henî zêde bîy ke mi va belkî ez Dêrsim der a.

Laleş de tena zîyare nê, banî zî bîy. Labelê nê banan de kesê ke şonê zîyare, tey mendêne. Banê xo teber ra zaf rind asayêne. Verê banan de darê qertî û girsî, binê daran de zî cinî û domanî esbîy. Tey bellî bîyêne ke nê Ewropa ra ameybî.

Ma binê daran ra vîyartîme ra şîyîme verê zîyare. Uca de çîyo verên o ke mi rê balkeş bî, fîgurê marêde sîyayî kemer ra taştîbî û kaleka berê zîyare de, zemeqnîyaybî dêsî ra. Maro sîya înan de bimbarek bî, wayîrê zîyare bî. Yan zî zîyare, heme xirabinîyan ra seveknayêne. Ez nêzana cayanê bînan de esto çin o, la hetê Dêrsimî de zî maro sîya bimbarek o. Zîyara marê sîyayî esta, şar pê sondî weno. (Eve/ebe moro sîya vo/bo!) Kiştena marê sîyayî xirab a. Marê her keyeyî esto, keyeyî sevekneno ûsn.

Ma solê xo vetî, henî warpay şîyîme zere. Înan ma îqaz kerdî ke paynê şêmûge nêbîyîme, ma şêmûge ser ra çîng da û şîyîme zereyê zîyare. (Ê çiralixê xo zî şêmûge ser o nanê ro.) Ancî ez cayanê bînan nêzanena la hetê Dêrsimî de paynayena şêmûge xirab o, vanê bereketê keyeyî nêmaneno.

Yemê zereyî de stunê girsî bi qumaşanê satenan û renginan xemelnaye bîy. Dêsî ra zî zemanê xalîyê ke ma fîştêne dêsanê xo ra û tey resmê teyrê tawisî bî, înan ra darde kerde bî. Seba ke tey çila bivêşnê, verê pencereyan de cayî viraştîbî û tey çilayî vêşayêne. Boya nê çilayan û ruhê mekanî ez berda welatê xo Dêrsim. Uca de zî her cayo bimbarek de û qet bimbarek nêbo zî çilayî vêşenê. Wazenê ke Haq/Heq her deqa haydarê înan bo, înan bivîno. Xirabinîya tarîyîye înan ra dûrî bero.

Ma zere de gêrîyayî, tayê fotografî antî û vejîyayme teber ke êdî tarî yo. Lez nîştîme mînîbuse û agêrayîme otêle ke hazirîya nanê ma kenê. Ma rê tirşika Dîyarbekirî pewtîbî. Otêle de kesê ke çîyê werdî amade kenê dîyarbekirij bîy. Coka werd zaf weş bî û înan ma rê xizmetade zaf rinde kerde. Çiyo ke tewr weş bî zî nan bî, nanê tenûre bi mast ra favorîyê mi bî.

Para mi rê ez di rojî rew şîya ke tenê bifetelî, tenê derûdorê ê cayan bivînî. Fikrê embazan zî henî bî. Ma roja dîyine şîyîme Barzan. Raya Barzanî orteyê koyanê berzan ra vîyartêne ra. Ge-ge zî yew çem ma rê bîyêne heval. Verê cû va nameyê nê çemî Awaşîn a, dima va nê Zap o. Ez nêzana kamcîn rast o la awa xo zaf rindeke bîye, mendîbî re çemê Muzirî. Koyê xo zaf berz bîy, serê yew koyî de, cayo tewr berz de (Gare de) seraya Sedamî bîye, gorê vatişê înan sey na saraye 365 serayê Sedamî bîyê û o her roja serre de yewe de bîyo. Hetta Amedîye (yew şaristano ke serê yew koyî ra awan bîyo) de zî yew seraya ey bîya, Sedamî waşto ke mabênê her dîyînan de yew teleferîk bivirazîyo û înşaatî zî dest pêkerdo la emrê Sedamî nêresto ci, nêmcet mendo. Xora serayan ra zî eser nêmendîbî, tena yê Gare tenê mendîbî. Şarî hêrsê xo ver her ca kerdîbî xan û xirabe, ci ra zaf çî nêmendîbî. Ancîya zî merdim vîneno ke Sedam orteyê saltanatê senên de bîyo. Kaşka serayanê ey ra tayê eser bimendêne û her kesî bidîyênê ke na dinya kesî rê nêmanena, roje yena serayî, saltanatî pêro rijînê. Çi guna yo ke hirsê îqtîdarî çiman keno kor, muktedîrî henî zanenê ke heta peynîye no, nîya dewam keno. Alternatîf nêfikireyêne, nêvanê roje yena belkî dewran çerexîno, dora ê bînan zî yeno, coka zulumkar ê, coka nîya pervasiz ê.

Gare ra tepîya ma şîyî Sulav. Sulav cayo turîstik o. Tey awe esta, hope esta, domanê lajekî tey azne kenê. Ma uca de rastê yew kesî bîy, Swêd ra embazê embazanê ma bî. Ma de zaf eleqedar bî, ma pîya çay şimit, dima ey ma berdîme yew loqante, va tîya zaf pak o, werdê xo zî weş ê. Ma zî xora vêşan bîyîme, coka ma qebul kerd. Loqante cayode berz de bî. Boverê cayê loqanteyî de Amedîye asayêne. Cayê Amedîye sey şaristanî raşt zî enteresan bî. Gilê koyî de yew şaristan. Asayîşê xo Mêrdin ra bêter berz bî.

Ma Sulav de, sey her cayê Kurdîstanî porsîyonî zaf girs ê. Yew porsîyonê yew kebabî çar şîşî bîy. Tirkîya de yew porsîyon yew şîş o. Coka seba ma zêde bî, ma hîrê şîşî waştî, ancî zî zêde bîy. Ma perojîya xo werde, pîzeyê xo kerd mird û wuştîme ra.

nadirega@hotmail.com

Dr. Golmorad Moradî:

# Ganî Ma Yewbînî Nas Bikerîme

**METE KUL**



Almanya de, bajarê Heildelbergî de, mi derheqê îtîqadê Yarsanîye de birêz Dr. Golmorad Moradî der bi almankî yew roportaj kerd. Dima mi çarna bi kirmanckî ser.

* * *

Ma ve xêr birêz Doktor Moradî, eke mumkin o ma to nas bikerîme.

Xêr ve selamet. Ez serra 1941 de Kurdistanê Îranî, şaristanê Zuhabî de ameya dinya. Zuhab yew sûka nêzdîyê Qesrê Şîrinî ya. Ez kurdêko yarsan a, ma goranî qisey kenîme. Mi Kurdistan de hem terzîtî kerdêne hem şîyêne mekteb. Serra 1969 de ez ameya Almanya û mi tîya Unîversîteya Heîdelbergî de qismê Orentalîstkî wend.

**Şarê Zuhabî heme kurd ê?**

Se ra heştay kurdê yarsan ê, goranî qisey kenê. Ziwanê ma yew ziwano kehen o. Goranî de edebîyat zaf aver o. Lehçeyanê kurdkî mîyan de goranî lehçeya tewr verên a ke ameya nuştene. Heta Melayê Cizîrî hem kirmancî hem goranî qisey kerdêne.

**Kirmancî yan kurmanckî?**

Ewro Kurdistanê Bakurî de qismêkê kurdanê ma ra vanê "kurmanc", hema eslê xo de "kirmanc" ê. Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Şerefxanî xo ra vato "kirmanc". Lîteraturê tarîxê ma de "kurmanc" çin o, "kirmanc" û "kirmancî" estê. Hetta, ewro zî Kurdistanê Başûrî de kurdê ma xo ra vanê "kirmanc".

**Ma zî Dêrsim de xo ra vanîme "kirmanc", ma seba ziwanê xo kî vanîme "kirmanckî".**

Tarîxê şima bellî yo. Mi çim de tarîx û kulturê şima yew parçeyê goranî yo. Îtîqadê kurdanê elewîyan û îtîqadê ma yarsanan zaf paralel o.

**Îtîqadê yarsanîye de kamcîn miletan ra merdimî estê?**

Kurdî, tirkî û farisî estê labelê awankerdoxê nê îtîqadî yew kurd o: Sultan Sahak.

Sultan Sahak yew kurd o, labelê zemanê ey de xeylê tirkî bîyê talibê ey. Talibê ey hetê Tebrîzî de zaf bîyê, ê tirk ê. Talibê eyê hetê Qesrê Şîrinî û Kurdîstanê Başûrî kurd ê. Yarsanê farisî zî Tehran, Şîraz û Îsfehan de zaf ê, hema înan ra zî xeylê kurdî estê ke ziwanê xo kerdo xo vîr ra, ewro fariskî qisey kenê. Na mesela Tirkîya de zî esta. Uca kî xeylê kurdî domananê xo reyde tirkî qisey kenê coka elewîtîya kurdan bena elewîtîya tirkan. Labelê îtîqadê Yarsanîye yan zî Ehlê Heqî kurdan mîyan de tewr zaf o.

**Yarsanî elewîyanê Dêrsimî ra xeberdar ê, nas kenê?**

Çi heyf ke yarsanê ma elewîyanê Bakurî nas nêkenê. Labelê nuştox û cigêrayoxê ma elewîyan baş nas kenê. Xora goreyê mi, kokê kurdanê elewîyan û yarsanan, hetta yê kurdanê êzidîyan yew o. Her hîrê grûban de sîstemê tebaqeyan (caste system) esto û pîrê kurdan bi heq û edalet talibanê xo kontrol kenê.

Dêrsimê ma de zî sîstemê tebaqeyan esto; pîr, talib, murşîd...

Belê. Ma de pîr, talib û delîl estê. Êzdîyan de pîr, mirîd û şêxî estê. Wezîfeyê înan eynî yo. Çitur ke êzdîyan de zîyareto muhîm Laleş o, ma de zî zîyareto muhîm esto, nameyê xo "Baba Yadîgar" o. Nameyo esil yê Baba Yadîgarî Seyîd Ahmed o, hîkayeya xo winî ya: Yew roje Sultan Sahak emir dano baxçewanê xo ke asaya xo binê hardî kero. Xeylê waxt ra dima yew dara saye vejîyaya û sayê na dare zaf bîyê. Baxçewan sayanê na dare pêro keno top û beno Cemxane. Key ke cem qedîya xizmetkare sayan cematî rê bare kena. Xitmetkare yew cinî ya, nameyê xo Dara-Sarî bîya. Roja bîne Dara-Sarî reyna şona ke Cemxaneyî pak bikero, uca yew henara rindeke vînena. Xizmetkare, na henare wena û dima ra bena hemîle. Dara-Sarî na mesela Sultan Sahakî rê qisey kena. Sultan Sahak vano no pit sirê Heqî yo. Key ke ame dinya hîrê rojî dima Sultan Sahak nê pitî beno firine de nano ro adirî ser, berê firine gêno. Hîrê rojî dima Sultan Sahak berê firine akeno ke lajek dest nano ro zerrîya xo ser û selam dano. Sultan Sehak o waxt nameyê lacekî "Yadîgar" nano pa. Ewro Yarsanî coka hîrê rojan ra dima domananê xo waftîz kenê û yew name nanê pa.

> Heyf ke yarsanê ma elewîyanê Bakurî nas nêkenê. Feqet nuştox û cigêrayoxê ma elewîyan baş nas kenê. Xora goreyê mi, kokê kurdanê elewîyan û yarsanan, hetta yê kurdanê êzidîyan yew o. Her hîrê grûban de sîstemê tebeqeyan (caste system) esto û pîrê kurdan bi heq û edalet talibanê xo kontrol kenê.

**Şima de waftîz esto?**

Ya. Ma de seba waftîzî yew pîr û yew delîl lazim ê.

**Şima îtîqadanê semawî ra senî vînenê?**

Heme têmîyan bîyê. Hurmetê ma sewbîna îtîqadan rê zaf o labelê ferqê ma kî zaf ê. Ma de cenet û cehenem çin ê, yan zî sewbîna yê. Îtîqadê ma de reankarnasyon (donedon) esto. Cenet û cehenem na dinya der ê. Ruhe însanî na dinya de yenê şonê, heta ke ruhê însanî beno kamil. Tayê ruhî hezar û yew rey yenê. Kamcîn îtîqad de beno wa bibo, ganî zerrîya merdimî pak bo.

**Çi rind o ke sima pêro însanan jû çim ra vînenê.**

Henî yo. Her îtîqado semawî de vanê "Pêxamberê ma pêxambero peyên o." Ma hen nêvame. Îtîqadê Yarsanîye de no alem çar dewrî yo: Şerîet, Terîqet, Merîfet û Heqîqet.

Dewro jûyin Şerîet o. Manaya şerîetî qanûnê îtîqadî yo. No dewr waxtê Ademî ra heta waxtê Hezretî Mehemedî ramito.

Dewro dîyin Terîqet o. No dewr waxtê Hezretî Elî ra dima heta waxtê Şah Xoşînî ramito, yanî serra 661î ra hetanî 1028î.

Dewrê Terîqetî ra dime dewrê Merîfetî yeno. No dewr heta serra 1400î ramito, yanî hetanî zemanê Sultan Sahakî.

Dewrê Heqîqetî dewro peyên o; dewro nikayin. Yanî ma de pêxambero peyên çin o, hema "Dewro Peyên" esto.

**Enteresan o. Na hîkayeya dewrê alemî ma elewîyan mîyan de zî esta. To hîkayeya Baba Yadgarî de behsê Cemxaneyî kerd. Şima çitur cem girêdenê? Şima de dewrêşî estê?**

Ma cemê xo Cemxane de girêdanê. Cem şewa panşemeyî girêdanê û ganî yew pîr yan seyîd îdare bikero. Cemat erd de nişeno ro, cem gêno û pîr yan zî seyîd yew postî ser o nişeno ro. Di kesî kî xizmet kenê. Cem ke qedîya loqme kenê vila. Gama ke cem gênê serxoş delxe ra şinê û hewn vînenê. Tayê vanê dewrêş, nameyê dewrêşî yeno manaya dergewanî.

**Şima de kamcîn roşanî estê?**

Serrnewe de ma hîrê rojî roje gênîme. Roşanê Qurbanan esto, yanî Roşane Îbrahîm Pêxamberî. Roşanê Hewtan û Hewtewane zî estê.

**Dêrsim de Hewtemalo Pîl û Hewtemalo Qic estê. Hewtan û Hewtewane yenê çi mana?**

Manaya Hewtan xizmetkarîya Heqê asmênî ya, Hewtewaneh zî na dinya de seba Heqî xizmet kenê. Nê xizmetkarî mekanê çewresan ra yenê. Belkî Hewtan û Hewtewaneh şima de bîyê Hewtemalo Pîl û Hewtemalo Qic. Ewro Kurdistan neke çar, hewt parçe yo. Hem erdê ma hem kurdê ma biyê parçe-parçe û yewbînî rind nas nêkenê labelê kokê xeylê hîkayeyan û sanikanê înan yew o.

**Ez winî zanena ke Baba Tahirê Uryan şima de şexsîyetêko muhîm o.**

Ya, hem şaîr o hem kerametê xo estbîyê. Mesela, yew hîkaye de Şah Xoşîn û new sey talibê xo Hemedan de benê meymanê Baba Tahirê Uryanî. Cînîya Baba Tahirî Fatima meymananê xo rê yew tebaxe pîlaw bena. Şah Xoşîn şaş beno, pers keno vano "Ya Baba Tahir, tîya new sey kesî estê, ma senî benîme mird?" Baba Tahir cewab dano vano "Meraq mekerê, kerem bikê, biwerê." New sey kesî pêro pîlaw wenê labelê pîlaw nêqedîno û pêro benê mird. Hîkayeya winasî Încîl de zî esta. Încîl de vanê panc hezarî kesî bi panc nanî û di maseyan benê mird.

**Eynî hîkaye Dêrsim de zî esta. Ma de Baba Kurêş meymananê xo yew tebaxe de keno mird. Hûmara meymananê xo zî new sey a. Baş o, Şah Xoşîn kam o?**

Nameyî yan zî leqebê Şah Xoşînî zaf ê. Tayê vanê "Mubarek Şah", tayê vanê "Baba Xoşîn". O zî yew awankerdoxê îtîqadê Yarsanîye yo. Şah Xoşîn serra 1025î de Lorîstan de ameyo dinya. Maya ey Mama-Calale ya. Talibê ey kurd, tirk û heta erebî bîyê û her serre talibê neweyî ameyê. Şeştî û yew serrîya xo de Şah Xoşîn û talibê xo pîya şîyê lewê cemî, uca xatir waşto û nişto ro estorê xo, mîyanê awe de bîyo sir.

**No zanayiş şima de nuştekî yo yan fekkî qisey beno?**

Zanayîşê ma Defterê Serencamî û Defterê Newrozî de nuşte yê. Defterê Serencamî yew kitabo kehen o, seserra diwêsine de nusîyayo û zaf muhîm o. Mi de bî labelê mi da yew merdimî. Bi goranî nusîyayo

**Goreyê mi melumatê ke to derheqê yarsanîye de dayî seba elewîtîya ma zaf muhîm ê. Persê mino peyên no bo mamosta; ma kurdanê zazayan rê yew vateyê to esto?**

Ganî ma yewbînî nas bikerîme, ganî ma tarîx û ziwanê xo rê wayîr vejîme ke xo vîndî nêkerîme.

### Rojhelat de têkilîya yaresanan û grûbanê kurdanê bînan senîn a?

Kurdane Rojhelatî her wext hurmet nîşanê yewbînî dayo. Uca dîyalektî zaf e la her kes ziwanê ê bînan zaneno û qisey keno. Rojhelat de hem hetê tîcaretî hem zî hetê sîyasetî ra yewîye esta.

-Rejîmê Îranî sima senî vîneno? Şima ser o tedayan keno?

Belê, xora Rejîme Îranî îtiqadê ma qebul nêkeno. Îdarekerê înan ma ser o zaf zulm û tedayan kenê. Wazenê ke ma bibîme Muslumanê şîa. Par mintiqaya Kirmanşahî ra yew grûba Îslamî hêrişê ban û dikananê Yarsanan kerdbî. Rejîm rey-rey roşanan û merasîmane ma qedexe keno. Tayê muslumanê radîkalî vanê dikaanê yarsanan ra çîyê mehêrîne çunke heram o. Sûnnî-Şîa ferq nekeno, goreyê înan ma kafîr îme. Çi heyf ke îtiqadê ma ser o zaf tedayî benê, labelê ewro Rojhelat de pêro kurdî destek danê yewbînan.

-25ê êlule de Referandumê Kurdistanî beno, eke Kurdistanê Başûrî bibo xoser, no parçeyanê bînan ser o çi tesîr keno?

No referamdum zaf muhîm o.Goreyê mi netîce de "Ya" vejîno, çunke herkes rind zaneno ke no firsend firsendo peyên o. Ez bawer kena ke, eke "Ya" bivejîyo, o wext rûmetê pêro kurdan dinya de hîna berz beno. Xoserîye seba yaresanan zaf muhîm o, Başûr de zî yaresan/kakaî estê û zafê înan zî xoserîye wazenê.

# Kurdê Kirmancî (Zazayî) zî destek danê referandumî

Derheqê Referandumê Xoserîya Kurdîstanî de yew beyanatê paştgirî zî hetê rêxistinêka kurdanê zazayan ra ame dayene. Beyanato ke hetê îdareyê komela Ziwan-Komî ra erşawîya rojnameyê ma wina yo:

Komela Ziwan Huner û Kulturî (Ziwan-Kom) ke seba pawitiş, averberdiş û aktuelkerdişê kirdî 2009 de Diyarbekir de awan bîya û heta ewro bi hawayêko aktîf karê xwu dewam kena, roja 10.09.2017 de kom bîye. Kombîyayiş de qerar da ke seba referandumê 25 êlule bi hawayêko aktîf hetkar bo.

Komela Ziwan-Komî ena bawerîye de ya, mileto bêdewlet mîyanê miletan de bêname yo, çinê hesab beno. Ma kurdî gereka rewna ra bibîyêne wayîrê dewlete, la çi heyf ke heta ewro ma bêdewlet mendê. Coka referandumo ke Kurdistanê Başûrî de beno tena semedê parçeyêk ney, esas seba heme kurdan firsendêko pîl o. Referandumê xwuserîye hetê huqûqê mîyanneteweyî ra zî heqêko meşrû yo. Ganî her kes hem qerarê referandumî rê hem zî netîceyê ey rê hurmetkar bo.

Ma sey komela Ziwan-Komî seba referandumê ke Kurdistanê Başûrî de beno zerrî ra hetkarî kenê û ma hêvî kenê referandum serkewte bivîyaro, seba dewletbiyayişî bibo gama tewr xurte.

Diyarbekir, 11.09.2017

Komela Ziwan Huner û Kulturî (ZIWAN-KOM)

### Rastkerdiş:

Wendoxê erjayeyî, ma hûmara verêne de nuşteyê "Kitabêko muhîm: 1838 Yazında Kürdistan" de (r. 11) yew xeletî kerde. Cumleya ke tede bi no qayde vejîyaybî; No çime bi nameyê "138 Yazında Kürdistan" (Hamnanê 2018î de Kurdîstan) ye kitab o. Ganî wina bibîyêne; "No çime bi nameyê "1838 Yazında Kürdistan" (Hamnanê 1838î de Kurdîstan) yew kitab o." Ma uzrê xo wazenê.

# Ameyîşê mi bi Fransa Ser o

**HACER PETEKKAYA**

Merheba wendoxê erjayeyî yê Basî,

No nuşteyê mino siftayin yê rojnameyê Basî yo. Ez wazena destpêkê nê nuşteyê xo de her çîyî ra ver, seba ke hem firsend hem zî cesaret da mi ke ez nê nuşteyî binusa embazê xo Mutlu Canî rê sipas kena. Naskerdena min û Mutluyî resena serra 2014î la qîymetê ma yewbînan het bi serran nêsecîyeno. Xora wexto ke merdim eynî çîyî rê zerrîya xo akero naskerdena yewbînan zehmet nêbena. Naskerdena ma zî ziwanê ma ser ro kok da. Ez winî zana ke Mutlu nika edîtorîya beşê kirmanckî yê rojnameyê Basî keno ke no karêko zaf biqîymet o.

Wexto ke Mutluyî mi ra va : Xecê nuştoxê ma yê cinî zaf nîye, wina meke, ganî ti zî dest bide nuştişê kirmanckî. Birastî zerrî zaf waşte la sey her wextî û sey zaf kesan mi hem xo rê û hem zî Mutluyî rê tewir bi tewir behaneyî hûmaritî ke zafê cî zî rast bîy. Mesela reya verêne, çend aşmî ver wexto ke ey êz gêraya û mi ra nuşte waştbî, ê wextan hem dersê minê masterî hema nêqedîyaybî û hem zî zaf û zehmet bîy. O semed ra mi uzrê xo waşt. A dîyine dersê mi qedîyaybî la na rey mi dest bi nuştişê tezê xo kerdbî û bê tezî roja şemeyî zî Enstîtuyê Kurdî ya Parîsî de destpêkê ders dayena min a kirmanckî bî ke nê hurdînan zî xeylê wextê mi girewtêne. A hîrêyine zî, bi rastî mi bi xo zî, xo bi xo vatêne gelo ez do çi binusa û gelo ez do bieşka nê barî hewada. Çike no çî yo ke yew fine nuşteyêk binusî û dima vaja wextê mi çin o, ez nêeşkena nîyo. La dima, ez xo bi xo fikirîyaya û mi va : ti hem vana waştişê mino tewr pîl, ziwanê xo rê xizmet kerden a û zehmeto ke nezdîyê panc serran tîya ancena semedê zazakî yo hem zî xo remnena. Wina nêbeno ! Rasta ci vaje, gelo tî çirê nê barî ra xo remnena? Meterse, xo tepîya mede, çiqas destê to ra ame ey bike. Hade, ronişe, komputura xo bigê xo ver û binuse.




> Mileta ma mîyan de xora zaf tay kesî estê ke ziwanê dayîka xo ya tepîya di û hîrê ziwanê beyanî zanê. Zafê ci çat û pat yan tena kurdî zanê tirkî nêzanê yan zî tirkî zanê kurdî nêzanê.

Qerar êdî amebi dayene, pey de ageyrayene nêbena. Ma hete wexto ke kesî/e dest bi yew karî bikero/a û ê karî nîmcet verado wina vanê : "Heger ti yew karî nêmcet verade, mezelê to zî nêmcet maneno." Her çiqas ne merg ne zî mezel ma rê zaf xeyal nêbo zî gerêk ma karê xo nêmcet nêverdê û verê her çî xo bi xo nêşermaynê.

Tabî verê nuştîşî ez zî tayê fikirîyabîya û Mutluyî zî mi ra vatbi madem tî ya Fransa de û uca ciwîyena ma rê qalê ucayî bikê. Nîyetê mi oyo ke, ez her nuşteyê xo de Fransa ser o qalê yew çîyî bikera. Wa no nuşte embazê minê ke nêzanê ez çi wext, senî ameya Fransa û tîya çi kar û gurwe kena ey ser o bo.

Mi mabeynê serranê 2012-2013î de Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî de zazakî ser o mastero bêtez kerd û qedena. Hamnanî xalcenîya mi semedê yew projeyê xêzefîlmî veng da mi û ez şîya Îstanbul. Eke merdim raste qisey bikero, hetanî şîyayena min ya Îstanbulî xebera mi ne Enstîtuyê Kurdî yê Parîsî ra estbî ne zî bursê ci ra. Wexto ke ez bursî ra xeberdar bîya hem derheqê nê bursî de zaf melumatê mi çin bî hem zî muracat kerdişê bursî rê zaf tay wext mendbi. Masterî dima, xora nîyetê mi estbî ke semedê ziwanê beyanî yew serre şira welatê beyanî, la rewşa mi zî sey zafinan teq û req bî û bi îmkananê xo ya zaf zehmet bi.

Kurdanê bakurê Kurdîstanî mîyan de yew nimûne esta ke netîceya nîşandayena asîmîlasyonê dewleta Tirkîya rê nimûneyêka do zaf balkeş ba. Mileta ma mîyan de xora zaf tay kesî estê ke ziwanê dayîka xo ya tepîya di û hîrê ziwanê beyanî zanê. Zafê ci çat û pat yan tena kurdî zanê tirkî nêzanê yan zî tirkî zanê kurdî nêzanê. Mi bi xo zî, hetanî verê çend serranê peyênan yewî mi ra pers bikerdayêne "gelo ti ziwanê beyanî zana ?" mi zi bivatê nê. Çike mixabin ma rê hem ziwanê tirkî bibî ziwanê ma hem zî wexto ke vatêne ziwanê beyanî yan îngîlîzî yan franskî yan zî almankî ameyêne ma vîrî. Naye zî nîşanê ney dayêne ke ma eslê xo de senî asîmîle bîyê. Helbet ma dima ra musayî ke tirkî semedê ma ziwanê beyanî yo la nê ziwanê ma yê beyanî zî dinyayî ser o qet pere nêkerdo. O semed ra fikrê xalcenîya mi weşê mi şi û ma destpêkê cîgêrayişê bursê Enstîtûya Parîsî ya Kurdî kerd. Wexto ke ez ewnîyaya şert û mercanê bursî ra heme şertî mi de mewcut bîy, çike mi ziwanê kurdî ser o yew mastero bêtez kerdibi, ez hîris serrî ra werdîyek bîya, cinî bîya û lehçeyanê ziwanê kurdkî ra zazakî zî zanayêne û zaf nêbo zî tay çî-mîyê mi zî rojname û kovaran de weşanîyayîbî. Mi xo bi xo vate qey xora no burs tena semedê kesê ke ziwanê kurdî ser o xebitîyenê, înan rê dîyeno. Çi kêmasîya mi esta ke ê do mi rê burs nêdê. Hinî-minî mi dosya xoya bursî kerde hedrê û goşê xo heme qiseyan rê kerdî kerrî û erşawite Parîs (Çike wextê hezirkerdişê dosya de mi zaf kesan hema hema kamo ke fekê xo akerdêne mi ra vatêne : muracat bike la hêvîya xo zî zaf pê meke çike hem qebul girewtişê nê bursî zehmet o hem zî heta nika tewir tewir kayî kay bîyê dîyayîşê nê bursan de. Bi rastî ez wazena ke yew nuşte zî bursê enstîtuyî ser o binûsa ke heger îmkan bibo ez do mamosta Kendalî ya na mesela ser o qisey bikerî û şima ya zî bare bikerî.)

Mi dosyaya xo Îzmîr ra erşawite enstîtu û ez şîya başûrê Kurdîstanî, zîyaretê bira û xalanê xo. Hamnan qedîyabi û ma amey peynîya aşma êlule. Hêvîya mi tay bi tay kêmîyaye. Çike, destpêkê masterî de sozê ke hetê hukmatî ra dîyaybî nêtepişîyayîbî û hes û bes enstîtuyê ma ra zî nêvejîya û roj bi roj xilqê mi bîyê teng û teng. Mi êdî hedî-hêdî planê xo agêyrayîşê bi Îzmîrî ser o kerd ke uca şorî dersxaneyê azmunê KPSSyî. La Homa zano ya zerrîya mi zî qet nêwaştêne, mi vatêne hena bimira la nêşora Îzmîr ne zî fina ê azmunî rê xo hedre bikerî û mamostatîya ziwan û edebîyatê tirkî bikerî.

(dewamê nuşteyî esto)

**ELÎDA ZERRÎ**

Yew Sanike:

# Estoro texteyên





Cayêk beno cayêk nêbeno. Yew dewe de heşt biraye benê. Hewt heb lacî, yew zî keyneke. Mîyanê înan de tewr qije na kêneek a. Ma û pîye nînan merdê.

Pêro birayî hêga de xebîtîyenî. Waya înan zî keye de nan pewjena, xizmetê birayanê xo kena. Labelê na kêneke hema zaf qijkêk a. Şima mevajî pîl a. Hema des serrî ya. Qickêk a labelê zaf biaqil a, her çi zana. Name aye zî Zerac a. Zerace nameyê xo ra zaf hes kena. Çunke Zerace nameyê maya aye bîyo. Maya aye wexto ke Zerace arda dinya merda. Pîye aye zî nameyê kênaya xo Zerace nawa pa.

Pîyê aye zî di serrî dima merdo. Zerac destê hewt birayanê xo de bîya pîl. Zerac pêro birayanê xo ra hes kena labelê Usarî ra zaf-zaf hes kena. Usar birayê aye yo tewr pîl o.

Usar zî Zerace ra zaf hes keno, her wext vano "ti maya min a." Zerace rê her çî gêno, zerrîya aye qet nêşikneno.

Yew roje Zerace vana:

-Bira! Ez eşkena to ra yew çî biwaze?

-Ti eyb nêkena wakila mina delale! Vaje, ti mi ra çi wazena?

-Ez to ra yew estor wazena. Estorêko texteyên. Ti eşkenî mi rê bivirazî? Ez to ra texte zî ana û birrek zî.

Usar huyeno û vano:

-Ti qet meraq meke maya mi ez to rê meşte hadre kena.

Zerace hende keyfweş bena ke hema-hema bifirro. Alişkanê birayê xo maç kena.

Roja bîne bena Zerace werzena û nanî hadre kena. Pêro birayê aye sêpare xo kenê û şinê hêga. Usar tik û tena maneno.

Zerace ra vano:

-Mi waştişê to ard ca. Estorê to viraşt ha teber de yo.

Çimê Zerace abenê. Ca dê şina verê berî. Estorê xo vînena. Zaf berxudar bena. Û birayê xo ra vana:

-Ez to rê sipas kena biraye mi.

-Çîyêko muhîm nîyo maya mi. De hayde cinîşe.

Zerace ca de nişta estoro texteyên. Labele estor neşino. Usar vano:

-Eke ti vaje "dehh" estor şîno. Eke ti vaje "şşşşş" estor ca de vindeno. Labela ganî ti qet nêvaje "çooşşş".

Zerace vana:

-Temam bira ez qet nêvana çooşşş!

-Mi rê soz bidê. Ganî ti qet nêvaje "çoşşş."

- Ez sond wanena ke qet nevana""çoşşş"

Aye ra dima Usar zî şino hêga. Zerace karê xo qedênena. Nan zî pewjena. Û ca de şina hetê estorî. Nişena estorî û vana:

-Dehhh! Deehhh!

Estor ca de şino. Zerace seke hewa ra şina, estorî ser o kilaman vana. Rey rey zî vana 'deeehh û deehh.'

Yew saete, di saetî şina şina. Zerace bi keyfê xo şina. Qet nêvindena. Di saetî ra pey ewnîyena ke ameya yew ko. Tersena çunke tu kes nêvînena derûdorî de. Estorî ra vana: "şşşş!" Estor vindeno. Nata weta ewnîyena labelê kes nêvînena. Reyna estorî ra vana: " dehhhh!" Estor hêdî-hêdî şino. Zerace zaf meraq kena, xo bi xo vana gelo eke ez vaja "çooşşş" se beno? Meraq kena û vana: 'Çoşşş!'

> Zerace bi keyfê xo şina. Di saetî ra pey ewnîyena ke ameya yew ko. Tersena çunke tu kes nêvînena derûdorî de. Estorî ra vana: "şşşş!" Estor vindeno. Nata weta ewnîyena labelê kes nêvînena. Reyna estorî ra vana: " dehhhh!" Estor hêdî-hêdî şino. Zerace zaf meraq kena, xo bi xo vana gelo eke ez vaja "çooşşş" se beno? Meraq kena û vana: 'Çoşşş!'

Estor ca de şikîno. Zerace zî kewena erd.

Zerace a game bê estor manena. Nêzana ke se bikero, nêeşkena şiro keye. Zaf tersena û bermena. Poşman bena. La fayde nêkeno. Zerace biney bi pêyatî şina. Beno şan her ca beno tarî. Zerace ewnena ke ha yew lamba asena. Zaf bena keyfweş. Ca de vazdana şina uca. Resena keye, no keyeyêko zaf pîl o. Berê ey zî zaf pîl beno. Mat manena Zerace. Ber kuwena. Zaf zî bîya vêşan. Di deqa dima yew dêv ber akeno. Bejna nê dêvî hîrê-çar metre ya. Goşê ey, fekê ey zaf pîl ê. Zerace zaf tersena, kena ke biramo. Labelê dêv aye ca de tepişeno. Zerace gêno zere. Vano:

-Meterse ez to nêwena. Ez to rê çîyê nêkena. Labelê ganî to êdî naye ra pey mi rê xizmetkar bibe. Eke ti mi rê xizmetkarî nêkena ez nika to wena.

Zerace bermena nêbermena la fayde nêkeno. Dêv aye nêverdano. Esîr gêno. Zerace bêçare manena û qebul kena. Bena xizmetkara dêvî.

Aye ra dima dêvî rê nan pewjena, cilanê ey şuwena û keyeyê ey pak kena.

Dêv her şewdir şino serê koyî ke xo rê seyd bikero. Hargûş ano, xezale ano Zerace zî şan de nê heywanan pewjena.

Rojî vîyarenê, Zerace êdî bena barîçeke, aye de hal nêmaneno. Bena nêweş. Her roje bermena, xo bi xo vana:

-Biraye mi ti ha kotî? Be, be mi bixelisne. Hewt biraye mi estê labelê kesî ez nêdîya? Gelo înan ez xo vîr ra kerda?

Labelê ney! Hewt birayê aye zî her roj Zerace dima bermenê. Nêşinê hêga û her roj Zerace gêrenê. Yew aşme şinê, di aşmî şinê la Zerace nêasena.

Yew roje Usar serê şewdirî werzeno û reyna gêrêno, şino yew koyo ke înan verê cû qet nêşîyê uca. Ewneno ke uca de yew ban esto. Ca de vazdano û şino berê ey kuweno labelê kes anêkeno. Reyna ke kuweno vano:

-Kes çin o zere de?

Zerace vengê birayê xo ca de şinasnena. Winî keyfweş bena ke yena pey berî vana:

-Usar Usar! birayê mi, ez ha tîya de ya. Labelê ez nêeşkena ber akera. Kîlit mi de nîyo. Dêvî ez esîr girewta.

Usar gêrêno û yew tuwerzîn vîneno. Bi nê tuwerzînî ber şikneno û akeno. Waya xo ye Zerace gêno verara xo. Lew nano alişkanê Zerace ra. Ewneno ke Zerace de hal nêmendo, bermeno. Wurdî zî bermenê. Zerace her çî qalê birayê xo kena. Dima werzenê ke şirê keyeyê xo. Labelê a game dûrî ra vengê dêvî yeno. Dêv seyd ra agêreno. Zerace tersena vana:

-Lez bike birayê mi, eke dêv nika bero ma weno. Bejna dêvî zaf derg a. Ma ca de tepişeno. Hayde ma lez bikerê!

Dima yew çî yeno vîrê Zerace vana:

-Bira serê na dolabe de yew şane esto, yew sitîle esta, yew zî sabun esto. Hîrê heme zî bîgî xo het. Ma rê lazim benê.

Usar gêno û wurdî zî vazdanê teber.

Dêv înan vîneno. Keweno dima înan. Vazdano, yew gama dêvî ponc gamê Usar û Zeracê yê.

Tay maneno ke dev bireso înan. Zerace birayê xo ra vana:

-Bira nê şaneyî bierze.

Usar senî ke şane erzeno verê dêvî pêro telê şaneyî benê telî. Dêv gineno erd, her cayê ey beno gonî. Labelê dev mîyanê telîyan ra vejîyeno. Reyna vazdano keweno dima înan.

Zerace vana:

-Bira nika zî sitîle bierze.

Zereyê sitîle de biney awe estbena. Usar seke sitîle erzeno û her ca beno awe, beno gole.

Dêv mîyanê awe de maneno. Biney maneno ke bixeniqîyo. Labelê o reyna xo xelisneno, mîyanê awe ra vejîno.

Zerac na rey birayê xo ra vana:

-Birayê mi nika zî sabunî bierze. Ma bêçare mendê.

Wurdî zî tersenê û qefilîyenê. Usar sabun zî erzeno.

Verê dêvî pêro beno buz pêro beno şemitoq.

Dêv nêeşkeno şiro. Û gineno erd. Sereyê ey şikîno, ci ra gonî yena. Dêv uca de mireno.

Zerace û Usar, o wext keyf kenê. Alişkanê yewbînan ra maç kenê. Zerace Usarî ra uzrê xo wazena û vana:

-Ez sozê xo nêvinderta, mi estorî ra va 'çooşşş'. Ez to ra uzrê xo wazena. Ez êdî qet tu çî zaf meraq nêkena û sozê xo de zî vindena.

Wurdî zî dima ra şinê keyeyê xo. Bîrayê bînî zî Zerace vînenê û seke keyf ra firr danê. Aye ra pey ra pêro benê berxudar û her wext zî qîymetê yewbînan zanenê.

# Françoîs Truffaut

Rejîsoro fransiz, 1932 de Parîs de maya xo ra bî. Domanîya xo hîna zafêr islahxaneyan de û şertanê zehmetinan mîyan de vîyarnaye. Serranê 1950î de sînemanuştox û teorîsyenê sînema André Bazîn şinasna. Serra 1953î ra tepîya nuştoxanê "Cahirs du Cinema" [kovarêka sînema ya kehen û namdare] mîyan de ca girewt. Fîlmê kilmî ke ey 1950 de antî, bi înan sey pêşengêkê cereyanê Pelo Newe yê Fransizan ame hesibnayîş. Truffaut, pawitoxê serekeyî yê Politique des autersî/politikaya rejîsoro kreatîf (yaratıcı) bî. Cîya-cîya fîlmanê xoyê kilman û senaryoyanê xo ra pey 1959 de bi fîlmê xo Les Quatre Cents Coups (400 derbî) fîlmê xo yo derg metrajin yo tewr verên ant.

Fîlmanê ey ra çend hebî

1959 Les Quatre Cents Coups 400 derbî

1960 Tirez Sur Le Pianiste Pîyanocenî Bikişe

1961 Jules et Jim Waştîya Vîrrînêşîyaya

1964 La Peau Douce Cîldo Nerm

1966 Fahrenheit 451 Merdimê Dinyaya Vurîyaya

1968 La Mariée était en Noir Veyvekinîyo Sîya

1968 Baisers Volés Maçê Diznayeyî

1969 La Siréne du Mississippi Ez Zewicîyayene ra Nêtersena

1970 L' Enfant Sauvage Gedeyo Kovî

1973 La Nuit Américaine Tîje de Şewe

1975 L' Historie D'Adelé H Hîkayeya Hya Adele

1978 La Chambre Verte Odaya Keske

1980 Le Dernier Métro Metroyo Peyên





## Hoka Ewnîyayîşê Truffautî ra*

Taybetmendîya ortaxe ya tewr muhîme ya fîlmanê Cereyanê Pelê Neweyî, çîyê ke înan de ameyêne redkerdiş bîy; detayê vêşî, setê zengîn û mesrefinî, sexneyê îzahkerdoxî. Hetê têmîyankewte yê na sinemaya newîye zî paralelbîyayîşê qusuran û avantajanê aye yo. Terzê na sînema de tenikênî, rehetîye,-mutewazîyîye, lezîye, sivikîye, xeşîmîye û nehişmendîyîye têreyde yê.

Tayê zorkarîyan ver fîlman karakterê xo kerdî vindî: Rejîsorê xerîbî, yew ordî senaryonuşt, tedayê vilakerdoxan , kadroyê teknîkeran yo hîra, lîsteyê mesrefan yê zêdeyî. Ma wina fikirîyayî ke bi qaydeyê xoser xebitîyayene û babetanê basîtan ser o fîlmanê erjanan antene nê zêdeyîyan kêmî bikê. Fîlmê cereyanê Pelo Neweyî tek hetî ra manenê yewbînan, o zî no yo ke vera eynî çî vejînê.

... Seke şima zanê, merdiman sey êyê ke weşvîn /optîmîst ê û êyê ke xirabvîn/pesîmîst ê kategorîzekerdene rast nîyo. Ma ancax eşkenê înan sey ehmeqê nebextewerî û ehmeqê bextewerî bi di grûban kategorîze bikê. Aye ra ez nêwazena xo sey weşvînêk bida şinasnayîş. Wextê wextan de ma keyeyanê yewbînan de arê bîyêne, sey çîyêko hêvî dano ewnîyayêne ameyeyî ra û semedê her yewê xo hêvîyanê xo hûmaritêne. Ê wextî ra nata têkilîyî vurîyayî. Xayinîye bi dostîyan ameye kerdene. Ez zaf tay merdiman vînena ke emrê înan çiqas aver şono rindîya înan zî aver şona. Şima meewnîyê îstîsnayan ra. Sey nê sedeman ver derheqê "Pelo Newe"yî de fikrê mi zaf pozîtîf nîyê. Biney mubalaxakerde bibo zî ma eşkenê wina vajê: Ma wextê wextan de ma ciwan bîy, rind bîy... Her kes eşkeno dewamê nê vateyî goreyê waştişê xo temam biko.

Felsefeya mina cuye ser o nêbo zî, tewirê fîlman o ke derheqê sînema de tesîrê mi keno, fîlmê ke şiroveyê fekkî îhtîva kenê yê. Seke rejîsor yew odaya tarîye de ez dîya û rasterast, bi hawayo eşkera mi reyde qisey keno... Rejîsorê ke ez înan ecibnena, eke yew fîlm de yew hemsir/e, yew dost/e bidê karaktere/a serekeyî/ye het keyfê mi remeno. Çunke eke zerrîya mi ra qehramanê/a fîlmî reyde eleqedarbîyayîş bero, ez nêwazena ke wa yew hemsir yan zî dostê/a ey bibo/a; eke ez bivîna ke esto/a o wext zerrîya mi ra vatişanê ey/aye reyde hîna tay eleqedarbîyayîş yeno. Aye ra ez gama ke fîlm ancena ehemîyet dana nê xususî. Ganî temaşekerdox tena qehraman/e reyde bibo. Ez bi taybetî kena ke nê hîsî peyda bika. Belkî zî no, mendeyê hîsanê minê domanîye yo yan zî waştişê min o xo bi qehramen/e reyde eynîkerdiş (özdeşleştirme) o. Wextê mi çin o ke ez terorîyê antî-îdentîficatîon (özdeşleşme karşıtı) yê modernî ser o munaqeşayan bika. Eke wazenê wa teorîsyenî, hetta rejîsorî bikê. Ez bi xo vana, fîlmê ke temaşekerdoxî wazenê xo qehramanê/a reyde eynî bike, fîlmê bêkalîte nîyê. Tam eksê ey, tewir o ke mi ser o bitaybetî tesîr keno no tewir o.

(*) No sernuşte orîjînê metnî de çin o, mi pi na pa.

Tirkî ra açarnayox: Pêşar Bextewer

*Çime: Artun Yeres (Derleyen), Göstermenin Sorumluluğu 80 Dünya Yönetmeni, Donkişot Yayınevi, İstanbul, 2010, r. 471- 475*

## Mohammed Amîn El-Huseynî:

# Muftiyê Hîtlerî





ŞEFÎQ PÊŞENG

Dema me di Sibata 1981ê de li kampeke Filistîniyan ya li Bêrûdê, grûbeke çekdarên Neo-Nazî dît, em şaş û mat mabûn. Ne haya me ji pêwendiyên dîrokî yên di navbera Filistîniyan û Almanyaya Nazî de hebû û ne jî me navê Mohammed Amîn El-Huseynî bihîstibû. Ji bo em bi vê têkiliya li ser dijminatiya Cihûyan bihesin û bingeha vê têkiliyê fêm bikin demeke dûr û dirêj lazim bû.

Mohammed Amîn El-Huseynî di sala 1893an de li Qudsê hatiye dinyayê. El Huseynî li zanîngeha Misrê, Al-Azharê beşdarî dersên Raşîd Rîda dibe. Rîda di destpêka sedsala 19.an de yek ji netewperewerên Ereb yên herî çalak û navdar e. El Huseynî beriya Şerê I. yê Dinyayê li Stenbolê, di xwendingeha eskerî de dest bi xwendina xwe dike. Ku şer dest pê dike, El Huseynî dizivire Şamê û li Şam û Qudsê dest bi belavkirina hizrên netewî dike. El Huseynî dijberekî tund ê li Filistînê bicîhbûna Cihûyan e, panerebîstekî çalak e. Li erdê ku îro dewleta Îsraîl, Libnan, Sûriye û Urdin li ser hatiye damezirandin, stratejiya avakirina dewleteke Ereb dimeşîne. Di wê serdemê de ew erda ku El Huseynî, li serê damezirandina dewleteke Ereb kiribû armanc, di bin desthilatiya Fransî û Îngilizan de bû. Her çi car caran ew û rayedarên Îngilîz ji sedema vê armancê û dijberî û dijmanatiya wî ya Cihûyan, dihatin himberî hev jî El Huseynî di 1921ê de ji aliyê rayedarê îngilîz Herbert L. Samuel ve weke muftiyê mezin yê Qudsê tê diyarkirin. Bi vê erkê tesîra wî di nava Filistîniyan de bihêztir dibe. El Huseynî di 1936an de dibe serokê Desteya Bilind a Erebên Filistînê.

El Huseynî di 21ê Hezîrana 1937an de li Konsolosxaneya Alman a li Qudsê û bi rejîma Nazî re pêwendî datîne. Di dumahîka têkiliyan de bi fermana berpirsê sereke yê karûbarên ewlekariyê, efserên Nazî Herbert Hagen û Adolf Eichmann di 2ê Cotmeha heman salê de diçin Hayfayê. Şandeya naziyan li Hayfayê bi El Huseynî re dicive û li ser piştgiriya şerê Ereban ê li dijî Cihû û Îngilîzan li hev dikin. Li gorî vê lihevkirinê; Dê Ereb li dijî Cihû û Îngilîzan şer bikin û wê Alman jî pere û çek bidin Ereban. Nazî di heman demê de dest bi weşaneke Erebî dikin û misêwa propagandaya ku Cihû, û Îngilîz dijminên hevbeş ên Ereb û Almanan e û ew dê bi hevkariyeke bihêz di navbera Ereb û Almanan ji Iraq, Sûrî, Libnan û Filistînê bêne derxistin.

Muftî El Huseynî di nameyeke ku di 20.10.1941ê de ji Hîtler re dinivîse, ji Hîtler daxwaz dike ku soza Filistîneke Ereb bide. Di Adara 1941ê de di derheq daxwaza Muftî El Huseynî de, ev peyama sekreterê wezareta karê derve yê Almanyayê Freiherr von Weizsäcker di weşana Erebî ya radyoya Alman de tê belavkirin: "Cihû û Îngilîz dijminên hevbeş ên Alman û Ereban e û Alman û Ereb li himberî wan dijminan hevkarê hev in."

Tam jî di wê demê de Filistînî bi pere û çekên naziyan şerê li dijî Cihû û Îngilîzan, dest bi êrîşên çekdar dikin. Demeke dirêj di ser re derbas nabe Îngilîz pê dihesin ku El Huseynî bi hevkarî û alîkariya Almanan van êrîşan organîze dike û dikevin pey wî. El Huseynî ji Filistînê direve, pêşiyê diçe Lubnanê, paşê diçe Iraqê.

Muftî êdî xebatên xwe bi dizî dimeşîne. Bereha xwe ya damezirandina dewleteke yekgirtî ya Ereb berfireh dike û Iraqê jî dixe nav vê konseptê. Muftî di cotmeha 1941ê de li Bexdayê tê dîtin. Ew bêjerkî qenc e, zîrek e. Bi hin taybetmendiyên xwe dişibe wezîrê karên propagandayê yê rejîma Nazî, Joseph Goebbelsî. Ew bi weiz û gotarên xwe di nava Ereban de Hîtler ji bo rizgariya di bin mêtingehkariya îngilîzan de, dike hêvî.

Li gel Muftiyê Qudsê, li Bexdayê neteweperest û nijadperestekî din ê bi navê Raschid Ali al-Gailanî, heye. Al Gailanî jî bi Nazîyan re di nava têkilîyan de ye û li Bexdayê bi piştgirîya Nazîyan di 2ê Nîsana 1941ê de darbeyeke eskerî pêk tîne. Di 1-2ê hezîrana 1941ê de li Bexdayê tevkujiyek li hemberî Cihûyên Bexdayê pêk tê. Di encamê de 200 Cihû têne kuştin, dikan, kargeh û xaniyên wan tên talankirin. Li ser hewla darbeyê û Tevkujiya Cihûyan hêzên îngilîz ji Besrayê ber bi Bexdayê dikevin rê. Hêzên ezmanî yên Alman bi caran wan bombe dikin, di encamê de hêzên hevkarê Almanyayê têk diçin û hêzên îngilîz digihêjin Bexdayê û Al Gailanî direve Tirkiyeyê ji wê jî di ser Îtalyayê re derbasî Almanyayê dibe.

Îngilîz li Iraqê jî li pey Muftî ne. Rê li wir jî li ber wî teng dibe û dibîne ku ew dê bê girtin, xwe davêje Balyozxaneya Japonyayê ya li Tehranê. Japon û Alman di Şerê II. yê Dinyayê de hevkarê hev in. Muftî demeke dirêj li balyozxaneya Japonî dimîne û piştî hêzên Îngilîz û Ûris dikevên Îranê, bi alikariya Japoniyan di Çiriya pêşîn a 1941ê de xwe digihîne Îtalyayê. Îtalyaya di bin desthilatiya Musolînî de, hevkarê Almanyayê ye û Muftî êdî di ewlehiyê de ye.

Armanca Muftî dîtina Hîtler e

Muftî demeke kurt li Îtalyayê dimîne û axirê digihêje Berlînê. Li Berlînê weke mêvanê taybet ê Hîtler tê qebûlkirin û wilo miamele û xizmet jê re tê kirin. Nivîsgehek jê re tê amadekirin, budçeyek bo wî tê veqetandin.

Muftî El Huseynî piştî çend hevdîtinên bi rayaderên rejîma Nazî re, axirê di 28.11.1941ê de ji aliyê Adolf Hîtler ve tê pêşwazîkirin. Piştî hevdîtina bi Hîtler re, Muftî dertê sefera Balkanê. Ew temamê wan ji Misilmanên Bosna, Arnawudistan, Kafkasya û Qirimê bi navê Handschar -Xencer- 13. Lîvaya SS ava dike û vê lîvayê bi koordînasyona bi ordiya Alman re li Balkanan li gel Almanyayê dixe şer. Li gorî hin agahiyan hejmara Misilmanên li gel Almanyayê şer dikin digihêje 300.000î. Hêza Xencer li Balkanan li dijî Cihûyan û hêzên Tîtoyî li ser navê Rejîma Nazî, şerekî dijwar dimeşîne. Eskerên misilman paşê li hemû enîyên şer beşdarî şer dibin. Muftî jî geh li eniya şer, geh li qad û camiyan, waizan dide, Rejîma Nazî ji bo Misilmanan weke parêzvanekî nîşan dide. Li aliyekî rêgiriya çûna Cihûyên ji şer direvin a Filistînê ye, ji aliyê din ve jî piştî şer bi alîkarîya Nazîyan damezirandina dewleteke Filistîn ku Qudis paytexta wê be, armanca wî ye.

Lê hisabê Muftî û rastîya şer hev negirtin. Di hefte û rojên dawî yên şer de dê ev gotin ji devê Hîtler derketa: "Cîhana Îslamî bi coş li hêviya serkeftina me bû. Me dê bê qasî berjewendî û berpirsiyara me li ser me ferz dikir, ji bo alîkarîya wan her tiştî bikira." Bêguman dema ev gotin ji devê Hîtler derdiketin, ne wî bawer dikir ku ew ê karibe di vî şerî de biserkeve û ne jî ew ê bikaribe alîkariya 'Misilmanan' bike. Rê rojane li ber Hîtler û hevkarên wî teng dibû. Li alîyekî Hêzên Hevpeyman ku Amerîka û Îngilîz serkeşiya wan dikir, li aliyê din Hêzên Sovyetê derbên giran li ordîya Alman dixistin û ji Rojava û Rojhilat ber bi Berlînê ve dimeşîyan. Muftî dawîya şer dibîne û direve Swîsê. Rojek berîya dawî li şer bê, di 8.5.1945an de li Swîsê tê girtin û wî teslîmî Fransîyan dikin. Muftî piştî du hefteyan bi pasaporeteke sexte ji Fransayê der tê, diçe Misrê û xwe davêje Qral Farûqî.

**Rola Muftî di tevkujîya Cihûyan de**

Muftî El Huseynî piştî ku dizivire Misrê jî xebatên xwe yên ji bo damezirandina dewleteke Filistînî didomîne. Di 22ê Îlona 1948an de ji bo Xezzayê serxwebûnê îlan dike. Serxwebûna Filistînê ji aliyê Misir, Libnan, Sûrîye, Iraq, Yemen û Erebîstana Siûdî tê naskirin. Lê serxebûn ji dervayî Filistînê hatiye îlankirin û bêfonksîyon e. Cemal Abdulnasir di 1959an de dawî li vê serxwebûnê tîne û Muftî jî ji Misrê diqewirîne. Muftî li Bêrûdê bicih dibe û di 4.6.1974an de li wê derê dimire.

Navê Mohammed Amîn El-Huseynî ku di dema Nazîyan de weke Muftîyê Mezin hatiye binavkirin, li Almanyayê jî zêde nedihat nasîn. Lêkolîner niha li ser rola wî ya di tevkujîya Cihûyan de lêkolînan dikin.

Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanjahu di axaftina xwe ya di 21ê Cotmeha 2015 de rola Muftî El Huseynî di tevkujîya cihûyan de weke roleke sereke binav kir. Li gorî Netanhahuyî Muftî Hitler ji bo kuştina Cihûyên di kampên Nazîyan de îqna kiriye, da ku ew Cihû rojekê nezivirin Filistînê û li serê Ereban nebin bela.

Divê bê gotin ku van gotinên Netanjahuyî li Almanyayê hatin rexnekirin û heta niha belgeyeke ku vê îdîayê piştrast bike, nehatiye dîtin. Muftî li Almanyayê ne weke kesekî ku Hitler bo tevkujîya Cihûyan îqna kirîye, bêtir weke hevkarekî tevkujîyê tê qebulkirin.

Wêne: Arîşva Federal

# Em ne bi kêrî Kurmancî tên, ne jî ji heqê Tirkî derdikevin

MUSTAFA DOĞAN

Piştî ku di van salên dawîn de xwendin û nivisandina Kurmancî di nav Kurdan de belavtir bû û xaseten piştî nifşê "Artuklu"yê galegal û laqirdiyên li ser rêziman û devokên Kurmancî, çi baş çi xirab, zede bûn. Keç û xortên Kurd, heke ti meseleyeke ku li ser bipeyvîn nemîne jî, dikarin bi sohbeta "Li cem me navê vê, filan e, gelo hûn jê re dibêjin çi?" civatê bigerînin û sebra xwe pê bînin. Her çiqas hin caran ji dubareyê bêhtir bi kêrî tiştekî neyên jî, ji van sohbetan carinan tiştên orijînal jî derdikevin helbet. Mîsal hevalekê rojekê got em ji "sutyen" re dibêjin "memikdank."

Tiştekî din ê muhîm jî heye ku ew jî van salên dawî me gelek mijûl dike û em sere xwe pê dêşînin. Ew jî meseleya "mantiqa zimanê Tirkî ye" ku ketiye nav Kurmanciya me. Ez jî tê de, gelek kesên ku him bi Kurmancî him bi Tirkî rabûne, dema bi Kurdî xeber didin, gelek caran bi mantiqa zimanê serdest qise dikin û ev jî di civat û caxiyan de dibe sedema minaqeşeyan. Mala wan ava, hevalên me yên "Artuklu"yê di vê meseleyê de gelek hesas in. Çi li ser medyaya civakî, çi di dîwan û meclisên dost û hevalan de me hişyar dikin û gotinên me sererast dikin. Hişyariyên wan kêrhatî ne lê carcaran ji isûlê derdixin. Mîsal; em dibêjin "ez çûm malê", dibêjin "Bira wiha nabe, ev 'ben eve gittim'a zimanê Tirkî ye." Weeuuuwww! Ma çawa çêbû malnemîrat!

Lê ez dixwazim behsa meseleyeke berevajî vê bikim. Gelo haya we ji Tirkiya Kurdan, xaseten a Diyarbekiriyan heye? Diyarbekiriyê me hema bêje temamê nuansên axaftina xwe ya Tirkî, ji Kurmanciyê digirin û tevlî Tirkî dikin. Hema bêje hemû biwêjên Kurdî xistine nav tirkiya xwe û hevoksaziya wan jî li gor zimanê wan e eslî ye ku hê jî di nav damarên wan de digere. Mîsal; nabêjin "Ne diyeyim?" dibêjin "Diyeyim ne?" yanî li gorî "bêjim çi?"ya Kurdî çê dikin.

Ez cara ewil çawa li vê meseleyê hay bûm? Tê bîra min, havîn bû. Diya min bi Tirkeke "yerli" ya navçeya me re diaxivî ku cîrana mala bavê wê bû. Diya min di nav sohbetê de jê re got "Welle insanın oralarda sabrı gelmiyor" Yanî xwestibû bêje "li wan deran sebra mirov nayê." Tevî ku min ew dem ti xemên zimên an jî zimanan nedixwar jî vê peyvê gelekî bala min kişand. Min fêm an jî hîs kir ku di vê hevokê de problemek heye. Piştî ku qaşo me xemên lîngûîstîk xwar û Kurdî jî me re bû derd, min bêhtir dîna xwe da ser vê meseleye tabî. Rojekê min jî hevalê xwe re mesaj nivîsî û got; "N'apıyorsun?" wî jî gote min; "Kendimi uzatmışım." Binêrin "Kendime uzanmışım" jî na, "Kendimi uzatmışım" Yanî dixwest bibêje "Min xwe dirêj kiriye" Piştî vê bersivê qalpaxa serê min avêt ji hêrsan lê paşê ev mesele li min rûnişt. Bi taybetî Diyarbekirî, hema bêje bi temamî, bi vî şiklî Tirkî dipeyivin, ev jî nişan dide ku rih û damarên wan hê jî mişt Kurmancî ne belam gotin bi Tirkî ji devê wan derdikevin.

Yek ji yekî din re dibêje "Sana bakınca günahım geliyor." Yanî "Gunehê min bi te tê" ya Kurdî. Radibe ji hevala xwe re dibêje; "Sana bakınca keyfim geliyor." Yanî dixwaze bêje "ku ez te dibînim kêfa min tê" Dayik ji keçika xwe re dibêje rabe filan karî bike lê keçik dibêje "walla kendimde görmüyorum." Yanî "Di xwe re nabînim"a Kurdî. Ya jî nabêje "gidemem", dibêje "edemiyorum gideyim" yanî "nikarim herim" a kurmanciyê. Hewce nake ez "kendime yürüyorum", ango "ji xwe re dimeşim"a Kurdî bibêjim. Nimûneyên vê mijarê pir in tabî. Yanî meseleyeke mantiqê di vir de jî çêbûye ku ev jî têra xwe mirovan aciz dike. Lê ve carê Kurmanciyê tesir kiriye li ser zimanê Tirkî. Nizanim em kêfa xwe pê bînin ku di dil û mêjiyên xelkê vî bajarî de hêj Kurmancî zindî ye? Lê ji ber ku ez jî Diyarbekirî me dilê min dêşê. Çimkî; Em ne bi kêrî Kurmanciyê tên, ne jî heqê Tirkî derdikevin.



# Giringiya karê revenda Kurd û rêxistinên wê yê li derveyî welat

BAWERÊ OMERÎ

Di sedsala nozdeh û destpêka bîst û yekan de, dema ku miletê Kurd pêdiviya wî bi karê rêzanî û bazirganî û danûstandinên herêmî û navdewletî hebû, heger em di wan qonaxan de hejmara Kurdan li derve hemberî hejmara miletên din bipîvin, em dibînin ku di wan sedsalan de hejmara wan li derveyî welat pir pir kêm bû, sedemên wê yekê jî pir bûn, yek jê ew bû ku Kurd li derveyî welatê xwe di nav leşkerên şahinşahiya Osmanî û Sefewî de bûn. Bi gelemperî ji berjewediyên wan desthilatdaran re kar dikirin, derketina wan ne ji bo wê bû ku kar û xebatê ji pirsa Kurd û Kurdistanê re bikin, ji bilî şêx Mahmûdê Hefîd û malbata Bedirxan û bi taybet Bedirxan û neviyê xwe Miqdad Bedirxan.

Di destpêka salên bîstan, sihî, çilî û ta salên pêncî û şêstî ji sedsala bîstan, yek heban xwendevan û xebatkar derdiketin derveyî welat, ji wan Mîr Celadet Bedirxan Kamîranê Bedirxan, Tûreyayê Bedirxan, Memdûh Selîm, Haco axayê Hevêrkî bi hemû endamên komeleya Xweybûn re, Dr Ehmed nafis, Dr. Nûredîn Zaza, Qenatê Kurdo, Mam Celalê Talabanî, Dr Ebdilrehmanê Qasimlo, Ismetê Şerîfê wanlî, Cegerxwîn, Ebdelayê Ishaqî, Izedînê Mistefayê Resûl, Osmanê Sebrî, Hemîdê Derwêş...û xebatkarin din, yên ku li welatên Ewropa rojava û rojhilat, li Şamê, Beyrûtê, Misir, Eman, Bexdayê û Istanbolê sirgun kirîbûn û hinan ji wan dixwendin û çalakî û xebat ji bo pirsa Kurd û Kurdistanê dikirin,

Lê derketina herî balkêş û dîrokî û bi nav û deng di wan salan de, derketina seydayê Mistefayê Barzanî û pêşmergeyên wî ya ber bi Sovyeta berê re ve bû.

Piştî salên şêstî ji sedsala bîstan rejîma Tirk bi mebesta ku herêmên Kurdî di Kurdistana Bakur de ji Kurdan vala bike, hejmareke pir mezin ji karkerên Kurdistana Bakur şandin Almanyayê bo avakirina vî welatî ya ku di şerê cîhanê yê duyem de wêran bibû. Rejîma Tirk wê çaxê ew karkerên Kurd mîna koleyan firotin dewleta Almanya, lê van karkeran ti kar û xebat ji bo pirsa Kurd û Kurdistanê nekirin, ji bilî beşekî pir hindik ji neviyên wan, yên ku hinek karên baş û hêja di vî warî de kirine.

Di salên heftêyî ji sedsala bîstan û vir de ta roja îro, hejmareke pir mezin ji xwendevan û karker û xebatkaran derketin derveyî welat, sedemên derketina wan jî pir bûn.

Beşeke pir hindik ji wan di nav xebata netewî de kar dikirin, yên din pirên wan ti kar û xebat ji pirsa Kurdî re nekirin. Ji bilî ku zikên xwe mezin dikin û bêrîkên xwe jî tije pere dikin û di nav nexweşî û qeyran û kêşeyên civakî de xwe winda kirine. Ew kes li gor pîvanên welatparêziyê, ji mirovên keysbaz û revok û tirsonekan tên hesibandin.

Di destpêka salên heştêyî de ji sedsala bîstan, gelek rêxistinên Kurdî û Kurdistanî li Ewropa rojhilat û rojava, Emerîka, Kanada, Awustraliya, Lûbnan û Misirê xebat û karên netewî dikirin.

Dema em li xebata rêxistin, partî û komeleyên Kurdî û Kurdistanî li ser astê Ewropayê binirxînin, pêdivî ye ku em xebata wan a erênî bi dadî bidin xuya kirin.

Şêweyê wê xebata erênî çi berhem daye? Rev, sirgunkirin, hatin, hebûn û hejmara pir ya Kurdan li Ewropayê, bala hemû dewletên cîhanê kişand ser pirsa miletê Kurd.

Di dema ku her çar dewletên Kurdistan dagir kirine, bi alîkariya saloxger û çeteyên xwe li Ewropa û Emerîkayê dixwestin nav û dengê miletê Kurd ji nerîna giştî re li nav civaka van dewletan bi wêneyekî reş bidin naskirin û bi taybet rejîma Tirkiyê û bi alîkariya hinek ji partiyên Almanan yên ku berjewendiya wan bi rejîma Tirkiyeyê re hene, bi hemû şêweyan hewl dan, navê miletê Kurd têxin nav lîsta reş a gefdar û tirsyaran de (terorîstan de), bi mehna ku Partiya Karkerên Kurdistanê şerê çekdarî li dijî rejîma Tirkyeyê dike.

Ew hewildanên wan dawî hatin cîbicîkirin û di rêka parlemana Almanya û Yekitiya Ewropayê de hate çesipandin û ta dewletên yekbûyî yên Emerîka jî ev daxwaza rejîma Tirk pejirandin ku PKK partiyeke gefdar û tirsiyar e (Terorist e).

Bi mahna wê biryara şaş, hemû Kurd li seranserî Ewropa û Amerîkayê hatin tawanbarkirin.

Helbet mebesta rejîma Tirk ji xwe ew bû ku nehêlin Kurd li ti welatan li cîhanê kar û xebatê ji bo maf û pirsa xwe ya netewî bikin.

Bi standina wê biryarê re, xebata rêxistin û partiyên Kurd li derveyî welat kete aloziyên pir zor û ji bo ku ew ji hevwelatî û desthilata dewletên Ewropayê û bi taybet ya Almanya re teqez bikin ku rêxistin û partî û miletê Kurd ne terorist in, xebatkarên Kurd di rêka rêxistin û partî û komeleyên xwe de dikarîbûn karekî pir hêja li dijî wê biryarê bikin. Ji wan: Her du sê mehan bi rikgirtin û xwepêşandanên mezin li hember balyozxane, konsolxane, nivîsgeh, bargehên nevdewletî, parleman û avahiyên şalyarên hindur û derve, bargehên partî û komeleyan, dezgehên rêzanî û şaredariyan, dadgeh û serokatiya dewletên Ewropayê bi bilindkirina ala Kurdî û sloganan dihatin kirin.

Di her çalakiyê de nameyek li ser rewşa awarte ya ku miletê Kurd tê de dijî û daxwaza mafên wî yên rewa, di wan nameyan de dihate nivîsandin û digihişt destê berpirsên wan dezgehan.

Her weha bi semînerên rêzanî û gelêrî û civakî û bi lidarxistina bîranîn û helkeftin û şahiyên cejna Nûrojê û hevdîtinên taybet di nav van rêxistin û berpirsên desthilatdariya dewletên Ewropayê de, bi wê xebata şev û roj ya bê westan, dawî wan çalakiyan encamên pir bi sûd dane pirsa Kurd li seranserî cîhanê.

Revenda Kurd bi wî karê bi nirx û hêja, di rêka rêxistin û komeleyên xwe de, dikarîbûn ji milet û desthilatdarên Ewropayê re teqez bikin ku ew miletekî aştîxwaz in û propagandaya rejîmên Tirk, Îran, Iraq, Sûriyeyê û hevalbendên wan ya ku me bi gefdariyê (Terorê) tawanbar dike, ne rast e, em xwedî maf û pirs in û em dev ji vê rêkê jî bernadin, ta ku em jî wek hemû miletên li cîhanê azad bijîn û mafên xwe yên netewî bidest bixin.


Belê, revenda Kurd ta astekê dikarîbûn bi erkên xwe yên netewî li sirgunê rabin û berevaniyê di ber pirsa xwe ya rewa de bikin. Ev kar tevî kar û xebatên li hindurê welat têne kirin, pir giring bûn û vê jî hêviyek dida vî miletê qehreman yê ku wê ticarî ji doza xwe ya netewî û xaka welatê xwe neyê xwarê.



# Samet Behrengî êdî wê bi Kurmancî jî bê xwendin!

GÖNÜL GÜN

Hin nivîskaran tenê ne di civaka xwe de, di heman demê de di edebiyata cîhanê de jî deng vedane û berhemên wan bûne mîrateya cihanê. Yek ji wan nivîskaran jî nivîskarê Îranî Samed Behrengî ye. Pirtûkên Behrengî bi qasî zarokan bala mezinan jî dikişîne û berhemên wî bo gelek zimanan têne wergerandin. Wergera Kurdiya Kurmancî ya pirtûkên Behrengî jî hat kirin û di nav wergerên cîhanê de cihê xwe girt. Pirtûkên ku ji weşanxaneya Zanîngehê derçûne, ji hêla Zeynep Yeşilmen ve hatine wênandin. Nivîskar Wedat Urtekinê ku şeş pirtûkên Behrengî wergerandine Kurdiya Kurmancî, di derheqê pirtûkên Samed Behrengî û wergera pirtûkan de ji Heftenameya Basê re axivî.



**Pirtûkên Behrengî bo gelek zimanan hatine wergerandin**

Nivîskar û wergêrê Kurd Wedat Urtekin di sala 1980î de li gundekî Qosera Mêrdînê hatiye dinyayê û nêzikî panzdeh salan e ku mamosteyê werzişê ye. Di 2015an de li Zanîngeha Artukluyê di beşa Kurdolojiyê de lîsansa bilind kiriye û zêdetirî deh salan e ku li ser gotinên pêşiyan, çîrokên folklorîk û wergerê dixebite.

Urtekînê ku pirtûkên Behrengî wergerandine Kurdiya Kurmancî li ser pirsa me ya 'Ji ber çi sedemê te xwest pirtûkên Samed Behrengî wergerînî Kurdiya Kurmancî? Bi ya te cudahî an jî girîngiya pirtûkên Samed Behrengî çi ne?' wiha bersivê dide;

"Çend sedemên vê bersivê hene ku yek jê ev e; pirtûkên Behrengî li temamê cîhanê bo gelek zimanan hatine wergerandin û dema min pirtûkên wî xwendin, tunebûna Kurdiya Kurmanciya wan bala min kişand û min ew yek ji xwe re wek wezîfeyekê dît. Sedema din jî ji hêla naverokê ve çîrokên Behrengî gelekî dişibiyan çîrokên me yên gelêrî. Her wiha meriv dikare gelek sedeman jî lê zêde bike lê ez dixwazim bi tenê vê yekê lê zêde bikim; di çîrokên Behrengî de şîretkariyeke ku xwîner pê aciz bibin û dîdaktîk tûne ango ne beloq e, ev jî çi ji bo kesên mezin çi jî bo zarokan tiştekî erênî û pedagojîk e."

**Keda nêzikî 5-6 salan li ser wergera pirtûkên Behrengî**

Urtekînê ku wergera 6 pirtûkên Behrengî yên bi navê Masîreşê Biçûk, Lawikê Silkfiroş, Xoxek û Hezar Xox, Xewn û Rastiya Rojekê, Çîroka Hezkirinê, Kevokvanê Keçel kirine wiha behsa pêvojaya wergerê dike, "Nêzikî 5-6 salan e ez li ser wergera pirtûkên Behrengî dixebitim. Karê wergerê bi rastî jî karekî zor zehmet e. Nemaze jî çîrokên zarokan, bo ku zarok baş têbigihên divê meriv ji hêla zimên ve dakeve asta wan. Sedema dirêjbûna pêvajoya wergerê ku ewqasî dom kir yek jê ev bû; carinan tiştin hene ji aliyê zimên ve dilê meriv lê rûnanê. A din jî ev bû; tunebûna çavkaniyên ku di wergerê de alîkariya min bikin. Nemaze jî ferhengên îdyom û gotinên pêşiyan ne bi dilê min bûn. Di vê xebatê de ez dîsa li xwe hayil bûm meriv ne hakimê zimanê xwe be ne mumkin e wergereke serkeftî derxe holê. Piştî ku min wergera çîrokan qedand kêşeya xêzkirina wêneyan li pêşiya min bû. Divê wêne him ji hêla estekîkê ve ciwan, bi çîrokê re têkildar û ji destê wênesazekî hoste derketina. Xatûn Zeynep Yeşilmen jî ew kêşe ji ser milên min hilgirt û wek di pirtûkan de jî xuya dibe di encamê de karekî profesyonel niha li ber destê xwîneran e."

**"Bila xwîner bertekên xwe bînin ziman"**

Her çiqas wergerên pirtûkên Behrengî nû bin jî em dîsa meraq dikin û dipirsin, 'Gelo bo wergerên pirtûkên Samed Behrengî, ji niha ve ji raya giştiya ya Kurdan bertekên çawa tên? Urtekin wiha dibersîvîne, "Ji ber ku pirtûk nû çap bûne û li temamê pirtûkfiroşan nehatine belavkirin û vê gavê tenê li pirtûkfiroşên onlîne dikarin bêne bidestxistin, em nikarin nirxandineke giştî di derheqê raya giştî de bikin. Encax di wan 5-6 salên ku ez li ser wergerên Behrengî dixebitîm de, çi xwînerên zarok çi jî xwînerên bi edebiyatê re têkildar bertekên baş nîşan didan. Ez dixwazim bi alîkariya Basnewsê, li vir bang li hemû xwînerên ku wê pirtûkên Behrengî bixwînin daxwazekê bikim ku bila bertekên xwe, erênî an jî neyînî, bînin ziman û nîşan bidin da ku em karibin wergerine baştir derxînin holê."

**"Wergera pirtûkên zarokan tecrûbeyeke hêja ye"**

Dîsa li ser pirsa me ya 'Li gorî dîtina te wergera berhemên zarokan tecrûbeyeke çawa ye û zehmetiyên wergera pirtûkên zarokan hene yan na? Urtekîn wiha diaxive, "Werger bi xwe karekî pir zehmet e. Wexta ku mijar dibe wergera pirtûkên zarokan ew zehmetî bêtir dibe. Lê divê ez vê yekê jî bibêjim ku wergera pirtûkên zarokan tecrûbeyeke hêja ye jî. Ji ber ku wexta meriv wergerê dike, hesasiyeta famkirin û herikbariya wergerê wek erkeke pîroz li cem meriv e. Ev zarokên wê bi wergerê dest bi xwendin û hînbûna Kurmancî bikin timî di bala meriv de ye. Îcar ku te Kurmanciyek zelal û fambar bikarneanîbe û tenê wergera motamot ji xwe re kiribe armanc ne mimkûn e ku dilê wî zarokî li Kurmancî û xwendinê vebe. Belkî ev gotin bibe dubare lê divê meriv hakimî Kurmanciya xwe be û tim guhekî wî li civakê û li gotinên kal û pîrên xwe be."

Herî dawî nivîskar û wergêr Wedat Urtekin van tiştan dibêje, "Ji bo vê derfeta ku we daye me ez dixwazim berî her tiştî spasiya we bikim û ji xwînerên Basnewsê re jî serkeftinê dixwazim."

## Dîlber Haco...
# Pênûsa li paş stranên Ciwan Haco ya weke çiyayekê

NÛJÎN ÖNEN

"Emina, Emîna Nazdar û şêrîn e/ Bejna te rengîn e Rûyê te zêrîn e / Îro tu ji min dûr ketî yarê / Çavê min te nabîne." Destpêka helbestvaniya Dîlber Haco jî û destpêka hunermendiya Ciwan Haco bi vê helbesta xwişka wî Dîlber Haco dest pê kir. Ew stranên ku bi dengê Ciwan Haco li ser lêvên bi hezaran kesan e weke "Gulek, Gula Zer, Nîsêbîna Rengîn û Felek" helbestên xwişka Ciwan Haco ne. Ew jin, Dîlber Haco ye ku bi helbestên xwe wekî çiyayeke li paş birayê xwe ye. Dema em behsa Ciwan Haco dikin û dibêjin yek ji stûnên muzîka Kurdî ye divê em keda Dîlber Haco jî bibînin. Stranên ku heta niha Ciwan Haco gotine gelek jê helbestên xwişka wî ne. Di demeke nêz de pirtûka helbestan a Dîlber Haco ji 29 helbestan pêk tê bi navê "Emîna" ji weşanxaneya Avesta derket. Dîlber Haco ji Heftenameya Basê re behsa pirtûka xwe, malbata Haco, têkiliya wê û Ciwan Haco û muzîka Kurdî kir.

**"Malbata me belawela bû"**

Malbata Haco yek ji malbatên mezin e ku di warê siyasî û hunerî de di dîroka Kurdistanê de cîh girtiye. Dîlber Haco destpêkê behsa malbata xwe dike û wiha diaxive, "Malbata Haco bigeha xwe ji Bakûrê Kurdistanê digire, ji navçeya Mêrdînê ji Midyadê ne. Bapirê min li wir bû, pey re derbasî Rojava bû, dema bapîrê min derbasî Rojava bû bavê min 2 salî bû. Ji ber dewleta Tirkiyeyê derbasî wir bûn, bapîrê min dixwest şoreşekê li Bakûr çêbike lê mixabin Kurdên me wê demê jî nebûne yek û mecbûr mane ku bi eşîra xwe derbasî Rojava bibin û li wê derê bicîh bibin. Malbateke mezin e lê belawela bûn. Piştî ku şoreşa Barzanî çêbû, ji ber ku xwe nêzîkî şoreşê dikirin, alîkarî filan dikirin, vê carê jî dewleta Sûrî malbata Haco êşand. Gundê wan ji wan standin, 23 gundê wan hebûn, hemû ji wan standin. Wê demê dema dewleta Fransî li Sûrî bû ew gund dabûn kalikê me Haco. Dema malbata Haco nêzî şoreşa Barzanî bû ew gund hemû ji wan standin. Hemû koçberî Ewropa kirin, hin çûn Almanya, Swêdê, Amerîka em li Norwêçê bi cîh bûn, li gelek cîhan belav bûn.

**"Malbata me bi hunerê re girêdayî ye"**

Dema ji malbatekê nivîskar, helbestvan an hunermendek derdikeve mirov meraq dike ka çi bûye sedem ku berê xwe bi hunerê vekirine. Malbata Dîlber Haco têra xwe hunermendê wan hebûne. Helbestvana Kurd wiha behsa malbata xwe dike: "Bavê min bi xwe li tembûrê dida, dema dihat malê radihişt tembûra xwe û lê dida, me jî lê guhdar dikir. Kêfa me hemûyan jê re dihat. Birayê min Naîf, yê ku şehîd bû, wî jî li tembûrê dida, her wiha birayê min Nûreddîn xwişka min a biçûk Perwîn ew jî li tembûrê dide heta niha ew jî li Norwecê dijî. Ciwan jî bû dengbêj û min jî helbest dinivîsandin. Bi alîkariya helbestên min jî bû dengbêjekî Kurd. Malbata me bêhtir bi hunerê re girêdayî bû."

**"Bûyerên civakî bandorê li hunerê dikin"**

Bûyerên ku tên serê mirov an ên ku li welêt, li civakê û li Kurdistanê rû didin, ez wiha dinivîsim hestên xwe û ew daxwaza nivîsandinê jixweber tê. Min helbestên şoreşgeriyê jî û yên evîndariyê jî nivîsandine. Çi dengbêj be çi nivîskar be çi jî helbestvan be, bandora bûyerên di civakê de diqewimin li hunera mirov dike. Mesela bûyerên ku li Rojava çêbûn, li ser vê min helbest nivîsand weke ku ew gotin berê di serê min de amade bûn, ya Kobanê ya Şingalê ser tevan jî min helbest nivîsandin. Mesela Zîlan dema xwe feda kir û şewitand, Geliyê Zîlan min li ser wê nivîsand, Diyarbekir Mala Min e jî min nivîsand ev hemû ji bandora welatekî bindest ku li mirov dike. Min helbestek li ser birayê xwe yê ku şehîd bûye nivîsand, Nisêbîna Rengîn jî min nivîsand, ev hemû rastiyên me ne ku min jiberxwe nivîsandine."

Helbestvana Kurd di derbarê pirtûka xwe ya ji weşanxaneya Avesta derketiye de wiha diaxive, "Pirtûka min a helbestan a bi navê Emîna ji weşanxaneya Avesta derket, ji 29 helbestan pêk tê. Emrê min ji 17 salî biçûktir bû dema min dest bi nivîsandina helbestan kir. Navê pirtûka min ji ber vê ''Emîna'' ye; helbestaka ku min pêşî nivîsand Emîna ye. Ciwan jî strana ku pêşî straye Emîna ye. Him destpêka hunera min bû him jî ya Ciwan bû, ji ber wê me biryar da ku em navê wê bikin Emîna.

"Di albûma nû ya Ciwan ku dê derkeve de 2 helbestên min hene"

Helbestên Dîlber Haco yê ku Ciwan Haco weke stran distrê niha li ser lêvên bi hezaran kesan e, vê rewşê bandoreke çawa li we kiriye? Dîlber Haco wiha behsa hestên xwe dike: Hesta min a li hember vê rewşê, dema ez lê dinêrim dibêjim min tiştekî baş kiriye. Ji ber wê jî Kurdên me him ji stranên Ciwan hez dikin him jî ji helbestên min hez dikin. Dema ez vê dibînim bêhtir dixwazim binivîsim. Di albûma nû ya Ciwan ku dê derkeve de 2 helbestên min hene, dîsa yek jê gelekî kevn e navê wê Nesrîn e, ya din jî min niha nivîsandiye navê wê Hevala Min e, li ser welat e lê min navê wê kiriye Hevala Min.






CIWANMERD KULEK

## Kuştina Mehemed Xanê Mîrê Hezoyê

"Ferman e, ferman e, fermana mîrên Kurdan e!"

Di navbera paşayên Osmanî û Mîrên Kurdan de hin bûyerên girîng, di sefera Sedrezam Xusrew (Husrev) Paşayê Boşnakî ya ser Bexdayê ya salên 1630-31ê de rû dane. Xusrew Paşa kesekî gelek zalim, zordar û xwînrêj bû. Behsa sefera wî berfirehtirîn di Tarîxa Naîma de heye.

Di seferê de gelek mîrên Kurdistanê, serwer û serokên eşîrên serhedan tevlî seferê bûn; mesela Mîrên Hezoyê Mehemed Xan û Îbrahîm Xan, Mîrê Îmadiyê Seyid Xan, Hakimê Soran Mîre Beg, Hakimê Sirûcê Tîmûr Beg, Mîrê Reqayê Mîr Mehemed. Kurdên Bacelanê yên berriya dora Bexdayê, bi 40 hezar esker tevlî seferê bûn. Wan ji 30 hezarî bêhtir pez wekî diyarî anîn pêşkêşî orduyê kirin.

Ji Mûsilê pê ve ji ber baran, lehî û herriyê sefera Bexdayê hat paşdexistin, sefereke ser Kurdistana Îranê li dar ket. Seranserê Erdelan tê de, gelek deverên Kurdistana Îranê heta Hemedanê û hidûdê Loristanê, hin bi aştî, hin jî bi şer gihîştin Dewleta Osmanî. Hin bûyerên giring jî di navbera Mîrên Kurdan û paşayên Osmanî de rû dan. Yek ji wan jî kuştina Mehemed Xanê Mîrê Hezoyê (Sasonê) ya bi bêbextî ye.

Pişt re, ku sefera ser Bexdayê bi ser neket û Xusrew Paşa vegeriya heta Mûsilê û Mêrdînê, safewiyan ew deverên Kurdistanê yên ku xwe tabiê Osmanî diyar kiribûn paş de standin. Li wê derê îja Mu'min Xanê kurê Helo Xanê Erdelanî bi tohmeta ku jidil xwe bi Osmaniyan ve girêdabû hat kuştin.

Gava Xusrew Paşa gihêşt Serabada Derbendê, bûyereke bêbextiyane rû da; Begêbeganê Diyarbekirê Xalicizade Mistefa Paşa tevî eskerê xwe berpirsiyariya qereqoliyê lê hatibû sipartin û Mîrên Hezoyê Mihemed Xan û Îbrahîm Xan her du mîrên Hezoyê jî her bi eynî berpirsiyê bi Xalicizade Paşa ve hatibûn bestin.

Mehemed Xan, xwedan mîrekiyeke mîrasî bû. Tevî ku pirraniya Mîrên Kurdan xwediyên yek tuxê, muhteremtirînên wan, yên duduyan bûn, ew xwediyê sê tuxan bûn û xwe di ser gişan re digirtin. Begêbeganên Osmanî jî du tûx hildikêşan.

Loma, hevrikî ketibû navbera wî û Xalicizade. Paşa dexesî li Mehemed Xan dikir û her gav fesadiya wî li ba sedrazam dikir, digot "vî merivî xwe bi xwe payeya wezîrtiyê daye xwe, ew naçe nobeta qereqolê, ya ku ew bi xwe nexwaze nake, îtaetê fermana we ya şerîf nake, gava hûn ji vî welatî biçin ê bibe bela serê me."

Li gor Naîma, Mehemed Xan, begekî Kurd ê bikibr û azamet bû. Bi hêza mal û rutbeya xwe û pirraniya eskerên xwe navdar bû, her ku dihat nik sedrezam feraceyên reş ên ji kurkên semûran li xwe dikir, li pey wî şatir, çuxadar û wezîrên din bi meriv û maiyeta xwe bi awayekî muhteşem dihat, fikra xwe bêtirs digot û diparast, doza mezinatiyê dikir. Ji ber vê, sedrezam lê ket gumanan.

Heta rojekê sedrezam li dîwanê tehn lê dan got ''çima tu wexta ji bo qereqolê têyî tayinkirin, tembeliyan dikî naçî? Eger ez careke din bibihîzim tu li ber Xalicizade radibî ez ê te bikujim."

Mehemed Xan aciz bû. Wî qatiliya Xusrew Paşa baş dizanibû. Rojekê dikaribû ew bikuşta. Loma Mehemed Xan êdî zûbizû nema çû dîwanê. Ku dihat jî li bin kurk an ebaya xwe çekê xwe yê binçengan û xencera xwe vedişart.

Li ser fesdiyeke din a Xalicizade, sedrezam şand, got ''Zu herin hakimê Hezoyê bînin."

Mehemed Xan bêtirs çû otaxa sedrezam. Sedrazam bang kir, got: ''Cellad!"

Ku ev got, Mehemed Xan êdî ji canê xwe buhurî, şûr ji bin çengê xwe kêşa, xwe avêt ser sedrezam, hemleyek avêt serê wî. Sedrezam li bin stûna otaxê li ser kursiyekî rûniştibû. Kedxuda Suleyman Axa xwe avêt ber wî, destê xwe da ber şûr, xwe kir sîper.

Şûr hersê pêçîkên kedxuda firandin, pişt re li stûna otaxê ket, qelemkî stûn kir du perçe. Sedrezam ji ser kursiyê xwe paş de avêt.

Ji axayên enderûnê yekî ji pişt re pêhînek li Xan da, ew paşpaşkî xist xwarê. Yên li wê derê, bi hev re xençer kêşan, xwe avêtin ser Xan, ew perçe perçe kirin, avêtin ber otaxê.

Meger li gel Xan çend merivên wî hatibûn da li gel têkevin hindurê otaxê, di pevçûnekê de wî biparêzin. Lê ew li derve mabûn. Heta laşê Xan avêtin ber derî û ew pê hesiyan, merivên sedrezam xwe gihandin wan, ew jî perçe kirin. Sedrezam meriv şandin hemû malê Mehemed Xan misadere kirin.

Roja din orduya Osmanî çû newala Şêx Eyyar danî. Sedrezam, xeber şand Xalicizade da anîn, serê wî jî jêkir.

Sedem jî ew bû ku kuştina Mehemed Xanê hezkirî, di nav beg û mîrên Kurdan de bûbû ciyê hêrs, tirs û metirsiyê. Nema bi fedakarî xwe dan têkoşînê. Sedrezam metirsî ku ew ji esker veqetin, hela hela xwe bidin aliyê Îranê felaketekê dê rû bidaya. Herkesî dizanî ku yê ku bûye sedema kuştina Mehemed Xan, Xalicizade ye, eger ew bihata kuştin belkî kîn û nefreta Kurdan daketa. Li gor Naîma kuştina Xalicizade kîna Kurdan daxist, bîhna wan anî ber wan û ew tehdîda ku ji kurdan bê hat rakirin.

Bi vî awayî dawî li vê zincîrenivîsara me ya li ser dewreke taybet a krîza desthilatdariya Osmanî 1600-1632), vekişiyana Osmaniyan ji ber êrîşên Îraniyan û hevrikiya paşayên Osmanî û mîrên Kurdan hat. Di vê dewrê de Kurdan ne tenê serê gelek mîrên xwe dane, welatê wan jî di navbera du dewletên mezin de perçe bûye.

Behmen Ghobadi:

# Referandûm ne meseleya Barzanî, meseleya hemû Kurdan e

NÛRÎ BÊXALÎ - CESÎM ÎLHANÎ - EHMED BEROJÎ

**Niha di rojeva Kurdan û herêmê de referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê heye. Hûn him wek hunermendekî û him jî wek Kurdekî li ser vê mijarê çi difikirin?**

Tevî hemû rexneyan û kêmasiyên heyî jî, ez piştgiriya referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê dikim. Nabe ku mirov bi sedemên şexsî û siyasî li vê meseleyê binêre. Ev ne meseleya Barzanî, meseleya hemû Kurdan e. Min dixwast her du navên bihêz hebûna. Weke şexsî ez gelek rêzê ji Mam Celal re digirim. Lê gelek kêmasiyên hemû partiyan hene. Van partiyan di çarçoveya çand û hunerê de gelek neheqî li Kurdan kirin. Îranê jî ji bo çand û hunera Kurdî hin tişt kirin lê wan nekirin. Dema ku me li raboriyê nêrî, em ê bibînin ku me gelek şaşî kirine. Lê hin tişt bi dest ve hatin. Mîna Şingal û bajarên din em weke miletekî mazlûm hatin nasîn. Piştî vê mazlûmiyê em weke miletekî ku bi şer mafên xwe bidestxistin, hatin nasîn. Bajarên me dikevin, em dibêjin Bijî Kurdistan... Bi vî awayî mirov bi xwe tinazan dike. Êrişî te dikin tu jî bi wî awayî mafên xwe bidest dixî. Bijî, bijî, bijî...şaşî bû ku em bêjin me ew qas şaşî kir. Kurdan di meseleya referandûmê de şaşî kirine. Ji bilî Kak Mesûd ne diyar e ka kî di nava vî karî de ye. Tendûristiya Mam Celal baş bûya, wê her duyan bi hev re ev kar birêve bibirana. Niha em nabînin ka kî vî karî dike. Ji ber vê yekê ez piştgiriya referandûmê dikim: Şerê li dijî DAIŞê nîşanî me da ku eger êrişî Şieyan bikin, şie dikarin biçin Îran û Libnanê, êrişî Sunneyan bikin, Sunne dikarin biçin welatên Sunne, lê eger êrişî Kurdan bikin deverek nîne ku Kurd biçinê. Ev pêdiviya tiştekî nîşan dide. Ew jî; divê Kurd xwedî mala xwe bin.

**Hûn agahdarê dîroka nêz û kevn a siyasî ne heta Ewropayê jî. Hindî ev mal ava nebe, netew pêk nayê. Bêyî hebûna dewletê hûn dikarin bêjin wê pêk werin? Ango ji bilî dewletbûnê riyeke din heye ku Kurd hebûna xwe biparêzin?**

Beriya niha jî min anî ziman, partiyên siyasî ji bo maleke xeyalî şer dikin. Niha lingên Kurdan negihêne erdê. Ji ber ku em ne xwediyên xwe bi xwe ne. Heta niha her demê yek bûye xwediyê me. Me welat rizgar kir, Amerîka wekîlê me ye, nizam Amerîkayê çek dan, bijî Amerîka, bijî Bush û hwd. Wiha nabe. Birayê min weke Kurdekî te bingeha wê daniye, te xwîna xwe rijandiye. Divê em bi aqilane tevbigerin û kur bifikirin.

**Tecrûbeyên siyasî yên cîhanê nîşanî me didin ku dewlet ji aliyê netewan ve ava bûne, yanê netewdewlet pêk hatine. Hûn li ser vê mijarê çi difikirin?**

Ev mal di rastiyê de niha nîn e. Xweziya ev partî bûbane yek û ev mal ava bikirana. Divê avahîsazê malekî hebe, ne 2 an 4. Avahîsaz jî wê xwedî tîma xwe be. Ev avahîsaz Mesûd Barzanî ye, ji bîlî wî niha ez yekî nabînim. Divê em vê malê ava bikin û divê avahîsazekî wê hebe. Divê em vê malê ava bikin û di mala xwe de şer û niqaşên xwe bikin. Dema ku mal diyar bû, bila her bizanibe ku malek heye û di wir de jî şer heye. Lê ka mal? Nizam li kîjan kûçeyê, li kîjan taxê! Niha taxeke Kurdan nîn e. Divê ewilî ev hebin. Min ji Goran, PKK û YNKê re jî gotiye ku eger mala we hebe, dengê we wê were bihîstin. Niha ez sed salên din jî Hikûmeta Kurdistanê rexne bikim, tu kes dengê min nabihîze. Ji ber ku niha em ne xwediyên mala xwe ne, em li ser axa xwe bi awayekî serbixwe ne serwer in. Divê ewilî em mala xwe ava bikin. Gelek sîtema min heye li hemberî Barzanî. Ez hatim Herêma Kurdistanê bo pêkanîna şoreşeke çandî. Lê dengê min nehat bihîstin. Ev rexneyek e. Ez penaberekî sembol ê Kurd im. Ev 9 sal in ez penaber im û cefa dikişînim.Ez ne karsaz im û mirovekî hestiyar im. Sîtema min heye lê divê teqez em vî welatî ava bikin û divê em hemû deng bidin. Rewşa Kurdistanê weke keştiya Nûh e û di nava çar qefesan de ye, hewldana rizgariya ji van qefesan dide. Baraneke xurt û pêlên deryayê yên mezin tên ser keştiyê, divê serokê keştiyê, keştiyê bigihîne cihekî ewle. Piştî ku Kak Mesûd em gihandin wî cihî, bila jê re bêjin, 'êdî bila li şûna te yekî din serokatiya keştiyê bike'. Divê em bi awayekî erênî li meseleya DAIŞê binêrin. Îran dibêje, 'me nehêla DAIŞ, têkeve Kurdistanê', lê ez jî berovajiya wê dibêjim, 'DAIŞ bi saya Kurdistanê berê xwe neda Îranê'. Ev rastiyeke girîng e. Ez dixwazim ji Îran û Tirkiyeyê re bêjim ku eger cîran û dostekî we yê pêbawer hebe, ew jî Kurd in. Ka em li dîrokê binêrin; Kurdan êrişî kê kiriye, destê xwe dirêjî axa kê kirine, dijminatiya kê kirine? Bila ev welat li derdora xwe binêrin ka kî ye dostê wan. Bi rastî jî Kurdan dijminatiya tu kesî nekirine. Ji bilî Kurdan gelek dostên min ên Faris û Tirk hene. Rêza me ji herkesî re heye. Divê pencereya Kurdî jî ava bibe û Kurd bên zanîn. Kurd nayên naskirin.

**Hikûmeta Herêma Kurdistanê, tê rexnekirin ku ji bo referandûmê li Ewropa, DYA û qada navdewletî de amadekariyeke zêde di warên siyasî û çandî de nekiriye. Hûn çi difikirin li ser vê mijarê?**

Kêmasiyên hemû partiyan hene, nemaze jî yên hikûmetê... Divê em qumareke mezin bileyîzin, Kurdan tim qumarên koletiyê lîstine. Ji bo tiştekî biçûk zû razî dibin. Malên wan, bajarên wan hatine girtin, ew dîsa bi destxistina wan kêfxweş dibin. Bi gokeke plastîk li qadeke biçûk dilîzin û baweriya wan bi wê nîne ku dikarin di qadeke futbolê ya mezin de bilîzin. Baweriya Kurdan bi wan nîn e. Eger baweriya wan bi wan hebûya wê encam derketa holê. Dibe ku min rexne bikin, lê ez li dijî Kurdistana mezin im. Min nameyek ji Kak Mesûd re şand ku niha hê jî di destê min de ye. Min di wê nameyê de got li Îranê binêrin ku çawa destê xwe dixe nav karên wan û bandorê li ser Iraq, Lubnan û Sûriyê xebatên çawa dike û aboriyeke çawa xerc dike. Em weke Kurdan dest û lingên me hatine girêdan, divê em hişyar bin. Em ji aliyê 4 hikûmetan ve hatine dagir kirin. Divê em xwe li Îran, Iraq, Tirkiye û Sûriyê bihêz bikin û divê haya me ji hev hebe. Ji ber wê yekê niha pêdiviya Kurdan bi welatekî mezin nîne. Divê Kurd li her çar beşan cihên xwe bihêz bikin. Kurdistana Iraqê vê carê bo armanceke mezin di şer de ye. Divê em dîwaran rûxinîn û dengê xwe bigihînin. Zimanekî me yê navdewletî nîne, kêşeya me nebûna wêjeyeke me ya mezin e. Kêşeya nebûna hunereke me ya mezin e. Li Googleyê lê bigerin, hûn 5 fîlozof an helbestvanên Kurd nabînin. Ji ber ku me nexwastiye. Wek Kurdekî ez şerm dikim, lê digerim partiyan dibînim. Hûn dibêjim Yaşar Kemal, Yılmaz Guney kî ne, dibêjin Tirk in. Ez derhênerekî Kurd im, li Îranê dixwazim weke Kurd min nas bikin lê nabêjin, eger welatê te, dewleta te nebe nabêjin. Ez nikarim li ser navê Kurdistanê beşdarî Oscarê bibim, ji ber ku dewleta min nîn e. Xeletî û kêmasiyên xelkê jî hene, divê em karên mezin bikin. Xelkê me naxwîne. Divê em bi heqê xwe bi navê welatê xwe xwe bihêz bikin.

**Yanê ji bo van karan divê serwerî û desthilateke ku sînorên wê diyar hebe?**

Gelek televîzyonên me hene, lê qet yek jî ne navdewletî ye. Televîzyonên heremî yên van deran bi qasî Rûdaw û NRTê pereyan xerc nakin lêbelê dewlet û dengê wan heye. Dema ku ragihandina te bihêz be, welatê te hebe, hunera te jî wê bihêz be. Niha em bê mal in, dema ku maleke me ya biçûk jî hebe, tu dikarî li wir jiyaneke mezin ava bikî. Pergal tune ye. Pergalî van tiştan pêk tîne. Niha sîstema Hikûmeta Kurdistanê nîn e. Katar û Îmaratê jî karîn sîstemên xwe ava bikin. Divê em jî sîstema xwe pêk bînin.

**Eger dewlet nebe, dezgehek nebe, sîstem wê çawa pêk were?**

Xwedîpergalî bi çandê ve girêdayî ye, çand jî mirov terbiye dike. Mirov jî dikare bi demê re hêzeke hunerî ava bike. Behmenek dibe ku bibe 100 Behmen. Divê ev ji bo mafên xwe rexneyan arasteyî hikûmet û parlamentoyê bikin. Ev deng wê hêzekê, hişmendiyekê pêk bîne. Rexne, bihêztir dike.

**Dema ku dibêjin Sînemaya Kurdî, yekem kesê tê bîra mirov Behmen Ghobadî ye. Fîlmên we jî bi piranî li ser sînoran e.**


Dema we got Kurdistan, sînor deng didin. Dema ku Kurdistan ava bû, miletê Kurdistanê, Sînemaya Kurdistanê, rewşa Kurdistanê, Muzîka Kurdistanê ev hemû wê bihêztir bibin. Sînor wê her hebin, sînor û kêşe wê her berdewam bikin. Bi rehetî ev kêşe ji nav naçin û dema ku welat ava bû jî wê ev dewam bikin. Kurd di nava 3 welatan de ne û kêşe wê berdewam bikin. Lê eger Başûrê Kurdistanê serkeftî be, wê alîkariya Rojhilatê Kurdistanê bike. Dema ku Îranê birayên me yên Kolber kuştin, dewleta Kurdistanê wê van ji cîhanê re ragihîne. Sînor ne tenê fîzîkî ne, sînor zîhnî ne, olî ne, îdeolojîk in.

**Tê gotin ku we ji bo sînemayê tiştên xwe yên malê jî firotine, rast e gelo?**

Na. Ez dixwazim hin tiştan bêjim. Ji salên 2000an heta sala par ez li Hewlêrê bûm. Hevalekî PKKyî got, PKK ji te hez nake ji ber ku tu li gel Barzanî yî. Hevalekî YNKyî got, em dilmayî ne, ji ber ku tu li gel Barzanî yî. Min jî got ez ji Îranê yekser hatime Hewlêrê. Ez di wê baweriyê de bûm ku Îran dikare bi hêsanî xwe bigihîne Silêmaniyê, ji ber wê yekê ez li Hewlêrê bicih bûm. Ji roja ez çûme wir heta roja îro, ji bo 4-5 fîlmên min alîkariya min kirin. Bi tevahî bi qasî milyonek û 150 dolaran alîkariya darayî bo fîlman kirine. Ne xaniyê min çêbûye, ne jî mitroyek arseya min. Ez dizanim ku em tazî hatine û em ê tazî biçin. Niha ez di rewşeke xirab de me. Ewqas karsazên me yên Kurd hene, hikûmeta me heye, tu kes li me napirse. Ev heftiyeke ez li nexweşxaneyê me, tu kesî li rewşa me nepirsî. Ji bo fîlmên xwe ez nikarim pere bo hatinûçûnê peyda bikim. Îranê zilm li min kir, Hikûmeta Kurdistanê zilm li min kir, ez nabêjim bi qasî wê bû ew zilm lê zilma ku Kurd bike mirov dêşîne. Min bi zimanê Kurdî fîlm çêkir, li deriyê me nexistin. Ne ji bo min, li wir 50-60 helbestvan û lîstikvanên me hebûn. Ez weke kesekî penaber 500 caran li Hikûmeta Kurdistanê geriyam, tenê bersivek dane min ku ew jî naveroka wê vala bû. Ev kêşeyeke min e bi Hikûmeta Kurdistanê re. Tevî van hemû êş û azaran jî, ez ji bo referandûmê dibêjim 'Erê'. Lê ev 'Erê' ya min bi êş e.

## Dema ku Komkujiya Roboskiyê rû da, hatin gotin ku fîlmê Behmen Ghobadî yê Dema Hespên Serxweş bû rastî. Nêrîna we çi ye li ser vê yekê?

Îranê heftiya borî du hembajariyên min kuştin. Kolber weke Kurdan e. Kolberên îro, mina Kurdekî Stenbolê ye. Kurdan her tim kolberî kiriye. Eger Hikûmet û partiyên siyasî wan riyan bikin asfalt, pêwîstî pê namîne ku Kolberiyê bikin. Kurd bi hêştiran derketine pêş, di warên sînema, siyaset û kar de jî bi hêştiran derketine pêş. Ez çima bi Tirkî û Erebî fîlman çêbikim? Me ji bo fîlmê Alan Kurdî 200 hezar dolar nedîtin. Niha Îran hewl dide ku alîkariya me bike, ev ji bo Kurdan şermek e. Çima ev bi navê Tirkan, Farisan derkeve. Çima Kurdên ku dibin şampiyon bi navê Tirk û Îranê derdikevin, tên nasîn? Ji ber ku welatekî me, dewleteke me nîn e. Ez bimirim nabêjin sînamegerê Kurd, wê bibijên sînemagerê Îranî. Ez dixwazim li Kurdistanê bimirim û eger ez bizanibim ku welatekî bi navê Kurdistanê hatiye ava kirin û qebrê min jî li wir e, ez ê kêfxweş bibim. Bila êdî trajedî û romantîzm biqede bo Kurdan. Divê em bi aqilane tevbigerin.



Derhênerê Kurd Behmen Ghobadî ku bi fîlmên xwe yên li ser sînoran tê nasîn, heftiya derbasbûyî li Stenbolê bû. Em bi Ghobadî re li ser referandûma serxwebûna Kurdistanê û têgeha 'sînoran' axivîn. Ghobadî piştgiriya xwe ji bo referandûmê ragihand û her wiha diyar kir ku projeyên wî hene li ser serxwebûna Kurdistanê.

## Kurdistan niha ber bi serxwebûnê ve diçe. Li ser vê mijarê çi projeyên we hene?

Min du pirtûk qedandin ku ev 4-5 sal bû min kar li ser dikir. Ez ne romanûs im lê ji ber ku romaneke me ya navdewletî nîn e, ez tim xemgîn bûm û min ev rewş bo xwe kire derd. Niha eger yekî Ewropî, Amerîkî, Îngîlîzî an jî Japonî bixwaze li ser Kurdan tiştekî bixwîne wê çi bixwîne? Pirtûk hemû di warên lêkolînî de ne û xwînerên vî warî ne zêde ne. Romana me ya Kurdî nîn e. Min li ser Kurdan du roman nivîsîn û ez ê bi zimanê Îngîlîzî belav bikim. Lê beriya wê li Amerîkayê 2 projeyên me yên fîlm hene û eger ez wan biqedînim, heta 2-3 mehên din weke derhênerekî Kurd ez ê pirtûkên xwe belav bikim. Li ser serxwebûna Kurdistanê 2-3 projeyên min hebûn. Fîlmekî girîng hebû ku ev 5 sal e ez li ser dixebitîm lê pêk nehatiye, mijara fîlm gelek girîng e. Li ser zilamekî ku dixwaze di şerê Kurdistanê de li ser 10 hezar metrekareyan welatekî ava bike ye. Ji bo referandûmê jî xweziya hêza min zêdetir hebûya. Piraniya hevalên min Îranî ne. Li ser Twitterê Omîd Kurdistanî heye ku nîv Kurd e. Li ser Youtubê Salarî Kemanger heye ku ji Sinê ye. Piraniya înterneta cîhanê di destê hin Îraniyan de ye. Ez beriya niha bihatama nas kirin, wê di Twitterê de dengvedaneke mezin çêbûya. 5-6 derhêner û lîstîkvan ên nasên min hene ku dibe di rojên pêşiya me de piştgiriya xwe ragihînin.




## Behmen çima di vê roja dîrokî de ne li Kurdistanê ye?

Ji ber ku nasnameya min a Kurdî nîn e. Eger mafê min ê dengdanê hebûya ez ê li wir bûma. Lê di vê qonaxê de dengê min li der ve wê bibandortir be. Li derve ez ê ji medya Tirkî re, ji BBCyê, ji medya Farisî re biaxivim. Dibêjin Kurdistan wê bibe Îsraîla duyem. Ez ê ji wan re vebêjim ku ev ne rast û ne wiha ye. Ez ê ji wan re bibêjim ku em ne dijmin lê em dostên hev in. Min dît ku girîngiya fîlmên min li Kurdistanê nehat dîtin. Ez jî dê bi Îngîlîzî, Çînî bi zimanê Hîndî fîlman çêbikim. Bi vî awayî wê dengê min wê bilintir û bihêztir be. Lê dîsa wê fîlm li ser Kurdan bin.

Xwedîpergalî bi çandê ve girêdayî ye, çand jî mirov terbiye dike. Mirov jî dikare bi demê re hêzeke hunerî ava bike. Behmenek dibe ku bibe 100 Behmen. Divê ev ji bo mafên xwe rexneyan arasteyî hikûmet û parlamentoyê bikin. Ev deng wê hêzekê, hişmendiyekê pêk bîne. Rexne, bihêztir dike.